

# Berbang

Organa Federasyona Komeleyê Kurdistanê li Swêdê

102 (1996)



# Naverok

## Kurmanciya Jorî

- Ne Swêdê û ne ji kurdên li Swêdê... Şermîn Bozarslan
- Nûçeyên Kurdistanê... Amadekar: I. Güçlü
- Çalakiyên Federasyonê
- Girya Zelamî.Helbest ... Dr. Arif Hito
- Daxuyanî
- Rewşa Komela Uppsala. Lezgîn Alpergîn
- Komeleya Nivîskarên Kurd
- Zarok û zimanê Zarokan..Şefik Kaya
- Axîn û nalînên texa bindest... Xelîl Duhokî
- Gubartin ne pêwîst e, şert e... Kovan Amedî
- Semfoniya leşekê rîs. Helbest. Bilind Mehemed
- Hatin Helbest. Şîlan Hemo
- Hewar Helbest. Aram. D.
- Pirsa jinan. Amadekar: Î.Güçlü
- Min ji çi afat hezkir. Aram Gernas
- Şûjin. Dr. Cuwan Batû
- Sebra Eyubi. Çîrok. Nizar Mehemed Seîd
- Miradê Kinê. Beşîr Botanî
- Welaparêzî û Ala. Selam Cizîrî
- Hevpeyî bi Mehemed Taha Akreyî re. Hesen Şêxo

## ZAZAKÎ (Dimili)

- Qandê Çiçî lejê xweikiştenî. Osman Aytar
- Kurdanê Sûriyey.
- Kurdistanê Vakûrî.
- Raşnuştena zazakî.
- Xelata Aştî ya Nobelî...
- Aymey Temî û doktor. Arêkerdox: Mariûf Yilmaz

## Kurmanciya Jêri

- Gorankarî nek her pêwîst e, belku mercîse. K.Amadî
- Basêkî giştî derbarey kurd le sovyet da. M.Kurdî
- Hengawî yekem. Dr. Husêن Mehemed Aziz
- Hebû Nebû. Niyaz Lacanî
- Payîz, Xurbet û Xewnekanim. Pişko Necmeddin
- Seretayek legel edebî minalan da. Kake Bas
- Taray Giyan. Helbest. Hemeseîd Hesen
- Salêk hukumetî xudmuxtari le Kurdistan. Serzili . Q

# Berbang

Organ för Kurdiska Riksförbundet  
Organa Federasyona Komeleyê  
Kurdistanê li Swêdê  
Ansvarig utgivare / Xwediye berpirsyar  
Azad Asad

Chef redaktor / Sernivîskar  
Xelîl Duhokî

Redaktion / Redaksiyon  
Aram Gernas  
Awat Dilzar  
İbrahim Güçlü  
Niyaz Lacanî  
Hesen Şêxo  
Şefik Kaya

Sättning och layout  
Bûbê Eser & Awat Dilzar

Adress / Navnîşan  
Box: 490 90  
100 28 Stockholm - SWEDEN

Tel. 08- 652 85 85  
Fax. 08- 650 21 20  
Postgiro: 64 38 80 - 8

Abone / Prenumeration  
Meqam / Myndigheter 200 Skr.  
Kes / Enskilda 100 Skr.  
Anons: Insidor / Rûpelêñ Navîn  
1500 Skr.

Redaksiyon ne berpirsiyara beyanên  
Federasyonê ye.  
Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin,  
ger çap nebin ji li xwediye nayêñ  
vegerandin.

Sal: 14 Hejmar 102  
ISSN - 0281 - 5699  
Författar Bokmaskin

Damezrandina Federasyonê: 06.06.1981  
Çapkirina hejmara yekem ya Berbangê:  
07.1982



Hunermendê şehîd Miradê Kinê  
1946 - 1985



ŞERMÎN BOZARSLAN

## NE SWÊDÊ Û NE JÎ KURDÊN LI SWÊDÊ WEKE BERÊ NE!

deh - bîst salên din gelek ji wan dê teqawut bibin. Her weha di beriya wan de û li pey şerê Xelcê jî, kurd hatin Swêdê. Bêguman pirs û daxwazên wan, ji yên berê di gelek waran de cuda ne.

pêwist e û dil dixwaze ne fireh e. Dil dixwaze ku di Federasyonê; di besdarbûn û temsila jin, xort, kal û pîr, bakûr, başûr, rojava, rojihat û dîtinêن cuda de balanseke zêdetirîn hebûna.

Di salên 80' yî de bi hezaran kurd di carekî de hatin Swêdê. Piraniya wan ji ber sedemên siyasî hatin swêdê. Ewana dê demeke kin li Swêdê bisekiniyana û piştre vege riyana welêtî. Ev biryara wan, dê paşê li ser jiyanê wan li Swêdê bi her awayî tesîra xwe nîşan bida na.

Di wan salan de, li her derî komeleyên kurdan ava dibûn. Jiyana komelayetî bûbû beşek ji jiyana kurdên dervayê welêt. Weke iro komele li endaman nedigeriyan. Pirî caran kes diçûn li komeleyan digeriyan ku tê de bibin endam. Piraniya endam û damezroxên van komeleyan penaberên siyasî bûn ku çend sal paşê rîwiyên welêtî bûn. Di merkeza xebatên komeleyan de; pirsên gelê Kurdîstanê li welêtî û pêşdabirina çanda kurdî esas bû. Xebat ji bo helkirina pirsên kurdan li civata Swêdê, ne ewqas di rojevê de bû.

Ew dem germahî di navbera kurdan de zêdetir hebû. Ji bo cîvîn, şev, meş, xwepêşandan û hevûdu dîtin wext jî, daxwaz jî gelek bû. Kar û dibistan, her weha tolerans jî li Swêdê zêde bû. Biyaniyên kevn ji ber vê yekê hêrs dibûn û digotin, ku berê ji bo wan qursa zimanî jî tunebû.

Ên ku di salên 80' yî de hatibûn Swêdê, nûha nêzîkî bîst sal e ku li Swêdê dijîn. Vegera welêt weke destpêkê ne ewqas nêzîk e. Ên ku wê dema ciwanêن bîst salî bûn, nuha nêzîkî cil salî ne. Piştî panz-

Belê; li Swêdê gelek tişt hatin guhartin û gelek tişt jî dê bêñ guhartin. Kurdên Swêdê jî di vî wextî de, bi gelek awayan hatin guhartin. Weke berê wext jî, germbûyîn jî zêde nîne. Bêkarî, li derive mayîna civatê, nîyatperestî bûne pirsên kurdan jî. Pirsên ku li Swêdê hene, tesîr li ser jiyana wan jî dikin. Bêguman li gor van guhartinan divyabû ku Federasyon tevlî komeleyen endam ve, di warê destûr, struktur û babetên xebatê, metodên xebatê û hwd. de bihatana guhartin. Analîza rewşê bi her awayî bihatana kirin. Di bin ronahiya wan de gavên nû bihatana avêtin. Her çiqas di salên çûyîn de, helwesta Komîteya Giştî di vî warî de çêbû jî, ji ber sedemên curbecur bi ser neket. Guhartin ne rehet e, pirr bi êş e. Parastina sistema kevn, helbet hêsanter e. Divê demên berê, di demên berê de bimînin. Bi xeyala vegera demên berê em nikarin gavên nû bavêjin. Em mecbur in rastiya rewşa kurdan a iroyîn li Swêdê weke xwe qebûl bikin. Kes hene li dervayî welat in, lê seetên wan bîst sal berê sekinîne û di wê wextê de, di şûna xwe da mane. Ewana pirsên civakî yên Swêdê nikarin an naxwazin bibînin. Ji bo xebatên dûr û dirêj li ser pirsên zarok, kal û pîr û hwd. tunene. Kar ji bo wan du konferansên sansasyonel e.

Rast e, Federasyon pirr alî ye, ne girêdayî yek partîyeke siyasi ye û ji gelek rîexistinê din firehtir e. Tê de ji her beşen Kurdîstanê, kurd digel hev kar dikin. Lî divê em qebûl bikin ku Federasyon, qasî ku

Pirsên ciwanên kurd ku li Swêdê çêbûne yan jî di zaroktiya xwe de hatine Swêdê, bê şik ji dê û bavan cudatir in. Ger ew bixwe di organên Federasyon û komeleyen endam de cîh negrin, kî dê karibe perspektifîn wan têxe nav xebatê û tesîr li ser program û destûrê bîke?

Jin, di nav Federasyonê de ji berê zêdetir hene, lê hejmarêñ wan dîsa kêm in. Lewra tesîrîn wan, li ser Federasyonê kêm in. Ger jin û ciwan zêdetirîn û çalaktirîn di organ û xebatên Federasyonê de cîh bigirtana, dê Federasyon bi gelek awayî guhartî bibûya, zêdetirîn li gor rastiyen civata kurd li Swêdê bibûya. Bêguman guhartinê weha di rojekê de ne mumkun in. Wext dixwaze, xwestin dixwaze, nû kirina xwe bixwe dixwaze.

Swêd jî, politikaya xwe ya biyaniyan hêdî hêdî diguherîne. Çend sal e komîteyek ji bo vî karî dixebite. Ev komîte, di derheqê polîtikaya biyaniyan de rapor amade kiriye. Di vê raporê de, çend pêşniyarêñ baş hene. Lî gelek ji van pêşniyaran ger bibin biryar, dê rewşa rîexistinê biyanî li Swêdê ji berê dijwartir bibe, îmkanêñ wan kêmtir bibin. Pirsên Federasyoneke çawa? Guhartinê çawa? Heta kongreya panzdemîn dê di nav Federasyonê de, bê minaçeşê kirin. Em polîtikaya Swêd a nû li hember biyaniyan jî bigrin ber çav û di vê kongreyê de hin gavan ji bo nûorganîzekirina Federasyonê bavêjin.

# NÛÇEYÊN KURDISTANÊ

Amadekar:  
İbrahim Güçlü

## DEWLETA ÎRANÊ ÊRIŞÎ BAŞÛRÊ KURDISTANÊ KIR..

Di 28. 7. 1996-an de Dewleta îranê, bi alikariya YNK ê, êrişî bingehêne Partiya Demokrat ya Kurdistana îranê û kampênen penaberên Rojhilata Kurdistanê kir. Di vê êrişê de çend têkoşerên Kurd û hemvelatiyî hatin kuştin.

Çendîn rûniştvan, nivîskar û rewşenbîrên Kurd di nivîsara xwe ya 3. 8. 1996- an de, dexwazên xwe wisa diyar kirin:

” Yekem: Derbaskirina sînora Başûrê Kurdistanê ji aliyê dewleta îranê ya dagîrker ve û êrişâ wan ya hovane bo ser bingehêne Partiya Demokrat û kampênen penaberên Kurdên îranê, bi dijwarî mehkum û rûreş dikan.

” Duwem: Em dexwazê ji UN û hêzên hevpeyman dikan ku Başûrê Kurdistanê ji êrişâ dewleta îranê û dewletên din yên deverê biparêzin.

” Sêyem: Em dexwazê ji kome-lênen gelê xwe û hemû hêzên siyasi -yên nebeşdarî vê tawanê- dikan ku bi kiryar piştgiriya hêzên siyasi yên Kurdistanê bikin û jin

û zarok û penaberên Kurdên îranê biparêzin û herçiya li dijî hêzên îranê yên dagîrker ji dest wanbihêt, bikin.”

## LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ KONTROL KETE BIN- DESTÊ PDP-Yekgirtî

Piştî êrişâ dewleta îranê li hemberî Partiya Demokrat ya Kurdistana îranê û penaberên Rojhilata Kurdistanê, di rojê 18-19 de, dîsan Îranê di 16- 17. 8. 1996- an de, gorî agahdariyê rast yên gelek terefan, herêmên Başûrê Kurdistanê bambabarân kir. Ev herêmên hatine bombabarân kirin ew in: Qesrê, Äoman, Gilala, Hecî Umran, Werî Keleşin.

Piştî vê bombabarankirinê dîsa di navbeyna PDK û YNK de şerî navxwe dest pêkir. Her çiqas di hejmara 101 ya Berbangê de ji bona Beşûrê Kurdistanê agahdariyê kîfxweşî jî hatibûn dayin ku PDK, YNK û hêzên din yên Başûrê Kurdistanê ji bo pêvajoya demokrasiyê li hevûdu kirine, hezar mixabin ev nûçeyên xweş emrdirêj nebûn. Piştî vî şerî navxwe, Amerîkayê raste rast mûdaxaleyî pirsê kir û ji PDK û YNK-ê dexwaz kirin ku şer rawestînin û li Londrayê bêñ cem hev. Ev mûdaxaleyâ Amerîkayê bû sedem ku şerî navxwe biçek ji lezbûna xwe kêm be û hezar mixabin nikarî şer bide rawestandin. Lîbelê ev mûdaxaleyâ

Amerîka, bi taybetî li hemberî êriş û mûdaxaleyâ îranê balkêşiyek bû.

Di nav van rojan de li Londrayê hevûdîtinên PDK û YNK dest pê kir. Lebèle di wê navbeynê de bûyereke gellek surprîz û nedihatpayîn qewimî. PDK, bi alikariya hezên dewleta Iraqê; di 31.8.1996-an de, Hewlêr ji destê YNK-ê girtin. Berî hîngê di 1995-an de dema şerî duyemîn yê navxwe dest pê kirî, YNK dest danîbû ser parlamentoye û li Hewlerê kontrola xwe pêk anîbû.

PDK a Yekgirtî piştî Hewlerê, êriş bir ser Koysinceqê, Dokanê û Suleymaniye û di demekî kurt de ew jî girtin. Lîbelê ji tirsa şer û hêzên Iraqê rûniştvanen Suleymaniye, gorî taxmînan 200.000 kes, dev ji bajareî berdan û ber bi tixûbêñ Îranê koçber bûn. Ew yeka ji bo Kurdan trajedyeke nû anî holê. Piştî ku li Suleymaniye şer çênebû, ew kesen ber bi tixûbêñ îranê koçkiribûn, kurdên li îranê bicîhbûne, 30.000 kes in. Helbet ew jî hejmareke biçük nîne.

Di vê navberê de PDK, ji bona hundir û derve jî siyasetâen xwe tespit kirin û pêşkêşî reya giştî kirin. PDK, parlamentoya herêmî bi 55 parlamentean ci-vand û emrê parlamentoye sdu sal dirêj kir. Biryara Ef-a giştî girt. Biryara helbijartinêñ giştî yên herêmî û parlamentoye qe-

bûl kir. Amadebûna xwe li hevhatina bi YNK-ê re ûlan kir.

Serokê PDK Mesut BARZANÎ bi heyetekê ve, di 18.9.1996-an de çûn Tirkîye yê. Wî li Tirkîye yê bi wezîra derva û cîgirê serok wezîrî Tansu ÇILLER- ê re hevûdîtin kir. Pişti vê hevûdîtinê, Mesut Barzanî û heyeta wî bi cîgirê wezîrê derive yê Amerîkayê re civîn pêk anî.

### TIRKIYE LI BAŞÛRÊ KURDISTANÊ HERÊMA EWLEKARIYÊ AVA DIKE

Tirkîye, ji sala 1983-an heta îro 18-20 caran bi hêzên xwe yên leşkerî ketiya nav axa Başûrê Kurdistanê û gundên Kurdan bombabaran kiriye. Operasyona leşkerî ya mezin ya Tirkîye yê di Adara 1995-an de bi 40 hezar leşker pêk hati bû.

Sedema van êrişan, her demê PKK-ê hatiye nişandan. Hezar mixabin, ji bona ku Başûrê Kurdistanê jî xwediye statûyekê diyar ya huquqî û hêzeke mezin jî nîne, nikare pêsiya van erîşan û operasyonan bigrin. Pişti operasyona hevbes ya PDK û Dewleta Iraqê çawa ku kevir li ciyê xwe lêhîstin û ji bo konsensus û dengeyên nû şert pêk hatibûn, Tirkîye jî ji bona ku herêmeke ewlekarî ava bike, dest bi xebatê kir. Wet tê zanîn, di van salên dawiyê de ji bo herêma ewlekarî dexwaziyeke xurt li Tirkîye hebû. Di encamê de şertên îro ji bo wan îmkan çêkir. Gorî agahdariyê nûçevanan, Amerîka û ïngiltere vê planê di ecibînin. Almanya, du dil e. Fransa, ïran û Rusya li dijî vê planê ne.

Dewletê Ereban û yekîtiya wan jî li dijî Qemera Ewlekarî ya ku Dewleta Tirk dixwaze li Başûrê Kurdistanê ava bike, ye. Dewleta Iraqê bi xurtî li dijî ev plana Tirkîye derdikeve û dibêje ku li Bakûrê Iraqê, em û PDK berpirsiyar in. Ji bo vê yekê jî li Bakûrê Iraqê pirsa terorê jî, bê me çareser nabe. Iraq pêşniyar dike ku ew peymana di navbeyna wanda di salên 1983-an de pêk hatibû û bi "Tabîba Germ" dihat navkirin, nû bibe.

Ew mûnaqeşeya li ser Qemera Ewlekarî hîn domdar e. Wisa diyar dike ku pişti gellek qewimandinê nû avakirina vê qemerê zehmet xûya dike.

### MED TV DÎSA DEST BI PROGRAMÊN XWE KIR

MED TV di adara 1996-an de li Londrayê dest bi programa xwe kribû. Programê MED TV Kurdî û Tirkî bûn. Caran jî Erebi, Suryanî bûn. Tirkîye li hemberî MED TV gellek bi xurtî ecizbûna xwe diyar dikir û ji bona ku MED TV bê girtin hewldanê pirralî nîşan dida. Di encamê de bi hewildana Tirkîye, Polonyayê peymana MED TV ji holê rakir û MED TV hate girtin.

Pişti 45 rojan, MED TV dîsa dest bi programê xwe kir. Ew gaveke êrinî ye. Mafêni miletekî, herkesekî û her gurubeke siyasî heye ku bikare radyo, telewîzyon, rojname û dezgehê din, ava bike. Hezar mixabin li Tirkîye ev yeka ji bona Kurdan kedexeye. Dema ew kedexebûna dom bike, heger Kurd jî îm-

kanêñ nû pêk bînin, helbet li dereveyî kontrola dewleta Tirkîye dê van dezgehêñ xwe ava bikin. Heger Tirkîye nexwaze ku wisa bibe, pêwîst e ku mafêni Kurdan ji vî aliyî de jî qebul bike. Pêwîst e ku dezgehêñ têñ ava kirin rast bêñ bi nav kirin û navkirinêñ wan li dijî demokrasî û mafêni kes, gurubêñ din nebe.

Pirseke girîng jî ew e, ku Televîzyonê Kurd jî pêwîst e ku ji exlaka çapemenî û ji pîvanêñ navnetewî yên çapemenî re humetkar û hevgirêdan bin. Mafêni kes û gurubêñ derveyî xwe negrin bin linga. Bi taybetî jî di MED TV-ê de ev îhlalkirina gellek hêsan dibe. Pêwîst e ku MED TV xwe di vê pirsê de dûrist bike.

Di 18.9.1996-an de MED TV-ê ye dîsa weşana û xebata xwe da sekinand.

Gorî nûçevanêñ Ewrûpayî, beriya vê 4 mehan, polîsên Engilîstanê. Almanyayê, Fransayê, Lüksemburgê û Belçikayê (ku mûmkun e ku welatêñ Ewrupayê yên din jî di nav vê kontrolê dîbin) serkaniya finansmana MED TV-ê girtine bin kontrolê. Pişti ev kontrola dûrûdirêj, polîsên Belçikayê û Engilîstanê dest bi operasyonê kiriye. Di operasyonê de di serî de ciyên MED TV-ê, gellek dezgehêñ girêdayî PKK-ê, wek parlamento-yê derive û gellek komele, hatine gerandin. Tê gotin ku bi taybetî li ciyên MED TV-ê gellek pêrê û belgeyên sîrrî û girîng hatine dîtin.

# Çalakiyê Federasyonê

Civîna Komîteya Herîma Pêncan, di roja 05.10.1996-an de, duwemîn civîna xwe li bajarê Lindköpingê pêk anî.

Komelaya Norrköping, Karlstad, Örebro, Lindköping beşdarî civînê bûn.

Firat Nemrud, Berpirsê Herêma Pênc û Hemîd Gewherî perbirsê Pêywendiyê Navxwe yê FKKS, di vê civînê de beşdarî kirin. Di civînê de gellek biryaren hêja hatin girtin.

Federasyon ji terefê seroka Federasyonê, Şermîn Bozarslan ve hat temsîl kirin. federasyona finiya, folonî, Îralî, serbî, portugalî û iranî jî di nav beşdarvanan de bûn.

Manifestoya siberojê, rapora polîtikaya biyaniyan û projeya handikappan a SIOS-ê çend babetên konferansê bûn, ku hatin şirove kirin. Her weha rêxistina jin û ciwanêن SIOS jî raporêن xwe pêşkêşî beşdaran kirin.

Zana kir. Nûnera Amnesty jî her weha pêwistiya piştgiriya Leyla Zana û girtiyen siyasi anî zimên. Li ser navê Federasyonê Şermîn Bozarslan û Şefik Kaya di vê "Roja Kurd" de beşdarî kirin. Şermîn, li ser pirsa kurdî li Bakûr axaftin çekir. Behsa qetlîama deh girtiyen siyasi li zindana Amedê û agahdariyê şaş yên dewleta Tirkî kiribû, anî ziman. Ji bo çareserkirina pirsa kurdî daxwaziya piştgiriyê kir. Di dawiyê de ji aliye beşdarvanen civînê ve daxuyaniyek hat qebûl kirin. Di vê daxuyaniyê de behsa girtiyen siyasi hat kirin. Ji Tirkîye yê hat daxwaz kirin ku li gor mafêni mirovîn hereke bike. Her weha ji Swêdê jî hat daxwaz kirin ku perçeyen silah ji Tirkîye re neyên firotin. Tiyatro û govend jî beşek ji programê bûn.



KONFERANSA  
SIOS-ê LI ÅBO

SIOS (Organa hevkar Ji bo Federasyonê Biyaniyan) ku federasyon jî endama wê ye, di 31-ê Îlonê de, li Åbo konferansa xwe ya salane ji bo progra-ma xebatê li darxist. Di vê kon-feransê de, berpirsiyarê ABF-ê Bernt Carlborg jî beşdarî kir.

## ROJA KURDÎ LI TENSTAYÊ

Sosyaldemokratan li Tenstayê di 28-ê Îlonê de, rojeke kurdî li ser Kurdistana Bakûr amade kirin. Di vê civînê de, Sekreterê Partiya Sosyaldemokrat yê beşa navnetewî beşdar bû. Ji partiya çep Agneta Nordberg çavdê-riyên xwe li ser mehkelmeya HEP-ê pêşkêş kir û behsa Leyla


## CIVÎNA HANDIKAPPÊN KURD LI LINKÖPING-ê

Ji komiteya pirsên handikappêni Kurd Sofî Demîr, Xudadad Behramî û Şermîn Bozarslan li komeleya Kurd li Linköpingê di warê xebat û pirsên handikappan de civînek li dar xistin. Di civînê de pirrtirîn li ser xebatên pêşerojê û damezirandina handikappêni Kurd hat sekandin. Komîte, kesên beşdarvan dawetî konferans û şeva handikappêni Kurd ku di 26.10.1997'an de pêk bê kir. Ji

wan daxwaz kir ku di komîeya xwe de komîeya handikappêñ Kurd ava bikin.

CIVÎNA BURSÊ YA  
ENSTÎUYA KURD LI  
PARÎSÊ

Îsal civîna bursê ya Enstituya Kurd li Parîsê di 22 yê Îlonê de pêk hat. Seroka Federasyonê di vê civînê de beşdarî kir. Îsal hejmarêñ bursan bi tenê heşt hep bûn. Lê muracaat gelek bûn.



## GIRYA ZELAMÎ

Min nedît bû  
Mêrçakên meha Gulanê û  
Tev egîdêñ serhildana  
Cade û kolanêñ Duhokê  
Bikene girî  
Welê di rêka revînê da  
Demê Kilaşînkof dibûn pêşî û  
Berdidane di nav geuriya zê da  
Demê tiveng  
Bû ye wek pariyeñi zilka  
Zêy daîray û dûr birî  
Dûr ji çekî  
Dûr ji axê û  
Dûr ji dozê  
Noz - noz zelama dikir girî!!

Dr. Arif Hito

1996-10-14

## JI BO HANDIKAPPÊN KURD

Hevalê hêja!

Komiteya pirsêñ handikappêñ kurd li Federasyona Komeleyêñ Kurdistanê konferansa xwe ya duwemîn digel handikappêñ kurd di dem û wexta jêrîn de amade dike.

Babetê Konferansê ev in:

- \* Li gor qanûnêñ Koma Netewan , mafêñ kesêñ bi handikapp.
- \* Di kulturêñ cuda de handikapp
- \* Xebatêñ komîeya pirsêñ handikappêñ kurd a Federasyonê.
- \* Gelo di şûna gotina handikapp de em dikarin kîjan gotina kurdî bi kar bînin.
- \* Rêxistina handikappêñ kurd li Swêdê pêwîst e yan na ?
- \* Encamêñ konferansê

Ger hewcedariya te yan jî daxwazên te hebe tu dikarî di konferansê de digel yek xismê xwe beşdarî bikî.

Heqê riya we em didin. Lê divê hûn bi riya herî erzan, hatin û çuyîna xwe amade bikin û meqbûzêñ xwe ji me re teslîm bikin. Li pey konferansê bi şev saet 19'an de em şevek ji bo we amade dikin. Di şevê de ŞIVAN beşdarî dike. Şev ji bo kesê ku di konferansê de beşdarî dike û yek kesî/a ku tu digel xwe tînî bê bilet e. Ji bo kesê din ku ji 15 salî meztirin ketina hûndir 70 kron e. Ji bona zarokêñ 10 heta 15 salî jî 40 kron e. Şev, ji bo her kesî-vekiriye.

Ji bo beşdariya konferansê em derengtirîn heta 18 mehê ji te bersiv dixwazin.

TU BI XÊR WERÎ!

Komiteya Pirsêñ Handikappêñ Kurd

Dem: 1996- 10-26

Wext: 12.00 - 17.30

Cîh: ABF -Torsgatan10 ( Nêzikî Folketshus li Norrabantorget)

Tu dikarî telefonî endamêñ komîte bikî û navê xwe ji bo beşdariya konferansê bidî nivîsandin . Yan jî Federasyonê re fax bikî.

Sofi Demir 08-837214

Imran Eliaçik 08-7043481

Şermîn Bozarslan 08-7604719 - 08-6528585

\*Xellî Duhokî, ji tûpêñ erêñî wergerandiye yên latînî

# DAXUYANÎ

## Dev ji şerê xwekuştinê berdin! Êdî bes e!

Hemwelatîno

Hemû Kurdên welatperwer hevparê vê dîtinê ne ku, piştî şerê Kendavê û binketina rejîma Iraqê firsendeke dîrokî kete destê Kurdan da ku karibin li Kurdistanâ Başûr a azadkirî da hukmê xwe saz bikin. Navê vî hukmê dibe dewletek serbixwe yan jî dewletek federal, ew ne karê me ye û nîyeteka me ya mudaxelekirinê jî tune. Çareseriya vê pirsê girêdayî irada PDK, YNK û yên mayîn e. Ji bo serketina wan, ji bo çareser-kirina pirsgirêkên Kurdistanê, ji bo avakirina Kurdistanê em karin dîtin û pêşnîyazên xwe yên biratî pêşkêş bikin û di her warî da alîkarîya ku bikeve ser milê me bi cîh bînin.

Me hêvî dikir ku, piştî destkevî û firsendêne Kurdistanâ Başûr dostanîya herî mezin û nêz di navbera rêkxistinêne Kurd da çê bibe û bi vê dostanîye berî her tiştî berjewendîyen gelê Kurd bêne parastin û rê li lîstikên dijmînen me bêne girtin. Li gor bawerîya me ev, an bi yekîtiyeke nete-veyî dibe yan jî bi dostanî û bira-tîyeke germ, bi pêkanîna demokrasîyê, rûmetnîşandana raya gişî ya gel dibe. Lê mixabin ku şahîya me û dosten gelê Kurd, ji ber şerê navxweyî hate reşperdekirin, hêvî û gumanên me hatin êşandin. Di şerê navxweyî da nêzî sê hezar Kurd hatin kuştin, bi hezaran cardin koçmal û derbeder bûn li welatê xelkê, îtîbar û pres-tîja gelê Kurd û van rêkxistinan hate nizim kirin. Derheqa pêwîs-

tîya vî şerê neheq û xwekuştinê da, bi rastî me tu bersîveka aqila-ne nedît û em ne bawer in ku şirovekirinek jî hebe. Tabloya ku di her warî da dertê pêşberî me, nabe tu sebeb jî bo berdewamîya şerê birakuji.

Çare ci ye? Li gor raya me, di-vê YNK û PDK ji hebûna hev ra hurmetê bikin, dev ji qelandina hev berdin û li gor pîvanêne demokratîk herin hilbijartîne û ji raya gel ra serî deynin. Eger bi raya gel yek ji wan were ser hu-kim, divê yê din jî ji bo berjewendîyen Kurdistanê, ji bo pêşvebirina gel, ji bo tekûzkirina aborîya welêt, ji bo avakirina Kurdistanâ kambaxkirî muxalefetîyeka baş bike.

Herwisa me hêvî dikir ku şerê birakuji negihîje vê qonaxê. Di destê pêşî da herdu rêkxistinêne bingehîn ên vê besê bi berpirsiyârî bilivin, pirgirêkên navbera xwe bi metodêne demokratî û aşitî çareser bikin, guh bidin raya gelê Kurd û rêkxistinêne wan ên welatperwer. Lê aşitîya navbera wan ne li ser destê wan û me ne jî li ser destê biyanîyen dost pêk hat û mixabin ku gihişte encama iroyîn. Bi bîryarêne Yekîtîya Milletan çekirina kembera parastinê û bicîhkirina Hêzên Çakûç bo me Kurdan encameke baş bû da ku hêzên me yên Başûr karibin di bin vê kemberê da ji êrîşen Saddam dûr hukmê xwe saz bikin. Lê mixabin ku, şerê xwekuji ya navbera herdu hêzan wan mecbûrê Saddamê xwînrij û dewleta fanatîk a İranê kir û mercê kembera parastinê jkir xeterê û hêzên çakûç ji wê derê dûr xist.

Encama ku iro li Kurdistanê peyda bûye, êdî gihiştiye qonaxe-ke nû û pir girîng. Di vê qonaxê da berpirsiyâreke dîrokî dikeve ser milê PDK û YNK, ku ew vî şerê bêmane û bêfeyde bi temamî bi dawî bînin û ji êş û zêrandinêne gelê Kurd ra bibin derman, bi lez birînan bipêçin û pêşî li lîstikên

dagirkeren Kurdistanê bigirin. Li gor raya me peydakirina vê prosesê mumkun e û ya ku ji wan tê xwestin jî ev e. Eger ne weha be, ji niha va herçar dewletêne dagirker xwe amadeyî plan û dezge-yêne nû kirine û qet şika me tune ku, armanca wan kişkirin û kûrkirina dijminatîya navbera hêzên Kurd e, paşdagirtina destkev-tîyêne heyî ye!.. Ji ber vê yekê em bang dikan ku :

- Bê qeyd û şert û bi temamî, YNK û PDK dev ji polîtîkaya şer berdin û bi lez li hev rûnên!

- Hilbijartîne demokratîk çê bibe û ji raya gel ra hurmet bête nîşandan.

- Parlamentoa Kurdistanê ji nû va û bi rêkûpêktir saz bibe û bibe desthilat-dar.

- Artêsek neteweyî di bin hukmê hukumet û parlamentoa sîvîl da bête organîzekirin.

- Heq û mafêne civata sîvîl, komele û rêkxistinêne siyasî, civakî, meslegî û hwd bi qanûnan bêne tekûzkirin û ev desthilatdarî bi riya sistema parlamente û bête bi cîh anîn.

- Proje û bernamayêne "dewle-teke federal" bête parastin û di vî warî da paşda gav neyê avêtin.

- Em bang dikan ku Yekîtîya Milletan li bîryarêne xwe yên der-heqa kembera parastinê û êrîşen ji derva deren, li hember êrîşen herçar dewletêne dagirker en ku Kurdistanê di nav xwe da bes ki-rine rawestin!

- Herwisa em bangî hemû dewlet, rêkxistin û sazîyêne demokratîk, aşitî-xwaz û heqperwer dikan ku gelê Kurd tenê nehêlin, li hember êrîşen neheq bêdeng nemînin!

1996.09.19

PSK; PYSK; PDK-Bakûr;  
PDK-Îran; HDKS (Hevbendî-Sûriye); PYDK(Yekîtî-Sûriye)  
Herêma Swêd



# REWŞA KOMELA UPSSALA

LEZGIN ALPERGIN

Karê komelayetî karekî bi xebat û fedekariya şexsan ve girêdayî ye. Loma jî, divê endamên komeleyan alîkariya kesên ku berpirsiyariya komeleyan girtine ser milên xwe bikin û wan tenê nehêlin. Divê bi awayekî ciddî li ser karê komelayan bê rawestin, ku xebat û çalakiyên berbiçav bêñ kirin.

Ez dixwazim di derheqa bajarê me de hinek agahdarî bidim. Uppsala bi meziniya xwe bajarê çaremîn yê Swêdê ye. Li derdora 180.000 kesî li vî bajarî dijîn. Bi qasî %11 rûniştevanen bajêr biyanî ne. Kurd jî, yek ji wan neteweyen biyanî ne ku li Uppsala dijîn. Uppsala yek ji wan bajarên kevn ne, ku kurd lê dijîn. Kurd cara yekem di sala 1967-an de hatinin vî bajarî. Komeleya Kurdistanê ya Uppsala di sala 1985-an de hatiye damezirandin. Ev komele ji Kurdên her çar perçeyen Kurdistanê pêk hatiye û alîkariya hemû kurdan dike. Li bajarê Uppsalayê nêzîkî 2500 Kurd dijîn.

Uppsala bajarekî xwendevaniyê ye. Nêzî 25-30 hezar xwendevan li vêderê dixwînin. Üniversiteya Uppsala bi nav û deng e. Ew di sala 1477-an da hatiye ava kirin. Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanên biyanî ye ku li vê Universiteyê tê xwendin. Xwendevan dikarin heta 80 poengi (2 salan yani çar termînan) bi kurdî bixvînin. Li Uppsala "Domkyrka" dêrek sereke ye ku bajarî dixemilîne.

## WEXTÊ MIN TUNE YE

Ji bo kar û barêñ komeleyê gelek caran ez bi hevalêñ endam re peyîvîme. Lê pirr caran min ev bersîv ji hevalan girtiye: "Wextê min tune"! Lê wextê wan hevalan ji bo hemû karêñ wan yêñ taybetî heye, lê ji bo karê komelê "tune". Herwilo hinek ji wan tu karî jî nakin, bêkar in.

Ez pirr meraq dikim, gelo bi rasti jî, wextê wan kesan ji bo kar û barêñ komeleyê tune ye an jî naxwazin vî karî bikin. Gelek ji wan di civînan de ( ku ew jî verin civîna ) rexna digrin; lê ew bi xwe tu karê praktik û rojane nakin. Gelo nakokiyek di nav vê helwesta wan hevalan de tune ye?

Ji bo ku kar û barêñ komeleyan bimeşe, divê kar bi aweyekî kolektîv û hevbeş bê meşandin. Heger karê komeleyê bi aweyekî kolektîv û hevbeşî neyê meşandin, kesen ku endamên komîta karger in, bi serê xwe nikarin hemû karêñ komeleyê bimeşînin. Ji ber vê yekê, divê endam jî bi aweyekî çalak besdarî kar û xebata komeleyan bibin û alîkariya endamên komîteya karger bikin.

## KAREKÎ WELATPERWERÎ YE

Karê komelayetî karekî azad e, ne karekî mecbûrî ye. Divê ji dilê merov bê, xwestina merov hebê, ev kar bi zorê nayê kirin. Karekî welatperwerî ye û divê merov bi dilxwazî vî karî wek vatiniyek xwe bibîn e.

Kesen Welatparêz, ew kesen ku bi rastî ji welatê xwe hez dikin, ji bo wî dixebeitin û menfaeta welatê xwe di ser berjewendiyen şexsî re digrin. Ji bo pêşketin û menfeeta welatê xwe, xwe ji ber tu vatinî û fedakariyên ku dikevin ser milen wan nedin alî.

Ez di vê bîrûbaweriyê de me, ku kurdêñ li Ewrupayê û li Swêdê bi rêya komeleyan dikarin ji bo pêşdebirina ziman û çanda kurdî roleke aktiv û çalak bilîzin. Herweha bi rêya xebat û çalakiyên komeleyan dikarin peywendiyen germtír bi civata kurd û bi ya weletêñ ku em lê dijîn re daynîn.

## KOMELEYA UPPSALA

Komeleya Uppsala, yek ji wan komeleyê aktîv û çalak e. Mixabin, ew çalakiyên ku tên kirin, hew ji aliye çend kesên ku di komeleyê de çalak in ve, tên kirin.

Perçebûna welatê me, em ji hevdu dûr xistin e. Ev dûrxistin dibe sedemên ku em di warê ziman û têkiliyan de zahmetîyan dikişinin.

Ji bo ku em hevudu fam bikin, me li komeleyê gelek caran bi du zavarayê kurdî, kurmancî û soranî, kursên zimanî çêkirin. Radyoya komeleya Kurdistanê li Uppsalayê her roja ïnê saetekê weşana xwe dike. Taximê me yê fotbolê heye. Seksionna jinan û ya xortan jî heye. Komeleya Kurdistan li Uppsalayê endamê SIU; "Samarbetsorganisationen För Invandrarföreningar i Uppsala", Organîzasyona Hevkariyê ji bo komeleyê biyanîyan li Uppsalayê, ye ku 22 komeleyê biyanî endamên wê ne. Endamekî komîteya karker, ji bo pirsên biyaniyan komela me temsil dike.

Wek agahdarî, dixwazim di bîra xwendevanan de bînim; komela me ji Tîrmehê (meha heftan) û vir de adrêsa xwe guhert. Adrêsa nuh ev e: Vattholmavägen 4. Lokala me ya nuh fireh e, 8 odêñ xwe hene.

Ez hevîdarim ku ê endamên me bêtir berpirsiyariya xwe bigirin, beşdârî xebat û çalakiyên komelê bibin.

Ji bo xebat û çalakiyan gelek tişt hene, lê belê kêm kes hene ku kar bikin. Ez ji hemû endamên komîteya karker û endamên komeleyê re serkseftinê dixwazim. Bi hêviya komeleyek çalaktir.

1996 09 17

Lezgin Alpergin

Serokê Komeleya Kurdistanê  
li Uppsalayê.

## Komeleya Nivîskarêñ kurd li Swêdê

**"Divê PDK û YNK`ê pirsên xwe bi riya aşti çareser bikin"**

Di 10ê Îlona 1996'an de Komîteya Karger a Komeleya Nivîskarêñ Kurd li Swêdê li ser bûyerêñ dawî yên Kurdistana Başûr beyaneke derxist. Beyan weha ye:

Li Kurdistana Başûr şerê birakujiyê ku di navbera PDK û YNK`ê de dom dikir, bi hin rûdanêñ van rojêñ dawiyê gihaşt merheleyeke nû. Li gor agahdariyê çapemeniyê û yên alyê şer, hêzên Iraqê jî bi gelek awayan alîkariya PDK`ê kirine û di encama buyeran de cihêñ ku destê YNK`ê de bûne ketine bin Kontrola PDK`ê. PDK jî îddîa dike ku Îranê jî alîkariya kiriye û dike.

Bûyerêñ dawiyê ku di gel hin zirarêñ din bûn sebebên koçkirina bi dehezaran Kurdish, wekî her Kurdê/a ku rûmeta destketinêñ Kurdistana Başûr baş dizane, xemgînî û dilşa me jî zêde dikin. Sebeb ci dibe bila bibe, em li dijî hemû babetêñ şerê birakujiyê ne û li gor baweriya me bi riya aştiyê çarserkirina pirsan riya herî baştir e. Herweha şâsiyek mezin e ku di rewşeke weha hessas de hêzên dewletêñ ku Kurdistan dagir kirine bi daxwaz an alîkariya hin hêzên Kurdistanî têkilhevê pirsên navxweyî yên Kurdish dibin. Pir mixabin di vi wî warî de çewtiyên balkêş hene û ev zirarêñ mezin didin pirsa Kurdî.

Komeleya Nivîskarêñ Kurd li Swêdê, bangî PDK û YNK`ê dike ku li ser bingeha parastina berjewendiyê neteweyî di wexteke herî nêz de werin cem hev û pirsên xwe bi riya aştiyê çareser bikin. Girtiyêñ ku di destê PDK`ê de ne divê bêñ berdan. Mal û canê kesên siwîl divê bêñ parastin û rê neyê dayîn ku hêzên Iraqê li dijî hin Kurdish û muxalîfîn din operasyonan bikin.



Şefik Kaya

## ZAROK Û ZIMANÊ ZAROKAN

Fêrbûna zimanê zikmakî prosedû-reka dirêj e. Li gor lêkolînên zanyarî, heke di prosedûra fêrkirinê de kêmâsi çênebe, zarok di çarsaliya xwe de dest bi ahaftina ku mezin tê bigihîjin, dike. Zarok, di çarsaliya xwe de bêyî ku mezin jê re alîkariyê bike, dikare hevokên li gorî qaîdeyên rêzimanê çêbike. Di vî temenî de, zarûk ji bilî zimanê zikmakî xwedîyê qabiliyeta fêrbûna zimanin din in jî. Zarok dika-re digel zimanê zikmakî fêrî erebî, tirkî, farisî û hwd. bibe.

### *Were çocê te şoşo kim!*

Dema ku mezin yan jî dê û bav bi zarok re diaxife, armanc ne ew e, ku zarok fêrî ahaftina li gor qaîdeyên rêzimanê bike, mebest pê re diyalog e.

Dê, hîn di dema pêçekê de, bêyî ku li benda bersivê be, bi zarok re diaxife, Çawan ji dilê dê û bav dihê wisan qise dikan.

### *Çaçê te şe kim?*

Zarok jî li hember diyaloga dê reaksyonekî nîşan dide, dengan der-dixe, lê ev deng ne mîna dengê (fonemên) ku dê di zimanê xwe de dixebitîne, dengê ji yên zimanê dê û bav cuda ne. Gelek caran dengê ku zarok derdixin ji mirov re xerîb dihê. Lê reaksyonâ zarok dide nîşandan, ku hinek dengan dibihîze û ew jî li gor xwe hem bi deng wek, "tixxill, bidibidibi-

dii..." û hem jî bi liva xwe "bersi-vê" dide.

Dîsan li gor lêkolînên zimanzzanan, zarok di du saliya xwe de hevokên li gor gramerê çêdike.

Pirraniya lêkolînên zanyarî li welatênu ku lêkolîn, li ser çi dibin bila bibin, ne bi destûra dezgehêni mîri ve girêdayî ne, dibin. Li welateki mîna Kurdistanê ku ahaftina bi zimanê kurdî, nîvîsandin û perwer-dekirina bi zimanê kurdî qedexe ye; di rewşeka taybetî de ye. Ji ber vê yekê, em nikarin pêşveçûna zimanê zarokênu Kurd bi yên zarokênu Swêdiyan re rûbar bikin. Lew li Swêdê dewlet lêkolînên bi vî şiklî perû dike, lê li cem me ji bo na-vekî kurdî dê û bav dikevin binê zîndanan. Ji derveyê astengiyên heyî, astengiyênu ku dê û bav ji zarok re peyda dike, hene. Bi hînki-rina "zimanê" zarokan, mezin jê re astengiyê derdixe, fêrkirina zimanê "normal" derengtir dixe.

Başî û nebaşıya "zimanê" zarokan pirseke lêkolînên zanyarî ye, lê hebûna "zimanê" tiştek eşkere ye. Gelek dayikênu Kurd hem li welat û hem jî li derveyî welat bi vî "zimanî" bi zarokênu piçûk re diaxifin.

### *Çoço maçi kim?*

Bêguman ev nîvîsar ne berhemê lêkolînuka kûr e. Mebest ew e, ku ev "ziman" bala lêkolînvanênu Kurd bikişîne, li ser bête rawestin, lêkolînên zanyarî bêne kirin. Ez li jêr ji vî "zimanî" hinek "gotin" û hevokan pêşkêş dikim. Bo nimûne: Çîçî 'emê ke! Goşt bixwe! Çîçî=goşt, 'emê=xwarin. Ci-ze ye! Cize=xeter, qedexe, germ. Meme bixwe! Meme=xwarina

zarokan, mama. Hayê ke! Ha-yê=razan, raze! Mama vexwe! Mama=av, avê vexwe! Fofo bixwe! Fofo=xwarin. (Pirrê caran xwarina kelandî) 'Eppê ke!=Xwarin bixwe! 'Eppê=xwarin. Lûlû ke! Mîz bike! Lûlû=mîz. 'E'ê ke!= Tuwaleta mezin bike! Qaqa bike!=Tuwaleta mezin bike! Lala ke!=Raze! Ayê

ke!= Raze! Dada= dayê. 'He-ko=Xwîşk. Kixe/Gixe=Pîs. Fiff=Germ. Ayî ke!=Raze! Teto teto!=Were were! Tet=Dest. Ti-tî/cîcî=Delal, xweşik. Pepê/Pe-po=Ling. Çoço=Siwarbûn. Şo-şo=Xwe şûştin. Şoşo ke!=Xwe bi-şo! Mamma=Şîr. Çiço=Şîr vex-we! Bivve!=Germ e! Şoşik=Xwe bi-şo! Elaela ke!=Razê! Çûçî ke!=Rûne! Lolo ke!=Bistirê! Nî-na ke!=Govend bigire! 'Eçi ke!=Lê bixe! Çaçê te şe kim?=Se-re te şe bikim? Çaçê=Ser/Por. Were qoqilîka min!= Were ser navmilê min! Qoqilîk=Sermil. Abe!=Rabe! Abe peppa!=Rabe piya! Pepok=Sol/Pêlav. Kî bilikê te xwariye? =Kî li te daye? Ayî ke 'eço hate te! =Raze kûçik hate te! Ayî ke 'ço hatiye çîçî biriye! =Raze kûçik hatiye goşt biriye! Were çocê te şoşo kim! =Were ez serçavê te bişom! Qaqê 'emê kî? =Tu hêk dixwî? Çiço 'emê kî? =Tu şîr dixwazî? Çiço p'e! = Şîr xelas! Çoço maçi kim? =Ka ez çavê te maçi kim? Were çoco, em herin malê! =Were pişta min, em herin malê! Çaçê te şe kim? =Were pişta diya xwe! Kî kaşê te qetand? =Kî kirâsê te qetand? Ti-lî 'emî dîkî? =Tu tirî dixwî? Gelek "gotin" û hevokênu bi vî şiklî hene. Ev dengê jorîn di dewsa gotinan de, bi zarokan re dihê bikar anîn û "zimanê zarokan" jî, ji van dengen hatiye afirandin. Dengê wisan, ango asîmîlekiri-na gotinan di zimanê me de pirrin. Wek li jor jî hat kat kirin, mebest ew e, ku "zimanê zarokan" nehê jibîr kirin. Gelek dê û bav berî ku zarok fêrî zimanê "normal" bikin, bi vî "zimanê" zarokan bi zarok re qise dikan û ev bi serê xwe prosedûre-ka fêrbûnê ye. heta ku zarok xez-neya xwe ya van "gotinan" bi ya gotinê normal diguherîne, sal derbas dibin. Lê di pêş de, ji bo xurtkirina zimanê normal feyda ci ye, heye yan tune? Pirseka ku li benda lêkolînvanênu me ye.



LÊKOLÎN

XELÎL DUHOKÎ

## AXÎN Û NALÎNÊN TEXA BINDEST DI ÇIROKÊN HESEN İBRAHÎM DE


Rewşa aloz û xeraba gelê kurd li Kurdistana başûr, dilê her kurdekê bi rûmet diêşîne. Çinku ji bo parastina Kurdistanê, bi sedan hezar xelkê me hatine kuştin û bi hezaran bajar û gund hatine sutin. Roj bi roj kawdanêñ welatî ber bi wêrankirinê diçû û ci ronahî jî, ne dima û dilê xelkê jî, ji ber rûdan û boblatêñ diltezin, diêşâ û bi sedan hezar, derbeder û müşextî welatêñ biyanî bûn. Mirovê kurd li Kurdistana başûr, bêhêvî û bêomêd bibû. Tevaya dergehêñ azadî û serxwe-bûnê li ber hatibûne girtin û perdeka reş xwe avêtibû ser welatî. Hukumeta faşî ya Îraqê, bi hemî cûrên çekêñ vebirandinê, yên sutin û qirkirinê, ji napalm û kîmyawî li dij gelê kurd bi karanîn. Karesatêñ Helebce û Hêrişen Enfala, naêne ji bîr kirin. Belê; rewş ge-hiştibû dawiyê û hemî hêzên Kurdistana başûr xwe avêtibûn nav Îran û Ewropayê û dever ji pêşmergan vala bibûn. Belê; di wê rewş de, ci sînahî jî nema bû. Lê ji nişka ve, şans û deliveka dîrokî ji bo kurdêñ başûr peyda bû. Sedamî, wela-tê Kuwêtê dagîrkir. Lewre pirriya hêzên cîhanê, xwe ki-rine yek dest û Sedam ji Ku-wêtê derxistin. Hîngê hemî dilsoz, welatparêz û heta dige-

he caş û xwefiroşan jî, beşdarî serhildaneka dîrokî bûn û te-vaya dezgehêñ Faşiyêñ Îraqê, herifandin û Kurdistan paqîkirin. Partiyêñ kurdî jî, veger-yan û welat xistine bin kontrola xwe. Lê dema hêzên hev-peyman, ji ber berjewendiyêñ xwe li deverê, nexwastîn Sedamî rakin û xelkê Îraqê ji sitem û zulma wî rizgar bikin. Hîngê Sedamî dîsan makîna xwe ya cengê civand û hêriş kire ser gelê kurd. Partiyêñ kurdî û vê carê hemî gelê kurd jî digel, xwe gehandine sinorêñ Îran û Tirkiyeyê. Di vê reva mezin de, bi hezaran zaro û bêçare bi rî ve, ji ber serma û birçê mirin. Ax Xudêwo! Di bin her darekê, kevirekê, li ber her ka-vilekê şewitî, kaniyeka dagrtî mirovekê kurd veşartiye... Mi-rov nizanit, çewa ew karesat û boblat hatine ji bîr kirin! Dij-min me hemî gelê kurd dike yek û dide ber çekê qirkirinê, lê em nikarin bibin yek û ar-mancêñ xwe yên sitratîcî biparêzin! Erê; piştî wê reva mezin, bi alikariya hêzên hevpeyman, kurd vegeryan cih û warêñ xwe û ji aliye hêza çekoç ve heta niha jî, diêne parastin. Lewre her ji sala 1991 ê, Kur-distan ji bo xelkê kurd bibû beheştek ser rûyê erdê. Her wesan ji aliyeke din ve, hêzên hevpeyman, rêexistinê mirovî li tevaya cîhanê û kurdêñ li dervey welatî, destê alikariyê dirêkirin û di avakirina Kur-distana şewitî û wêrankirî de beşdarî kirin. Lê hezar heyf û mixabin. Ax Xudêwo! Dîsan

şerê birakujiyê destpêkir û we-lat di xwînê werkîrin.

Di rewşek weha dilşewat de, rola nivîkar, ronakbîr û bis-porêñ kurd xuya dibe. Her çend pirraniya nivîskaren Kurdistanâ başûr, ji ber kaw-danêñ aborî û hejariyê, di bin sîbera partiyêñ xwedan dese-lat de dijîn, lê gelekan ji wan, nerazîbûna xwe diyar kiriye û li dij şerê xwekujiyê nivîsîne û helwêstêñ camérane wergirtî-ne. Lê dîsan mixabin ku, şer her berdewam e û bi ci rî, alikarî û pêşniyarêñ biyaniyan jî, naête rawetandin! Belê; gelek nivîskaran berhemêñ xwe bi van karesatan hunandîne. Helbet şer hemî tiştekê xirab digel xwe tîne. di van şeran de, bi sedan kes hatine kuştin û bi hezaran jin û zaro ketine kola-nan, birçî û bêxwedî mane. Kar jî nîne û pêwîstiyêñ jiyanê jî, bêmana giran in û her kes nikare ji bo zarokêñ xwe misoger bike. Ji bo peydakirina nanî, hindekan dizî kirîne û rewîstêñ kirêt bi kar anîne. Belê di vê rewşê de, dema bira, mîr yan kur li afretêñ kurd hatine kuştin, êdî ew ketine bin barê giran û ji bo peydaki-rina nanî - hindek tê nebin - yên din neçar bûne û laşê xwe yê pîroz firotine. Raport xuya dikn ku, di van çar salêñ borî de, bi sedan afretêñ kurd yên haftîne kuştin. Li ser vê giriftarî û kawdanêñ aloz û xerab, çendîn berhemêñ nivîskaren kurd ji dayik bûne. Yek ji wa-na, nivîskarê xort û jîr Hesen İbrahîm e.

Wî di van salêن dawiyê de, çend kurteçirok ku, ji aliyê form û naverokê ve di serketî, efrandîne. Ez naxwazim li ser çirokê bipeyvîm, çinku ew bi xwe hemî giriftarî û karesatê bi rengekê edebî, didanite ber destêن xwendevanî. Ev e hûn û kurteçirok:



Ciroknivîs  
HESEN İBRAHÎM

## WÊNEYEK...

Du leşen rîs, wek du marêن evîndar xwe têk dihisîn. Leşekê ji bo têrkirina derûnî û guhnêlî yê din ji bo têrkirina çend gewriyên birsî. Li dadgeha yasa evro, herdu hatin dadgehkîrin. Ek bo kêla gullêن şûndemaya evro, bêy ku wan gewriya têrket û yê din, li kolanêن bajarı, simbêlêن xwe dibadan û li nêçireka din digeriya!.

Hesen di kurteçirokeka din de, zîrekane diçê nav derûnê mirovekê kurd û rewşa wî ya pisikolojî û wêrankirî destnîşan dike. Belê; dîsan em neçarîn vegerîn ser kawdanêن Kurdistana başûr. Ji ber wan giriftarî û şerê xwekujiyê, bi hezaran kurd, ji hemî çinêن civata kurdî, revîne û bi şkandina çendîn asteng û kospa xwe ge-

handîne welatêن biyanî. Edî li xerîbiyê piroblimêن mirovê kurd dest pê dikin. Nezanîna zimanî, bêkarî, xerîbî, cudahiyyêن kulturî, tenêbûn û heta dihehe xwe kuştinê jî.

Hesen vê rewşa namobûna mirovê kurd li derveyî welatî, bi ya yekê din ku, di zîndanêن faşıyan de ye û li benda li darxistinê ye, berçav dike û xwendevanî radikêse kûratiya ruha wêrankiriya qaremanêن çirokê. Dîsan pê nevê ez çirokê şirove bikim, çinku ew bi dengê hezar bilingoya hawar dike.

## ÇAVÊN MIN... ÇAVÊN WÎ

Çavêن min di zil in û rik yê li wê derza bin dergehî ku, ro-

bilindkir ka kar dikit yan ne. Bêdengiyê ez hêrkirim, ya ji min ve kes di vî bajarı de nîne... Min mirade dengek, mêsék, pêsiyek, seyek yan jî çûkek.

Çavêن wî na rawestin ji qu-tanê.

Guhêن wî yêñ bûyne kaniya xwînê.

Şeq şeqa seqatêن dergeha mejî lê simt.

Ne telefon û ne zenga dergehî.

Çend xelkê bajarı yêñ anîne wêrê.

Wî mirade çirkeyekê di xew biçit. Sîsîrû mişka, şere li ser laşê wî...

Dergehê wî vebû. Helgirtin, rakêşan û birin cihana bêden-giyê...

Dergehê min ne-hat vekirin, tele-fona min nehat lê-dan. Dilê min ne-hat qutan. Di xe-rîbiya xwe de, bûm hevalê cîha-na wî...!

**Li dadgeha yasa evro, herdu hatin dadgehkîrin. Ek bo kêla gullêن şûndemaya evro, bêy ku wan gewriya têrket û yê din, li kolanêن bajarı, simbêlêن xwe dibadan û li nêçireka din digeriya!.**

nahiya derive hatin û çûna mirova diyar dikit. Ha ha dê ek zenga dergehî lê dit, bêdengiyâ min kujit û silav kite min.

Çavêن wî dizilqutin û yêñ li wê pencera cargoşe û xâçkırî, ewa bi serê dergehî ve. Çend carekê zêrevanê wê jorê, diêt û diçit. Ha ha dê ên dergehî lê vekin û silav kine giyanê wî.

Çavêن min, man zil û guhêن min man bel û dergehê min nehat qutan. Ew telefona bi rex min ve, eve çend cara min

Belê; çiroknivîs bi germî diçê nav rewşa aloza xelkê me, li Kurdistana başûr û li dij teva-ya karên çewt û ne mirovane diraweste û bi zimanê qarema-nê çiroka xwe, rewşê berçav dike.

Erê; birîn kûr in û xemên xelkê me, giran in. Giran in û mîna çiya ne. Lê dilsoz û xem-xorêن gelê kurd, bi vê çendê razînabin û bi gelek rêka hewil didin ku, van azar û kovanan sivik bikin. Helbet dema di welatî de, şer hebe, edî de-

mokrasî jî nabe û gêlesok û tengavî jî wê mişê bin. Karêñ çewt û zulm jî peyda dibe. Dijmin jî bi hemî hêza xwe, pîlan û nexşen genî dadinê û pirrê caran digehe armancêñ xwe yên çepel û kirêt. Belê; rewş xerab e û kîr gehiştê ser hestî. Hesen di vê çiroka xwe de, kawdanêñ dezgehêñ Deselatê dide xuya kirin ku, çewan rê li xelkê digire. Dema yek pê li ser cergê xwe dane û wan dezgeha gunehbar bike, hîngê ew winda dibe. Lê nivîskar zîrekane, pêşbîniya xwepêşandan û serhildaneka din dike. Werin em bi hevre vê kurteçîrokê bixwînîn.

## HEVPEYVÎNEK DIGEL ŞÊTEKÊ

*Li demekê ne yê xuya, li cihekê bê şûnwar û li ci-vateka bê serûsîma, ev hevpeyvîne hate sazkin.*

"Gelî guhdar û bînera, çaxê we baş. Niha hûn û ev hevpeyvîne di gel vî şetî, ewê leqa didanit, cilkên xwe didirrinit, hevsî û cîran jê direvin, bera di esma-nî werdikit û bê oliya dikit. Fermon hûn û ev şete."

+ Şêto xwe bide nasîn?

- Ez ne şet im! Hûn dişêt in. Ez dizanim rojê çend ser diêne birrîn û çend ezman diêne kîrrîn.

+ Bê ezmandirêjî. Em dê çend pîrsiyara ji te kîn û bi kurtî bo bînera bersiv bide. Pîsyara êkê: Karê te çi ye?

- Karê min hişyarkirina mêska, fêrkirina rastiyê û diyarkirina gunehbar û dizane. (Hîl hîleka kirêt belavbû, di gel destqutaneka ne rêkxistî.)

+ Pîrsiyara duyê: Dema tu berze dibî, tu kî ve diçî?

- Bi rastî ez yê di zîndanêñ tarîperêsa da, yan jî xwe dikime pêxarin, ji bo bîrsî û hejara.

+ Pîrsiyara sêyê: Tu wek kesekê şet, di kîjan rêxistinê da kar diki?

- Di ya pale û rîncberan da.

+ Pîrsiyara çarê: Hîviya te ya dawiyê?

- Hîviya min ew e ku, ev hevpeyvîne bibite xewî û ez hişyar bibim.

Di gel peyva dîmahiyê, dengê du - sê gulla ji serê mak-rofonê derket û di gel ketina wî, çend bînerên li pêş wê hevpeyvîne, rabûne serxwe û bû xwepêşandan.

Bi rastî Hesen İbrahim, çîroknivisekî hişyar û jîr e. Xwedan taqet û şîyanêñ edebiyêñ bilind e. Zimanê wî sivik û rewan e. Zîrekane naveroka çîrokêñ xwe dihel-bijêre. Berhemên wî her zû diçine kûratiya dilê mirovî. Em serketinê jê re dixwazîn û hêviya me ew e, li ser ef-randin û berhemên jêhatî berdewam be.

\*\*\*\*\*

## FEDERASYONA KOMELEYÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ QETLİAMA LI GIRTİGEHA AMEDÊ BI TÛNDÎ PROTESTO DIKE!

Nûnerên dewleta Tirk, bi metodêñ herî hov li girtîgeha Amedê deh girtiyêñ siyasî qetil kirin û bi dehan kes jî birîndar kirin.

Ev bûyer, carekî din dide diyarkirin ku li Tirkîyeyê mafêñ mirovan, edalet û hûqûk, gotinêñ vala ne. Em vê kirina dewleta Tirk bi tûndî mahkûm dîkin.

Em piştgiriyêñ xwe ji bo girtiyêñ siyasî, ku her deqîqe di bin tehdîta mirinê de dijîn, diyar dîkin. Silav û rîzên xwe ji bo deh şehîdên zîndana Amedê û hemû şehîdên zîndanan pêşkêş dîkin.


Em ji cihanê û ji hemû dezheên in-sanî daxwaz dîkin ku vê qetîlamê bibînin û ji bo çaresekirina pîrsa kurdî, bi riya aşitî û politikê helwes-tê bigrin.

Li ser navê

Federasyona Komeleyên Kurdistanê  
li Swêdê

Serok

Şermîn Bozarslan



KOVAN AMEDÎ

## Guhartin ne pêvîst e, Şert e!

civata kurdî li Swêdê, niqaş bê vekirin.

Îro gelê Kurd ji hemû rojan pirtir pêvîstî bi hevkarî û alî-karîyê heye. Ev gotine, ne gotinekî nû ye û ne jî gotinekî kevn e. Heta ku Kurd di nav xwe da yekîtî û hevkariyekî baş saz neke. Ev pirse, wê di nav rojeva civata kurd da xala yekem be.

Em li rewşa civata Kurd li Swêdê binêrin. Kurd çiqas hevkar û hevderdên hev û dinin, çiqas bi pirs û problemên hev û din ra mujûl dabin, çiqas xwedî li xwe li kultur û zimanê xwe derdikevin. Li gor min di vî warê da kêm û kêmâsiyên me Kurdan gelekin.

Raste gelek kovar û rojnamên kurdî yêng kulturî li Swêdê çap dabin. Ez vî karê biçûk nabînim, ev a xebatekî hêja ye. Lê ev kovar û rojnameyena, çiqas belav dabin, çiqas tesîra xwe li jin zarok û xortan dike. Pirraniya zarokênd Kurdan, gava têm cem hev û din bi Swêdî dipeyvin, Xort bi hev û din ra bi Swêdî mijûl dabin, piranîya xortan di civinan da bi Swêdî dipeyvin. Dibêjin em Kurd in û em di rêxistina Yekitiya Cuwanênd Kurda kar dikan! Rast e meriv bi axaftina kurdî nabe Kurd, ez wî ji bo kurdayetîyê wek pîvanekî jî nabînim. Başelê wekî din ci xebat û çalakîyan dikin ku ji kurdayetiyê ra ji kulturê ra û her usa jî ji xortan ra xizmet bike!

Ez 12 sal berê nuha hatime Swêd. Di navbeyna 12 sal berê û ya nuha da gelek ferqan dibînim. Dunya tê guhartin. Swêd jî, li gor çerxa dirokê tê guhartin. Civat û rewşa wan têñ guhartin, nifşen mirovan têñ guhartin, hinek diçin û hinnekêñ din têñ. Em Kurdêñ ku li Swêd jî dijîn beşeke ji civata Swêd'in, her guhartinekî ku li Swêdê çê dibe tesîra xwe li ser me Kurdan jî dike. Hinek guhartin henin ci ji aliyê basî ci ji ji aliyê xerabî be, tesîren xwe di civatê da li hemû merivan dike. Dixazim bejim ku em Kurdêñ îro ne ew kurdêñ ku berî 20 salan hatinin Swêd in û ne jî em di rewşa berî 20 salan da dijîn, ango rewşa civata Kurda jî li Swêdê gelek hatiye guhartin. Rewşa abaorî, civakî û sîyasî ya welatê ku em lê dijîn, bê hemdê me be jî tesîra xwe li me dike.

Lê me xwe çiqas amadeyê van guhartinan kiri bû. Wek şexis, wek Dê û Bav, wek Jin, wek Xort û her weha wek rêxistinê demokratîk, tedbîrêñ me li hember guhartinan ci bûn, yan jî em çiqas dûr difiki-riñ û pêşîya xwe dibînin.

Ez di vê nivîsê da naxwazim têkevim nav sebebêñ pirsan, lê ez dixwazim li ser hinek pirsêñ

wan yê Xortan jî henin. Îro xenc ji yek du komelêñ endam, komelêñ din û seksiyonêñ wan yê Xortan gurubekî wan yê folklorê û tîyatroyê tune ye. Xortêñ ku bi pirsêñ xwe yê civakî mujûl nebin, Xortêñ ku ji tarîx û cografiya xwe tiştekî nizanibe, zimanê xwe nizanibin yan jî bi zimanê xwe ne peyivin, Kurdbûna wan wê ci feyde bide civata wan.

Di van salêñ dawî da, gelo çend xortêñ Kurd diçin universitê yan jî mekteba bilin dixwînin? Hejmarêñ xwendewarêñ Kurd gelek kêmin. Eger em di lîsata Sosîyalê binêrin navêñ gelek xortêñ Kurd yê kirîmînal jî dikarin tê da bibînin. Bo ci, ne heyfa wan xortan e?! Belê, xortêñ ku nexwînin, di beşen karekî da xwendî karîyer nebin, wextêñ xwe yê vala bi xebat û çalakîyen kulturî civakî va da negrêñ û xwe negîhînin, bê guman wê li identîtêkî din biggerin û bixwazin xwe bi ewayekî din ji civatê ra bide qebûlkirin. Ez naxwazim têkevim nav detayan, lê mixbim gelek henin ku idetitetekê baş helnabijêrin.

Li vir mebeesta min ne ew e ku, ez bi tenê xortan rexne bikim û kêmâsi tenê yê wan e. Na xêr, kêmâsi ya hemû civata Kurd li Swêdê ye, kêmâsi ya Dê û Bavan e, kêmâsi ya Federasyonê û Komeleyêñ wî yê endam in.

Gelek jinêñ Kurd li swêdê problemên wan yê ciddî he-

nin. Lê ka gelo kî bi problemdîn wan jinan ra mijûl dibe! Li Swêdê, Komela Yekîtiya Jinêñ Kurdistanê heye ku ev Yekîtiye jî wek ya Xortan ji sek-siyonê Komelan pêkhatîye. Îro hatîye wê rewşê ku kongra xwe bi zehmetî çê dikin û nûha ji komîta birêvebir ya YJK'ê du kes manin ya sisîyan 3-4 mehan carek xuya dike. Di warê aborî da rewşa wan ne baş e, ji ber ku tu alîkariyekî ji dezgehêñ resmî ya dewlatâ Swêdê nastîne û eve jî tesîrek ne baş li xebata wan dike. Lê bo çi nikarin alîkarî bistînin, ma gelo rîyekî din tune ye? Ez di vê bawerîyê da me ku li Swêd, gelek jinêñ Kurd yê têgiştî û jêhatî henin. Lê ewana çi dikin, bo çi di nav kar û xebatêñ jinan da cih na-girin, gelo sebeb çiye, yan jî kî ye?

Tiştê ku ez dibînim civata kurd şûna ku nêzîkê hevûdin bin, ji hev belav dibin. Yek dibê ez Zaza me komeleyekî cu-da vedike, yek dibê Elewî me komele vedike yên dibê ez Kurdê Fêli me û komela xwe cuda vedike. Ango li ser esasê ol û lehça xwe cuda nîşan di-din û ji civata xwe dûr dixin. Ev komele yek ji van jî pêy-wendiyêñ wan bi hev ra tune ye!

Bêguman ev pirs û problemdîn hanê derveyê îrada Federasyonê ye. Li gor raya min eger federasyon vatiniyêñ xwe bizani be wê bikaribe, di wî warê da rolêñ gelek pozitîf bilîze.

Federasyona Komeleyêñ Kurdistanê li Swêdê, 15 sal be-

rê ava bû û iro li gelek bajar û komunêñ cuda da 42 komelên wî yê endam heye. Di nav va-na da, komela Nivîskaran, Komela Huquqzanan, Komela Yekitiya Jinêñ Kurd, Federasyona Yekitiya Cuwanêñ Kurd hen in. Hebûna wana pêvîste û tiştekî gelek başe û pîroz e. Lê her yek ji van Komelana çiqas kar dikin, gelo bi çi mijûl dîbin, kar, xebat û çalakîyêñ wan çinin, Federasyon jî tê da kîjan komele bersîva karêñ ku jê tê xwestin didin. Kijan ji wana vatiniyêñ xwe tînin cih.


Evana pirsên civata Kurd li Swêdê nin. Di vê em kêmasyâyêñ xwe û şâşîtiyêñ xwe ve neşerin. Divê em, bo çareserkirina van pirs û pirsgirêkana, bi bêhna fireh û bi nîyetekî baş niqaş bikin. Ji bo vê karê, em dikarin civînan amade bikin. Dîsa her Kurdêñ ku dixwazin Federasyon hebe û bikaribe vatiniyêñ xwe li gor rewşen cuda bîne cih, dikarin nêrî û pêşniyarêñ xwe di kovara Federasyonê Berbangê da binivîsîn'in. Pêvîst e ku bêjim, çare-serkirina pirsan bi sebir dibe, bi pîlan û bi programekî bi rîk û pêk dibe. Yanî tiştêñ ku pêwîstî bi guhartinê henin, her yekser û bi carekî va guhartin û çareserkirina wan ne mum-kune. Jêra qadroyêñ têgihiştî û bi berpirsiyâr lazim e, jê ra wext û sebir lazim e.

Ez dixwazim bi çend gotinan raya xwe di derheqa organa Federasyonê Berbangê da jî bêjim. Piştî demekî dirêj kova-ra Berbangê dest bi weşana xwe kir, ev hejmara 2:em e ku di destê we da ye. Bêguman eger Berbang, karê ku jê tê

xwestin bikaribe bike û bikaribe valatîyekî dagirê, derketi-na berbangê bo civata kurdî li Swêd karekî pêwîst û hêja ye. Berê nuha jî li ser Berbangê ge-lek niqaş hatiye kirin. Ber-bang organa Federasyona Ko-meleyêñ Kurdistanê li Swêdê ye.

Li gor raya min, Berbang di-vê bibe dengê Fedrasyonê. Di-vê zêde cih bide xebat û çala-kîyêñ komelan, divê li ser pirs û pirsgirêkên civata kurd li Swêdê bisekine, divê giranî bi-de ser pirsên xortan, jinan û malbatan, divê di derheqa bir-yarêñ humeta Swêdê û dezge-hêñ resmî yên Swêdê wek Sendîka, Sosîyal, Sigorta Nexweşîyê û yên din da civata Kurd agahdar bike. Divê Berbang ne wekî kovarek kulturî û ede-bî be, lê nayê wê manê ku ni-vîs û xebatêñ kulturî tê da cih negirê, ji ber ku kultur beşeke ji xebata Federasyonê ye, divê di berbangê da cih bigrê. Divê Berbang li ser mijarêñ pêwist ku civata Kurd li Swêdê elaqeder dike bisekine. Divê bûye-rêñ girîng, li Kurdistanê û li Ewropayê ku Kurdan elaqeder dike, wek nûçe di Berbangê da bê nivîsandin.

Dîsan divê çi wek Federasyon çi jî wek Berbang xwe ji nivîsîn polemîk û xwe ji nakokîyêñ navbeyna rêxistinêñ sî-yasî yên Kurdan bi parêze, an-go li hember nakokîyêñ rêxistinêñ sîyasî yên kurdan bê te-ref be û helwestêñ bi teref negirê. Berbang divê li hember dagîrkerêñ Kurdistanê û di-jîminê netewa Kurd jî bê deng nemîn e.



BILIND MEHEMED

## SEMFORNIYA LEŞKÊ RÎS

(1)

*Di nav daristana giyanê te de  
Du çavêñ min niqandîne  
Û pencêñ te yên tîj  
Min diêşînin.  
Li pişt daristanê êvar e û  
Hemî êvar disîngê min de ava  
dibin  
Li jêr pencêñ te  
Hezên min diarin*

*Bihêle  
Bihêle  
Bihêle  
Giyanê nivistî hişyar bibit!*

(2)

*Di kujîkên şevê ra  
Leşê min pelamar dîkin  
Di kolana tengâ bê dîmahî da  
Bê serûçav  
Min dihajon  
Giyanê min eşkence didin,  
Min û evîna min  
Dûrpêç dîkin!*

(3)

*Li ber lêvên deryaya çavêñ te  
Awirêñ kujek  
Nêrînêñ min  
Serlêj dîkin  
Aşopa bîrhatînêñ me  
Bi qawaneka xemgir  
Awazêñ xwe dijenit!*

*Hemî jan  
Dibin pence û leşê min disimin!*

(4)

*Leşê min yê dîbit  
Çaleka kûr  
Hemî tiştên ciwan  
Tê da têne veşartin  
Li jêr simê sîbereka biyanî  
Tême givaştin  
Dirêje neynokên wê  
Di naxê min da  
Kûr diçin  
Diherrimînin kiçîniya min  
Bêhnîjka mirinê*

*Li ser henasa min zal dîbit  
Di vê hevrikiya berdewam da  
Fişarî zêde dîbit  
Lêdana dilê min  
Zêdetir dibiit!*

\*\*\*\*\*

\* Xelil Duboki, ji tipen erebi wergerandiye yên latîni.

## HATIN


*Dara Tiwa şîndibe..  
Ser awazêñ dilê wê...  
Buhar Kulîlkan vêdixe  
Ser neqşê bejnê  
Heyvek şîn dadikeve..  
Bi azadî sitêr radibein...  
Hunek radikevin..  
Mixabin tenbûr negiya Kula wê...  
Ne pirtûkê xewn xwend...  
Hêdî hêdî derbasî wê dibe...  
Helkî bibe helbestvan..  
Geh bi sistî  
Geh bi xurtî..  
Hember birînê ne pêlewane...  
Ne yî xweş neqîşvane..  
Lê dibîne..  
Xwe hildide..  
Li dibistanê vedive..  
Pelê felekê harin..  
Lê bi arê vînê nikrin.  
Gule gule dibare..  
Pel pel dixwîne..  
Kul Kul gotinêñ kalan vêdixîne  
Çîv çîva çûkêñ sibê  
Guhdar bike ve destpê dike*

**ŞİLAN HEMO**

## HEWAR HEWAR

*Kê dîtiye  
Yan rojekê  
Ji gutinbêjekî bîhîstiye  
Mirovîn ji ber parîyekê nanî  
Leş û guşت  
Lê bîye hestî  
Dayika zarokê  
Bi hîviya ji ber birisê ne nivistî  
Ewan bi xxe kirine hewar... Hewar  
Deşt û biyabanêt  
Dirê jî birîn... Aagar... Agar  
Ji mîrê mirova  
Hîngê ji pêkenîna di xindiqî  
Bi mest û serxwesi  
Harîkarî fêrkîrin  
Lê hezar cran ...  
Daxê li şîna  
Nan û derman û avê  
Bi sedan  
Rengêt gula, di gel xxe birin*

Aram . D



*Amadekar:*  
İbrahim Güçlü

## DI QANÛN Û HUQUQÊN CIHÊ DE PIRSA PÎREKAN

sî, civatî; giringiya tevgerên huquqî jî heye. Ev xebata ku min di hejmara 101 ya Berbangê de dêst pê kiriye, beşek ji vê xebatê, gerek bê hesibandin.

### LI DEWLETA YEKGIRTÎYA AMERÎKA (DYA) MAFÊN PÎREKAN

Li DAY-ê mafêن dengdanê ji bo jinan, di 26-ê Tebaxa 1920-an de hatiye pejirandin. Ev yeka bi guhartina Zagona (Qanûna) Bingehî (Esasî) qewimiyê. Bi vê yekê, tevgera femînist jî gihîştiye armanceke xwe ya girîng.

Jina yekemîn ya ji Kongreya DYA rê hatiye helbijartin Jeanette Rankîn e. Jeannette Rankîn, însaneke aşitîxwaz bû. Ji bo vê yekê jî, di Şerê Duyemîn Yê Dinyayê de li hemberî şer dengê xwe di kongreyê de dest nîşan kiribû.

Li DYA-yê jî jinan, ji bona ku bigihîjin mafêن xwe yên bingehî û bi taybetî jî, ji bona wekheviya jin û mîran di civatê de, ji hemû aliyan ve pêk bê; baş dizanîn ku gerek yekîtiyeke xurt di nav xwe de pêk bînin. Ji bona vê, xebatê bingehîn û pêwîst jî dimeşandin. Di encamê de, Janê Adams, ku di sala 1931-an de Xelata Aşitiyê ya Nobelê girtibû, ji bona ku Yekîtiya Ji bo Jinan Azadî û Aşitî bê damezirandin pêşengî kiribû.

Pîştî vê yekê jî, jinê DYA-yê di gellek qadêن (seheyêن) jîyanê yên curbecur de, pêşketin û navdar bûn: Pearl Buckê, di sala 1938-an de, xelata edebiyatê ya Nobelê qezenç kir. Margaret Sangerê,

li Newyorkê, di sala 1917-an de Nexweşxaneya Kontrolkirina Zarokçêkirinê ava kir.

Jinê DYA-yê di sala 1928-an de di hemû besen sporê de beşdarî Olimpiyatên Havînê bûn; Jinê Sportmên Yê DYA-yê di sala 1932-an de li Los Angelesê xwe gellek eşkere nîşan dan û gellek xelat girtin. Hollywood û artîstên jin bi gellek filmên afirandî li her devera dinyayê hatin nas kirin. Di sala 1936-an de Margaret Mitchell bi romaneye xwe, li hemû dinyayê navdar bû. Di Şerê Duyemîn yê Cihanê de, ew jinê ku beşdarî "Yekîtiya Jinê Çekdar" bûbûn, di karêن xwe de, diyar kirin ku gellek serkeftî ne.

Di sala 1963-an de "Tevgera Rizgariya Jinan" li DYA-yê hate damezirandin. Di sala 1989-an de "Komîteya Mafê Jiyana Neteweyî" hate damezirandin. Seroka vê komîteyê Olivîa Ganes bû.

Di sala 1973-an de Dadgeha Zagona Bingehî, di dozekê de ku ew doza "Li Hemberî Roe Wade" yê hatibû bi nav kirin, ji bona kûrtajê (zarokjiberxwebirin) gavek avêt. Lî belê di 1989-an de li dijî kûrtajê Dadgeha Zagona Bingehî biryarek dest nîşan kir. Lebèle Dadgeha Zagona Bingehî Ya DYA-yê ïzin dida ku Eyalet bi azadiyê di derheqê kûrtajê de biryar bigre.

### MAFÊ VEQETANDINÊ

Li DYA-yê malbat, zewac û veqetandina jin û mîran, gorî qanûnen her eyaletê û bi destê dadgehîn eyaletê tê dûrist kirin. Ji bo

Dema ku mirov li dîroka civatnasiyê binêre, bi hesanî dikare tespit bike ku gellek lêkolîner û eliman gotiye ku "Di civakekê de rewşa pîrekan, peşketin, paşketin û hevdembûn nehevdembebûna û însanîbûn neînsanîbûna wê civatê diyar dike." Rastî jî, jin jî û mer jî herdu jî însan in û dema ku ji van yek zirarê bibîne û xerabî-ye k bê serê jin û an jî mîr; wê demê mirovatî wenda dike. Ev yeka bes ji teda zulma ku namûs û şerafa civatê qirêj dike nayê, ev yekê di eynî wextî de ji bona fonksiyona jin û mîr yên hevpişk jî gellek girîng e.

Ji bo vê yekê jî, ji bona ku pozîs-yona jinan li hemberî civatê û mîran bêye guhartin, di navbeyna mîr û jinan de wekhevi û fonksiyonalbûna mişterek pêk bê, têkoşîneke huquqî ya bê hem-pa jî hatiye dayin. Di encama van têkoşînan de, di her qonaxekê de sîstemênu huquqî di pirsa jinan de taybetiyênu diyar kirine. Ev sîsteman di nav wextê de ber bi pêş çûne. Di vê gîhanekê de jî, dawîya vê pirsê nehatiye: Ev pêvajoyê dom dike. Bi taybetî jî, ev pêvajoya jî bo civata Kurdan hîn girîng û ecîl û pêwîst e.

Ji bona ku ev pêvajoya li Kurdistanê xurttir jî bibe, gerek ji gellek aliyan ve xebat bîn domandin. Di vê pirsê de qasî tevgerên siya-

vê yekê jî, di derheqa van pirsan de li DYAYê qanûnên gellek ren-gîn û cîhê derbas dîbin. Lî di ze-wacê de pîvanênu ku mecburî bêntetbîq kirin, wek hevûdu ne. Ji bona vê zewac, ji aliyê memurê zewacê û an jî ji aliyê qazî ve bi torenekê pêk tê.

Di pirsa vegetandin û an jî devji-hevûduberdana jin û mîran de, esas (pîvan) derbas dîbin. Gorî pîvanekê, ji bo ku jin û mîr ji hevûdu biqetin, pêwîst e ku yek terref xwediyê qebahetekê be. Gorî pîvanekê jî, tespîtkirina qebahetê ne pêwîst e. Ji bona ku jin û mîr ji hevûdu biqetin, şertên nexweş yênu ku bibin sedema ku zewac nemeşe, têrê dike.

Di beşek eyaletan de, ji bo ku jin û mîr ji hevûdu vegetin, gerek terrefek zîna bike û malê terk bike. Ji derveyî van sedeman, ew nexweşiya mentalîte (meşî) ya ku di demeke dirêj de tedawî nebe û girêdayî tawanekê (suçekî) cezekî giran bê girtin û di hepsê de razan jî, ji bo vegetandinê dibe sedem. Ev eyaletan: Connectîcut, Illinoîs, Maîne, Massachusetts, Ohoî û Pensîlvanya ne.

Di qismek eyaleten din de, sedemê vegetandina jin û mîran, bi zewaca sernekeftî re girêdaye. Ev eyalatan: Kolîforniya, Colorado, Iowa, Mîchîgan, Nebraska û Texas in.

Li Kalîforniyayê ji bo vegetandinê sedem, "Lihevkirina Nemûmkin" têrê hatiye dîtin. Li eyalata Coloradoyê ji bo vegetandina jin û mîran, "Xerabbûna ku Naye Dûristkirin ya Zewacê" wek pîvan hatiye qebûl kirin. Li eyalaten Iowa û Mîchîganê bi van pîvanan re, pîvana ku " ji bo xelas-kirina zewacê nemayina tu riyan jî" lê zêde hatiye kirin.

Li eyaleten Alaskayê, Albanyê, Vîrgîn Islandsê, New Yorkê, Ver-

montê û Meksîqeya Nû ji bona ku jin û mîr bikarin ji hevûdu veqetin, bi îradeya jin û mîr, li New Yorkê zêdetir salekê, Li Vermon-tê şes mehan û Rhode Islandê de du salan, ji hevûdu cûda bijîn. Li Nevadayê jihevûdu jiyana jin û mîran ne pêwîst e.

Li cem van yekan, beriya ku jin û mîr ji hevûdu vegetin, pêwîstiya ku ew bê qanîkirin jî tune ye. Ev awaya di sala 1973-an de ji holê hatiye rakirin. Li Eyalata Kalîfor-niyayê, ew usûla girêdayî dadgehan tê guhartin.

Gorî awayê (usûla) ku di zewacê de girêdayî qebahetekê vegetandin pêk bê, dema ku jin bê qebahet be, dadgeh ji bo jinê nefeqeyê girêdide. Di encama zewacê ne-serkeftî de dema ku vegetandina jin û mîran pêk hat, ji bona jinê "nefeqeya lihevkirinê" dikare bibe biryar.

Li Eyalata Illînoîsê, di dema vegetandinê de heger jin hewcedarî nefeqeyê nebe, pişt re dema ku hewcedarî derkeve holê, ji bo nefeqeyê biryar tê dayin.

Dema ku jin û mîr xwediyê zarokan bin, ew jin û mîrê ku wela-yeta zarokan bigre, bi piranî jî ji bo jinê, heta dema ku zarok têbi-gihîjin nefeqe, tê girêdan. Nefeqe, heger di biryara dadgehê de tersa wê nebe, piştî ku ew kesê ji nefeqeyê istifade dike bizewice, wê demê nefeqa wî/wê tê birîn.

Li Eyalata Connectîcutê qanûn, dema ku dê û bav bi riya aşitîyê û dostane di derheqê zarokan de negihîjin encamekê, wê demê dadgeh ji derveyî dê û bav awû-qatekî ji bo welayetiya zarokan dikare diyar bike.

## MAFÊ XEBATÊ

Di sala 1961-an de, ji bona ku rewşa xebata, qezanca û perwer-

dekirina jinan bê başkirin, gellek qanûn hatine qebûl kirin. Di sala 1964-an de "Qanûna Mafê Medenî", di sala 1972-an de "Qanûna Wekheviya Firseta Kar", di sala 1972-an de "Qanûna Xwendina Bilind" çêbûne.

Ew qanûna ku di sala 1973-an de hatiye qebûl kirin ku qanûneke giştî ya kar û perwerdekirinê ye, di hemû ciyên karan de ew cûdabûna girêdayî jin û mîr, ji holê rakiriye û qedexe kiriye. Dîsa dema ku karker tê girtin, cûdabûna jinûmîr, milet,irq û reng nikare bê kirin. Ev qedexeyen han, ji bo sektora taybetî, karênen serbest û karênen dewletê derbas dîbin.

Di Sistem - Sazûmana Federal de, "Komîsyona Wekheviya Firseta Kar" hatiye damezirandin. Ber-pirsiyariya / ê vê Komîsyonê ew e, ku ji bona ku İlankirina ku kar bes ji bo jinan û an jî bes ji bo mîran qedexeyê, gerek vê yekê muraqebe (kontrol) bike.

Di peymanan de ew pîvanan bin-geh tê qebûl kirin: Dema ku terrefek gorî van pîvanênu bingehîn û jiyanî hereket nekin, ew nikarin bi dewletê û dezgehîn eyala-tan re pîyamanan çêkin. Ew pey-manen çêbûyî jî, tê fesih kirin.

Lêbelê dema ku qerekterâ (xusu-siyeta) kar, gorî jin û mîran be, di peymanê de wisa tê tespît kirin.

Ew jinêne besdarî jiyana civatê di-bin, dema ku bikevin zehmetiyan û li hemberî wan asteng bêner dê-xistin; ev yeke ji aliya gurubeka lêgerîn ku ji aliye Wezaretiya Tenduristî, Perwerdekirinê û Ew-lekariya Civatî ve mişterek hatiye damezirandin, tê kontrol kirin û ji çav tê derbas kirin.

**"Min ji çi afat hez kir!  
Ser da jî dev heye ziman tune  
Kela Dîyarbekir..."**

**A. GERNAS**

Ahmed Arîf wek hozanê mîrxaşîyê tê bi nav kirin. Rast e, lewra ramanên serê wî zelal û çîptazî ne. Bi rext û fişekan girêdayî, amade ne ji şer ra, ji qeda û belayê ra. Bi xîret in, bi evîn û bi hêvî ne.

Şev xayîn be jî, can xerîb û bêdeng, can parce parce be jî û dest di kelemçê da bê xew û bê titûn bimîne jî, terka evîna xwe nake, jê hez dike her dem. Mebesta wî hêj di destpêkê da kifş e, meydan dixwîne rû bi rû, raste rast. Ramanên serê wî zelal in, benê xwe, ji qeyd û leleyan qetandine. bê xapandin heval û dostê bi şewat in. Dostê gelê Kurd, mirovîn belengaz, karger, gundî. Dibe hevpişkê derd û belayê wan, xencera xwe ji kalan dikşîne û êrîş dibe ser dijminên wan.

Tu dibînî ku, "pîvazê şîn" ketiye rengekî û jîyanê ji nû va vedijenîne, dibe mizgîna bihara welatî û dibe sembola evînên herî bedew. Dibînî ku, peyva "veşarteka pûş" ketiye ser zar û zimanê te li dij xayîntî, dafik, pûşti û durûtîyê. Namûs dibe hêvî, dibe bawerî di dil da.

Nişkava dixwazî çayek vexwî, dema wê ji berfê. Piştre dixwazî "Lorîya Adîloş" bidî ber sînga xwe, bi şîrê xwe mezin bikî li hember "marêñ gewr", bênamûs û kedxwaran. Ji Kela Dîyarbekir hez bikî, guhdarî nekî fermanan, biparêzî ji hemû belayan. Li "hespê seglawî" siwar bî û berê xwe bidî çiyayan, çiyayê qedirnas, çiyayê ku bi hezar

salan te di paşila xwe da veşartîne û parastine ji oxirmê giran.

Belê Ahmed Arîf şairê tirsnenas e, ger çiqas negotibe ez Kurd im jî, yan jî nedabin gotin!. Naveroka piranîya şîrên wî Kurd in, Kurdistan e her çiqas bi nav nekiribe jî, yan jî nedabin bi nav kirin!. Dertê ser zinarekî bilind, wek zanyarekî tarîxê hezar salan dide dû xwe û Kurdistana dîrokî ya kevin destnîşan dike, tixûban dikşîne.

*"Ev çîya çîyayê Mengenê ye  
Gava berbang davêje li Wanê  
Ev çîya téjikê Nemrûd e  
Gava berbang davêje li hember  
Nemrûdê  
Alîki te şepe digre, asoya Qafqas e  
Alîki te seccade milkê Ecem e"*

Bi pirtûkeke biçûk, tenê bi pirtûkeke biçûk belav dike nav û dengê xwe, sînoran diçirîne û digihe ser textê zêrîn ê şairîyê. Mîrxaşîya gelê Kurd dixe pirtûkan, êş û rencen wan dirêje ser rûpelan bi hubra reş. Bi gotinên mîrxaş, tirsnenas...

*"Lê çi bêjim.  
Xirabtir, bûye qismetê me.  
Mîrin, bi vî awayî şeşderb li meriv  
naxe,  
Dengnekirin û sekîn, gelek dijwar e  
Ciwan in em, wek lûla tivingê,  
Û dîlê çetel,  
Ji aşitîyê ra, ji cejnê ra hesret  
Ji xewan ra, kûr, bêxem, rehet,  
Bi sîh û du diranan ji kenê ra,  
Ji hezkirina têri xwe ra, ji xwarinê  
ra...  
Çend car, kelegirînî bûme bi şevan,*

*Ya rastî, hesret di navbera me da  
xweş e  
Û di eslê xwe da, em dizanîn  
kesrandinê."*

Di şîrên Ahmed Arîf da peyv, hevok gelek kurt in lê her peyvek çiyayek radigire ser pişta xwe, kûrmâne ne, pirmane ne. Di binê wan peyvîn gelêrî da felsefeyek kûr heye, lê qasî ku kûr e ewqas jî vekiriye wek ronahîya hîvê. Hênik dike dilê cehnime, vedijenîne hêvîyê û bi mîrxaşî pê dikute erdê ji bo azadî..

Zimanê şîrên wî Tirkî ye lê naverok Kurdî ye, serapê Kurdî ye... Û bi taybetî jî, ji ber vê pênasê, pênasâ Kurdîtî hevs û zîndan, qeyd û lele bûne parçeyek ji jîyana wî. Bûye gur di çavê dewleta Tirk a dagirker da.

Gelek caran bûye meraq û hatiye pirsîn, "gelo Ahmed Arîf gotiye, ez Kurd im?" Bi rastî min jî nebîhîstiye, lê "pêwîstîyeke weha" nebûye asteng li pêşîya pênasâ Ahmed Arîf. Şîrên wî, hestên wî, armanc û têkoşîna wî ya bê tavîz têri xwe delîl in, hewceyî îsbatê nînin.

"EZ hozanekî gelê xwe yê belengaz û bindest im. Ev ji bo min şanazîyeke payebilind e" dibêje Ahmed Arîf û di hevpeyvînekî da jî weha tîne ziman pevgirêdana xwe û gelê xwe: "... Ez, kurê xelkekî bêdeng û kûr im. Û ne tenê bêdengî, bi gelempêrî bêtîrsî jî xusûsiyetekê gelê min a sereke ye. Divê meriv xusûsiyeta berxwedan û serhildanê jî lê zêde ke..." û herweha di her fersendî da bi reheke qalind xwe bi gelê xwe va girê dide, jîyana gel ji xwe ra dike çavkanîya herî mezin û vî pevgirêdanê dike şanazî bo xwe.

**Şanazî jî dignî**

*Di kanîya çavêñ te da,  
Eurek,  
Li ber valabûnê ye  
Hema hema.  
Tiştîn ku ji hişê min derbas dîbin*

Dixwînî wek av.  
Dinya dît,  
Dest kirin qirika me...

Negre firmeskên xwe  
Şanazî jî digrî...  
Berde bira xwe bişo esman  
Lacîwert, kesk, zêr  
Tîrêjîn roja ku diçe ava.  
Vaye li berbangê ne disa  
Çiptazî  
Û şîn.  
Vaye dibêjî qey sira çîya  
Û dibêjî qey bayê nerm ê derya...

Kes nikare tozê deyne  
Ser neynoka me ya ku dibrin û davêjin  
Tu keça herî bedew î  
A hemû galaksîyan.  
Ez jî cewhera wê me êdî  
Cewhera wê ya soragir im,  
Evîna reş  
Ya ku Prometheus disotîne...  
Ne di enîya me da eybek  
Ne di bin çengan da  
Xaça me ya veşartî.  
Me ji vî xelkî hez kir  
Û ji vî welatî,  
Her ev e yê ku nayê efûkirin  
gunehê me yê tirsehêz... ((Ev helbesta han, helbesteka  
neçapkirîye û min ji kovara Govend wergirt û  
wergîrande Kurdî)

Ahmed Arîf li ser axekî kevin, li Diyarbekir hatiye  
dinê. Axekî ku dîrokek kevin û çandeke mezin di  
paşa xwe da veşartiye û gihandiye me. Bi zagonê  
eşîrî, mîrxasî û dobra dobrî mezin bûye. Xayîntî,  
pûştitî bîyanî ne ji pênaşa wî ra. Eger wî carek so-  
zê mîra dabe, veger, poşmanî tune ji wî sozê.

Destnîsara Kela Diyarbekir û Lorîya Adiloş

1.  
Destê min naçe  
Bîhokên wê, binarêñ wê yêñ dil dibijî  
Stûyê xwe xwar dikim û dimeşim.  
Ev ne ew hal e ku gur û teyr pê bizanin  
Qet pirs neke  
Laaaaaal...  
Jê vegere bîra fermaña reş derê rîyan  
Baxçê yarê tarûmar  
Xwîn der dike perçem

Here were lepekî can,  
Pêşkêş kirîye min, ji qeda û bela wê ra,  
Ez bimrama loooo...  
Destê min vala,  
Piyê min girtî.  
Û yê ku bizanibe tenê ez im

Min ji ci afat hez kir!  
Serda jî dev heye ziman tune  
Kela Diyarbekir...

2.  
Vedike,  
Gulê çîlsor ên heftber  
Û ji alîkî va berf dibare,  
Ba dibe Qerecdax,  
Ba dibe zozan...  
Binihêre, simbêlê min qeşa girt,  
Li min sar e jî  
Zemherî jî ajot û ajot,  
Te, wek ku Bihar bî diramim,  
Te, wek Diyarbekir,  
Bi ser ci, bi ser ci nakeve ku  
Tama ramandina te...

3.  
Ava Xamrawat qeşa girt,  
Li ser Dîcleyê çar tilî qeşa,  
Em derdanêñ xwe ji bîrê dadigirin,  
Ji berfê dema çayê digrin.  
Dîya min wek sir vedîşêre êşa xwe  
"Ba ye" dibê, "biharê tiştek min namîne".  
Xwîşka min, ducanî, giran,  
Ya ewil e, ji alîkî va bi dizî şerm dike  
Û ji alîkî va jî ditirse  
Bi xofa mirinê  
Vi zivistanê canek din jî li me zêde dibe,  
Pêçeka min, ez di ku derê xwe da biparêzim?  
Bi xér bê,  
Bi xweşî bê,  
Xwarzîyê Ahmed Arif...

4.  
Tu hatî dinê  
Sê roj me te birçi hîş  
Sê roj pêşîr neda devê te  
Pêçeka min Adiloş.  
Ji bo ku tu nexweş nekevî  
Ji ber ku toreyêñ me weha ye,  
Erîşê pêşîrê bike niha  
Erîş bike û mezin bibe...

Vana,  
Marê gewr û zîvzîve ne  
Vana,  
Çav berdane  
Xureka me, nanê me,  
Vana nas bike  
Nas bike û mezin bibe

Ev, namûs e,  
Li navdanka me kolandî,  
Ev ji sebir,  
Ji jehrîyan werivandî  
Xwe li vana bipêce  
Bipêce û mezin bibe.



Dr. Cuwan Batû

## ŞÜJİN

### ” RÊYA PÊŞDABİRİNA AXAFTIN Û DANÛSTANDINÊ ”

Em hinekê li ser civak û civata me kurdan bisekinin. Ji ber ku wê gelek kemasî, nexweşî û gi-rekên xwe hene. Girêka axaftin û ji vê jî, ya danûstandinê, girê-kek herî bingehîne di vî warî de.

Herwekî ku tê zanîn reng û awayê axaftinê me kurdan, ci di civîn û sohbetan de be, û herweha ci jî di komcivînê me de be, dibe bingehînek ya danûstandinê me bi hev re. Û ev yeke jî birha xwe wê li pêşeroja me bixwe bike û dike jî.

Em di sohbetekê de, em bêjin bila em pênc kes pişikdarê wê bin, weke nimûne ji xwe re bigirin. Werin em li ser vê yekê li gor wê şemaya ku me li jorê xet kirî, ku gelek psîkolog wê bikartînin, bala xwe bidinê. Ger em li gor "zimanê" psîko-lojiyê li ser vê yekê biponijin û berê xwe bidin vê şema jorê, wê çaxê emê xweş bibînin ku sê xetên mezin hene ku ew gele-kê girîngin bo mesela axaftinê. Ew jî evin: Xeta A, B û ya C` ê. Ji xeynî van xetan, 5 xetkokên (xetên zirav, 1-5) hene ku xwe digihînin destpêka van xetên gewre.

Em yek bi yek li ser van xetan bisekinin û van vejêrin (analîz) bikin.

Xetkokên zirav, ango yên 1, 2, 3 ,4, 5 :

Ew xetkokên zirav kesen bêş-darê civatê ne. Ango ew pênc

kesen ku di vê civata me ya mîsalî de amade dibin. Her yekî ji wan bi awayekî aktiv, heye pişikdarê vê civînê (civatê) bibe; dîtin û gotinê xwe bêje. Wê hinek aktiv bikevin di nava vê sohbetê de û hinek jî kêmter aktiv para xwe bêxin di nava vê li hevûdu kombûnê de. Û wê sohbet ji 0` ê (sıfırê) dest pê bikê û li gorî reng, awa û tona axaftinê wê civat (sohbet) ber bi xeta A` yê ve li gorî zeman (çax) berdewam bike. Ew xetên ku diçin jêr û jor jî reng û awayê axaftinê dide xuyakirin. Emê di pêş da li ser vê yekê bêhtir bisekinin.

**Xeta ber bi rast ve, ango ya A`yê:** Em ji vê xetê re bêjin pê-vajoya axaftinê, yan jî xeta bingehîna axaftinê . Ango gava çendek di civatekê de diaxivin mirov xwe li dorana dereke neutral (bêteref) digire û li der û dorana wê diçê û tê. Ew jî ev xete bixwe ye. Ev li gor axaftineke "normal" e. Ango bêşdarê civatê xwe hinekê digirin da ku "tixübêñ (sinorêñ)" adet, rîç û norma civakî xerab nekin. Xweşbûn-nexweşbûn; sarbûn-germbûna axaftinê dikare dirê-jiya vê xetê dirêj, yan jî kurt bîke. Ango wê axaftin heya kûdê û çiqasî berdewam bike.

Ger sohbeta me xweş û germ be, wê ev xete jî dûr û dirêj be. Ger civata me kurt bikişîne, em bêjin em ji hevûdu xeyidîn, rabîn hev; me dilê hev şikênan, yan jî tişteke me welê girîng tunneye; an nexwe civata me bêtam e; wê çaxê heye civata me çaxeke kurt bikişîne û ji vê jî wê ev xete jî bêgûman kurt be.

**Xeta berbijor ve, ango ya B`ê:** Ev jî kalîteya axaftinê dide xuyakirin. Ango, gelo wê axaftina me xweş û germ be, yan jî bi deng û qirren be. Bi dostanî û berhemî be , yan jî wê pûç û betal be. Ev yeke bo axaftinê, gelekê girîng e. Ji ber ku ew dide xuyakirin gelo reng û "tama" sohbeta me çawan e. Gelo em dikarin axaftinê xwe xwedî naverok bikin, da ku em bîkarin tiştekê ji xwe re ji hevûdu bigirin, bibin yek û danûstandinê xwe bi hev re hê xurttir bikin û xwe bi hev re pêşda bibin yan na. Ger civata me bes li ser axaftinê "rojane", ango yê ku her yekî ji pişikdarê vê civatêne pê dizane be, wê çaxê kalîta axaftinê jî wê ne gelekê bilind be û ev xete jî wê kurt derkeve.

**Xeta C` ê :**

Em ji vê xetê re bêjin xeta "bêterefîyê" yan jî xeta "normalê". Ji xwe jî bingehîna vê nivîsand-nê jî li ser vê xetê bixwe ye. Ji ber ku axaftinê mirov yên rojane û "normal"ku yek bi hev re dike mirov wê hertim di bin vê xetê re be. Kalîta wan wê ne gelek bilind be. Û ji vê jî axaftin û danûstandinê mirov wê weke berê bi rê ve biçe. Pêşketinek di vî warî de heye çenebe. Bi

tersê wê, ger em kalîteya axaf-  
tinên xwe bilind bikin û bi ser  
vê xetê bêxin, hingê emê xweş  
bibînin ku wê em xwe di wa-  
reke din de, hê bilind ku bêh-  
tir zanebûn, karûbar jê re divê,  
bibînin. Wê ev yeke jî birha  
xwe li danûstandina me bike û  
heye wê gelekê jî xurt bike.

Gelo wê axaftin bi ci awayî dest  
pê bike û berdewam bike? Bê-  
guman gelekê zehmete ku mi-  
rov bi vê yekê bizane. Lê belê di  
bingeha xwe de heye ev civîn li  
ser bingehîna bêtrefiyê dest pê  
bike û di pêvajoya axaftinê de  
heye ew reng û naveroka xwe  
biguhere.

Li gor vê şemaya jorê wê axaf-  
tin di dest pê kê de li der û dor-  
ana xeta A` yê biçe û bê. Yek  
xwe ji normên, ango adet, tor,  
çande û terbiyeya civaka ku mi-  
rov tê de ye (em bêjin ya me  
kurdan) dûr nake. Li gor wê  
yek wê gavêن xwe bavêje, dîtin  
û axaftinên xwe bike. Ji ber ku  
civatê "sinorek" bo vê yekê li  
gor pêşveçûyina xwe daniye.

Xeta A' yê, weke ku me li jorê ji  
got, xeta bingehîna axaftinêye.  
Li der û dorana wê de mirov li  
ser zanebûn, têgihiştin, danûs-  
tandin, silav û bixêr lihev dayi-  
nan diaxivê. Di vî warî de ne  
pêşketinek û ne ji paşketinek bi  
axaftinên yekî re çêdibe. Mirov  
wan gotin, dîtin, daxwaz û  
dilxwaziyêن xwe yên kevin du-  
care dike, belkî her car bi ren-  
gek din. Heye hinek ji havalên  
bêşdarên sohbetê gelek tiştan  
"pêwist" nebînin ku li ser wan  
biaxivin. Heye ew wan tiştan  
gelekê "şexsî" bigirin, yan ji  
"eyb û fihêt" bibînin û ji vê ji  
heye ew kesen ku di nava xwe  
de "girtî" bin. Tişt û miştên  
xwe "nadin" der. Wê çaxê ka-  
lita axaftinên wan heye bin vê

xeta bingehîn bixwe jî bikeve.  
Û li aliyê din jî heye hinek bi  
tersê vê yekê bin, ew kesin "ve-  
kirî" bin, têrashaftin, xoşsohbet-  
kar û serbest bin. Hingê rengê  
axaftina wan jî wê bê guhertin  
û bi ser vê xeta bingehîn, ango  
ya A` yê bikeve.

Em werin li ser nimûneyên  
xwe. Em bêjin bila axaftin di  
nabêna du havalan de weha  
dest pê bikê:

-Merheba ji te re. Tu çawanî?  
-Ehlen, li ser çavan. Gelek si-  
pas, ez başim. Gelo tu çawanî,  
biçük çawanin?

-Gelek sipas em jî basın, büyük  
destê te maçî dikin.

Di vê danûstandinê de me di-  
yalogek, weke her carî dît. Me  
tû pêşketin, yan ji paşketin di vê  
axaftinê de nedît. Lê, ger em vê  
diyaloga xwe bi rengek din bê-  
jin, hingê emê bibînin ku wê  
naveroka wê bê guhertin:

-Merheba ji te re. Tu çawanî?  
-Ehlen ser çavan. Ez ketî bûm  
nexweşxanê, duhî derketim. Tu  
çawanî, büyük çawan in?

Di vê dê de wê axaftin kalîte,  
zeman û naveroka xwe biguhe-  
re wê çaxê wê rengê axaftinê  
hinekê li ser xeta A` yê bikeve û  
ew dikare weha berdewam bi-  
ke:

- Te got ci?! Tu ketî bû di nex-  
weşxanê de?!

Xwedê xêr bike, ci bi te hatî  
bû? Hema ne tiştin ciddî bin!

-Na, na. Hinekê ez bê hal bûm.  
Sermayê li min xistî bû. Agir û  
koxika min zor hebû. Tehlîl-  
mehlîlén min girtin, tiştin der-  
neket. Gotin ku virus e.

Di vî warî de wî havalê "nex-  
weş" rengê (awayê) axaftinê  
guhert, ew bilind kir û bi ser xe-  
ta A` yê êxist. Ango wî hinekê  
söhbet "germ" kir. Bo vê çen-  
dê ji heye ku axaftin xweş û ges

bibe. Ji vê ji heye havalê din  
rengê vê axaftinê bi vî awayî bi-  
guhêre:

-Heyran bo ci te telefonek neda  
me, ku em bi te ve bihatan.  
Welle te eyb kir.

-Min nexwest we aciz bikim.

Heya bi vir ji dîsa sohbeta me  
normal e û li gor normê civakê  
ye. Ji ber ku mirov gilî û gazin-  
dên xwe dikare li haval û dos-  
tên xwe bike. Lê belê kalîta vê  
axaftinê bilind bûye. Lê belê dî-  
sa ji ew xwe li der û doranên  
wê xeta "bêtrefiyê", ango ya  
C` ê de digire.

Li aliyê din ji wî havalê "nex-  
weş" dikare behsa nexweşî û  
ketina xwe bo nexweşxanê ne-  
kira. Wî dikariya ji xwe re we-  
ha biponijiya: "Ev kareke min  
şexsiye û ne hewceye ku serê  
van havalan bo vê yekê biêşî-  
nim". Wê çaxê wî havalî ne di-  
bû sedemê bilindkirina kalita  
axaftinê. Ango mirov dikare wî  
havalî yekî "fihêttoyî", neaktiv  
fêm û qebûl bike. Ji ber ku wî,  
xwe hema bêje di bin normê  
axaftinê re girtiye. Ji vê ji pêş-  
daçûyina axaftinê heye nebe.

Emê niha rengê vê diyalogê bi-  
guherin û wê bi awayek din bi-  
din xuyakirin. Weke:

-Tu bi xêr hatî, merheba ji te re,  
tu çawanî, büyük çawanin?

-Ez bi sedên caran ne bixêr ha-  
tim. Bi serê biratiyê min û dayi-  
ka zarakan şerr kiriye û min ji  
ber wê bazdaye hatime vê dê,  
berî ku serê min bê şikestin!

Li gor vê diyalogê, wî havalî  
rengê axaftinê guhert û ew bi  
yek carî çend "mîlîman" bi ser  
xeta bêtrefiyê re, ango xeta  
C`ê, êxist. Derbasî kata herî bi-  
lind bû û da xuyakirin ku girê-  
kek li holê ye ku serê wî bi wê  
re ketiye belayê. Wî, "normê"  
civatê şikand, ji ber ku "ji ber

dayika zarokan” ji malê reviye...

Nimûneyek din:

- Merheba ji te re. Mala we ava ku hûn û mala ewko li hev hatin!

- Ehlen, ser çavan. Tişa ji destê me ve hat me kir. Em dijî du-bendiyê ne!

Di vê diyalogê de mirov dibîne axaftineke dostane dibe û ew jî li der û dorana xeta normalê, ango ya bingehîn, ya A` yê diçe û tê. Ger em wê bi vî rengî biguherin:

- Merhaba ji te re. Mala we ava ku we ew dilmabûn ji nava xwe û mala ewko rakir!

- Welle ne baş bû. Bi min bûya, heyâ ku ew nehatan dest û lingê me, diviya bû em li wan li hev nehatan.

Li gor vê yekê jî em dibînin ku rengê (kalîteya) axaftinê ha-te guhertin û ew hinekê bilind bû. Rê li dûrûdirêjiya axafti-nê heye vebe.

Bi vî rengî tê xuyakirin ku axaftin li gor reng, awa, ton û kalîteya xwe dikare bi çax re biguhere. Ew dikare geh bilind bibe û geh jî dikare nivz bibe.


Ger yek li vê pêvajoya axaftinê binêre, yek dikare bêje ku axaftina ku li der û dorana xeta C' ê bixwe ye ku ew pêş di-keve û kalîta axaftin û ji vê jî ya danûstandinê pêş da dibe. Tê xuyakirin ku çendî axaftin xwe li pêka bilind bigire, wê çaxê wê ew bêhtirîn pêşda biçe û ji vê jî wê ew birheke xwe li danûstandinê bike û heye danûstandineke xurt, dostane û biratî jî peyda bike.

Di dawiyê de ger em hinekê wan xet-metan, wê şemayê ji bîr bikin yek bi kurtî dikare weha bêjê:

Divê yek di axaftinê xwe de serbest û aza be; vekirî û dos-tane be û rê bidê ku axaftinê yekî kalîteyek baş wergire da ku ew danûstandineke giranbiha di navbera yekî de çêkê. Pêwiste ku yek jê netirsê ku reng û xurtbûna axaftinê bilind bibe. Li aliyê din jî divê yek amade be ku di vê pêka bilind de-ango ya axaftinê de - danûstandineke li ser bingehîna dostaniyê divê. Û herweha jî, divê yek hay jê hebe ku yek gavên xwe li gor normê civaka xwe bavêjê. Bes, yek birha xwe jî li wê normê bixwe bike da ku ew jî li gor çax xwe nû-jen bike û pêş da biçe; serbest û azad û demokrattir bibe.

Ger em van girêk û kêmasiyan kêm bikin, bêguman wê, em weke mirovê kurd, hê bêhtir bi hev re bibin dost û bira û li hev bikin. Ji vê jî, wê gel û welatê me serbikevê. Weke goti-na dawiyê, pêwiste em di civîn û civatêن xwe de dil, daxwaz û dilsoziya xwe bo rêk û pêkkirina dostaniyê di navbera he-vûdu de bikarbînin. Ev yeke, wê hê bêhtir bawerî û pêşketi-nê bi me hemûyan re çêkê.

Divê em tû caran ji bîr nekin ku em, weke mirovê kurd, he-ya mirinê mecbûr û muhtacê biratî û dostaniya hevin. Ev ye-ke jî bêguman li ser bingeha dilxwazî û dilsoziya pêşdabiri-na axaftin û danûstandina me kurdan bi hev re xurt û zîn-detir dibe!



SEBRA EYUBI

Nizar Mihemed Seid

Xwe çemand, çantikê xwe ji bin kursîkê kişand, zincîrka wî vekir, destê xwe têgerand û gote hevalên xwe:

- Bila bo me vê kasetê danîte ser, rêka me dûre, belku saetekê xwe pê ji bîr bikin.

- Xweş şûle. “Du sêkaka pêk ve got”.

Ji dawiya pasê car destê rastê, car jî yê çepê dixiste lêva kursika û bejna bilind ber di cihê şoforî leqand, devê xwe bi nik guhê vî ve bir û gotê:

- Heke zehmet nebe, bo me vê kasetê deyne ser?

- “Li ser çavan”. Bi zimanê erebî.

Kaset dayê û li ser pê xwe bi rûçikekê ges zîvirî cihê xwe.

Dengekî zelal, awazên dilveker, ser ji hemî dengên din stand. Êkê serûçav girê û kose, li nîveka pasê, ji cihê xwe rabû, dengekê kerkinî da binê gewriya xwe:

- Birayê şofêr... Bo xatira xwedê, rehmê bi guhêni me bibe, ev e ci çize-viziye te bo me deynaye ser?!

Hindekên din jî, her êkê ji cihê xwe piştgiriya wî kir, “rast e”, “erê wella rast dibêje”, “di pencerê ra bavêje şofêr”! Şofêri ne ji dil kaset deranî û bi mikrofênenê gazî kir:

- Were çavêni min were... Kasete xwe bigre, ya kê ye?

Kabira bi rûçikekî di şermê veday, wekî leşkerekî şikestî çû kasete xwe ji şoforî wergirt û gotê:


- Erê dê tu destûra min dey, mikrofonê bikar bînim? Min du qise hene, ez dê bêjim?

- Belê? Fermo.

- Gelî bira, guh bidin, ez ji bo we bêjim: Min gelek pê nexweş e jî bêjim, belê we ez neçar kirim. Xudê alîkarê me bit, eve hezar û hinde sal e em tehamula we dikîn, hûn neşîyan bêhnekê tehamula me bikin! Çawa ji pasê bi xwar ket, çar - pênceka kire di nîva xwe de. Êkê rûçikê wî nîna dupişkî reş, palek pêrana û gotê:

- Yalla bi berî me bikeve bo daîr!!!  
1989 Duhok

\*Xelîl Duhokî, ji tîpên erebî wergerandiye yên latînî.



## Miradê Kinê, hunermendekî yekta ye! 1946- 1985

Rûpelek ji jiyana wî

Ji roja ku Miradê kinê (Miradko) serê xwe danî û ji me bar kir, çapemeniyên kurdî çi pûte-yek pê ne dan. Üst û sedem mişe ne û ez her ne şêm ku rêka van çapemeniyan li gor dîtina xwe biguhurînim.

Berê min gotarek bi navê "Dengbêjê nemir Miradko" li rojnameya welatê (hejmar 54, rûpel 11, sal 1993) belavkir û nuho jî li berbangê. Armanca min ew e ku çapemeniyên kurdî û xwendewarêñ kurdan, xudan li huner û hunermendêñ xwe derkevin...

Bi kurtî, min pirtûkek li ser jiyan û hunera vî hunermendê yekta nivisiye. Lê mixabin e ku ew pirtûk hêj di tariyê de ye û bê harîkariyê, ez ne şêm çap bikim.

Mam Firmêñ 1989 got:

Ez Firmêñ im, Kerburanî me, emrê min 75 sal heye. Ez ê çiroka Mirad ji Beşîr Botanî re bêjîm, deqene fêm bikê. Çimkî jêre zehf meraq e û li dinyayê de dibê carekî dîtirkê tarîxa Miradbihîstanâ û hew.

Mirad xwedê lê xwes bê, ji Kuprasê hate Kerburanê. Ew xortekî jêhañ û spehî bû, ne pêdivî ye ku pesnê wî bidim. Tê-

kelî, dan û standina wî di gel mala Îbarahîmê Şimûn gelek baş bûn. Ewî soz da ku ji cem wan hew rabe, hew here dinya-yê û bû dengbêjê Kerburanê. Birayekî wî hebû navê wî Xelîl e û ew xudan dukanek elektrîk bû, lê ew zû mir. Mirad ma û karê wî muzîk bû. Wî roj bi roj xwe baş pêşxist. Ahengbêj û kemancejen li ser Mirad re min ne dît û li welatê me yê wekî wî nîne. Jê bi nav û dengtir ranebû û me ne dît. Bi rastî ji şahî û davetan xuya ye. Mirad her dem di civata me de û li mala me bû heta em hatine vê axa Swêdê. Ji lew re bû meraq, me got imkana wê nîne em ê vî Miradî bînîne vê axê. Ew ma li Tirkîyê û em li Swêdê ne.

Şevek, ez wê şevê ne yî di nav wan de bûm. Mala Hesenka qeçexçî ne, ji binxetê bi şevê û bi dizî ve hatin gundê me û bûn mîvanen mala Evdê Silêmanko. Silêmanê Sîhêñ û Ekrem kurê Ehmedê Evdula jî li wir bûn. Ev Ekremê he, mîrekî timam çeleng bû. Dibêjin ku di wê şevbuhêrkê de Mirad gelek xweşkir û ji dil û canê xwe lêdida û stiran digotin... Dema ku mîvan rabûn, yekî ji wan destmalek li erdê danî û her yekî jî 100 wereqe danî ser wê destmalê, xatir xwestin û çûn. Ekrem rahişte wan pera, lev tewandin

tev li destmalê kirine berûka xwe de û çû mala xwe... Kesî di dewr û zemanan de ne dîtiye ku hunermendek tim besdarê şahî û dîlanan yê milletekî bê, li cihekî, êdî dema ku civatek ji wan civatêñ hunerhez bixwazin ku tiştekî weke diyariyê pêşkêşî wî dengbêjî bikin, ci pere bê, yan tiştên din. Wesan yekek ji wan xuya û ber bi çav ji gire girekê gundî û çawan li xwe deynê ew perêñ ku li ser destmalekê ji wî hunermendî re hatine komkirin, li hev bipêçê û bê şerm û fedî bixê berûka xwe de. Ev karê ha dibe weke dizike eşkere...

Herê hêrê! ka em werin ser gotina mîrê helbestvanen kurdan seyda Ehmedê Xanî, yê ku berî sê çerxan (300 sal) di helbesta xwe de ci got:

*Şûrê hunera me bête danîn  
Qedrê qelema me bête zanîn  
Derdê me bînitin îlacê  
Îlmê me bînitin rewacê*

Li dûmahiye rez û silavêñ min ji çapamenî û hunerhezan re hene û hemû ji bo parastina hunerêñ kurdî û xwedîderkevtin li hunermendêñ kurdan e.

Miradko nemir e!

### Ferhengok

**Yekta:** Unik bi Swêdî, ferîd bi erebî.

**Pûte:** İhtîmam bi erebî


**Mîse:** Gelek, tenê ji hejmaran re.

**Xwendewar:** Kesê ku li demêñ vala dixwîne.

**Ahengbêj:** Mitirb bi erebî

**Şevbuhêr:** Rûniştina bi şevê ta elindê

**Rez:** Qedir û iştîram bi erebî



SELAM CIZÎRÎ

## WELATPARÊZÎ Û ALA

Di tekoşîna gelê Kurd de gellek serhildan û şoreş hatîne kîrin. Lê dîsa jî Kurd weke gellek neteweyên cîhanê hîn xwe negîhandiye mafê xwe. Di serhildana Bedirxan Paşa û heta îro zêdeyî bîst şoreş çêbûne. Di her serhildanekê de bi sedhezaran şehîd hatine dayîn. Lê mixabin heya îro gelê Kurdistanê weke gelên cîhanê xwe ne gîhandine azadî û serxwebûnê. Di vê derheqê de heta îro xwe negîhandiye tu konaxan. Gelek sedem hene ku gel ne gihiştîye van armancan.

Di xebata têkoşîna gelê Kurd de, li gor min du tiştên sereke hene. Di vê nivîsandina xwe de, ez ê tenê li ser van dîtinên xwe diyar bikin. Wek tê zanîn ku di nava Kurdan de welatparêzî û niştimanperwerî qels û qor e. Gelo qev çend ji ku tê? Çima welatparêzî û niştimanperwerî di nava gelên bindest yên cîhanê ku pîstî çend-salan gihiştine mafênen xwe yên azadî û serbestiyê de xurtir bû? Gelo rêxistinên ku wela-

tên xwe azad kirine ji rêxistinê me kurdan xurtir bûn? Gelo wana ji rêxistinê me pirtir, zanatir, mîrxastir û çelenktibûn? Na li ser bextê min ne yek ji vana. Li gor bîr û bawerîya min di bingeha vê problemê de zikreşî, nelhevkirin, pareperêzî û egoizima rêxistinê kurdan heye. Van sedeman dibe asteng li himberê xurtbûn û qelewbûna welatparêzî û niştimanperwerîyê. Heta ku vana li nav rêxistinê me yên politîk de qels û qor nebe wê rewşa me bi vî rengî bête domandin. Ez dixwazim promlemê bi şêweyek vekirî bînim zimên. Rêxistinê me berjewendiyêni partiya xwe li ser berjewendîya gel û welatê xwe re digrin. Egoizim, zikreşî û nelhevkirina di nava hemû rêxistinê me de pênc kêm an ji pênc zêde ye. Ez ê çen serborî û mînaka binim ser zimên. Ez di 1994 an de, meha Temozê çûm Başûrê Kurdistanê. Ez çûm wê beşê ya ku xwedêgeravî ku azad, ya ku serbixwe û lewleba gel bi parlament û partyên xwe digerîne. Li Zaxo heya Hewlêrê war bi war geriyam. Min gelek tiştên ku di xeyalên min de hebûn, bi çavêن xwe dît. Ez beşdarê gelek civîn û interviyonên televizyonên kurdî bûm. Wek mînak TV Xebat, TV Kurdistan û TV Dengê Kurdistan û li ser navê Federasyonê, beşdarê civînan bûm. Wek min li jor jî da dîyarkirin ku min di wê gerê de gellek tişt dîtin, lê mixabîn min du tiştên giring nedîtin. Yek Ala Kurdî û ya diduyan pesindana gel. Ji Zaxo heya Hewlêrê di her kontrolekê de yan ala PDK an jî YNK li jor hatibû daleqandin. Di tele-

vizyonan de jî, ji xeynî alên partiya, tu alên din, ez bi xwe lê rast nehatin. Min di derheqa vê rewşê de, tirs û tumetên xwe ji Cewher Namiq û Fuat Mesum re anî zimên. Min li wir bi gellek kesan re têkilî danî. Te ji kê pirsa rewşa welêt bikra, wan yek ser pesnî partiyê xwe didan. Tu kesî ne pesnê ala kurdî an ji Kurdistanê didan. Di rewşek wilo de, gelo wê çawa welatparêzî niştimanperwerî xurt bibî? Di her pêncî sala carekê de, bayek hişk yê serxwebûn û azadîye tê û baranek pirr xurt dibare. Di wê baran û bayî de gellek dar diqirê, gellek kendal dihezên û li ber şopa rûbaran diherikin. Ku darê rayên xwe baş li jêr gerandibe, ba çiqas xurt dibe bila bibe, dar wê bikaribe li himberê wê xwe bide parastinê. Heya îro gellek caran bayên xurt hatine, baranê pirr hişk barîne, gellek welata xwe li himberê wan ba û baranan de, parastine û pirraniya wan gîhiştine mafênen xwe yen azadî û serbestiyê. Lê mixabin me kurdan heta niha li himberî tu bayî de nekarîye xwe biparêzin. Di bayê 1848-an de Şoreşa Bedirxanîya, di baye şerê cihanê yê yekem de, şoreşa Şêx Mehmud, di 1925 an de, Şêx Seîd, Seyit Riza, di 1945 an de, Qazî Mihemed û Barzanî li ber ba û wan baranan nekarîn ravestên û bi wî awahî şoreş têk çûn. Lê di van bayan de, dewletên Balqanan, Ereban, Çin, Israîl, Hindistan, Pakistan, Vietnam û gellek din jî gihiştin azadî û serbestîya xwe. Di parvekirina bayê 1990 de, gelek welata xwe azad kirin û ji bona azadîya xwe gellek li ber xwe dan û hi-

nek jî hîn didin. Ez bawerim ku di rojek nêzik, ne dereng de, wana ji yê bighênin armanca xwe. Di Sovyeta kevn de, Azer-ya, Tacikiya, Turkmenîya, Ermeniya, Gorcêya, li Baltikomê, Estonî, Lett û Lit-vanî, di Yugoslaviya kevn, Xirvat, Boşnak, Makedonî, li Efrîqayê Eritrî ûhwd. gellek welatên din jî bûn dewlet û bûn xwedî nav û nîşan. Di vî bayê henê de jî, Kurd li başûr ketine qirika hevdû . Wey li weylika wî yê zorê bêtir bide yê din. Demê ez dinêrim Çeçena û Kurdên me yên Başûr tînim beramber hev, hingê meriv dizane cudabûyina rexistinê me kurdan û yên Çeceniya ji çawa ji hev cuda dibil. Çeçenî bi ala gelê xwe êrîşê dibe ser ne-yar, yên başûr bi alayên partîyen xwe êrîşê dibil ser hev.

Çavêن wana nagerin ku Ala netewî di dezgehêñ fermî de, bête daleqandin, çavêñ wana nagere li himberî hev serê xwe bitewînîn. Van tiştan ji bona bakûr ji der-baz dibe. Ji ber ku heya niha carekê tenê hevalbendêñ PKK ala kurdî ne hildane. Tu bi kude diçî, derveyê ala partîyê tu alayên din peyda nabin. Wana partiyê li ser hemû tiştan re digrin. Çend roj berê bi navê meşa aşitîyê, meşek bi hinge ding li Kolnê hate çêkirin. Lê mixabin yek ala kurdî li tu aliyêñ stadyomê nehatibû daleqandin. Wan tiştan dibil sedem ku hijêkirina ala kurdî kêm bibe.

Li gor bîr û bawerîya min, van tiştêñ min li jor anî li ser ziman yan ku sedemê kêm welatparêzîyê ji zikreşî, egoîzim, Partîçitî, difinbilindî û nelhevkirin têñ. Ez dixwazim problemek din jî binîm li ber çava. Avakirna opinyon û institotiona pirr zehmet û zor e. Yan ku jê re demeke dûr û direj dive. Yan ku ev serê pazde salane, emê li Ewropayê opinyonekê xurt ji bona nas-kirin, pîştgirî û çareserkirina pirsgêrêkêñ. Kurd santim bi santim me danî li ser hev û em di rewşa îro de, gihabûn rewsek gelek baş, lê mixabin rêxistinê me bi sede-ma nakokiyêñ navbera wan de rewş bi awayekî negatîv dane guhertin. Em bi hev re ala netewî li himberê dijmin bilind kin ku, em jî ji wan astengî û nexweşyan der-kevin.

(CD û kaset Xurbet)

Hunermend Xalid Reşîd, kaseta xwe ya bi navê "XURBET" derxist. Di warê muzik û instirumenta pirr dewlemend e. Hûn dikarin ji telefona li jêr nivîsi kasetê bixwazin.

Tel: 036-148031

## Ahagdarî

Komîta Penaberan, di rojêñ duşemban-de, ji saet 15.00 - 18.00 li Federasyonê alîkariya penaberan dike.

## Annonss

### NY ÖPPNAD SKÖNHETSSALONG (Salona Bedewiyê)

Välkommen till min ny öppnade skönhetssalong på söder.

Jag är en auktoriserad hudterapeut och jobbar med Decleors produkter som är ett franskt märke.

Jag utför: Ansiktsbehandling, ansiktsrengöring manikyr, pedikyr, vaxning, helkrroppsmassage Frans och brynfärg och Blekning.

Mitt måtta: Låga priser till hög kvalite.

### UNNA DIG EN BEHANDLING DET ÄR DU VÅRD.

Hjärtligt Välkommen  
Halime Tahir  
Täppgränd 113, 3tr  
121 33 Enskededalen  
Tel: 08- 648 47 41

T.Bana-Station Sandsborg Tåg nr 18

## HEVPEYVÎN

Hevpeyvînek ligel huner-mendê bi nav û deng Kek Mehemed Taha Akreyî. Ji layê Kek Hesen Şêxo ye, berpirsiyarê beşê rage-handinê li FKKS. Hate amadekirin.

**Berbang:** Di destpêkê da em bi xêrhatina hunermendê hêja Kek Mehemed Taha Akreyî dikan. Me hêviye ku xwe bi xwendavanê Berbangê bide nasîn.

**Bersîv:** Em gellek supasiya kovara Berbangê dikan ku ev derfet da me û çavpêketin ligel min saz kir. Berî her karî em bikin, ez silavên xwe pêşkêşî karbides-tênen kovara Berbangê dikim. Weke ku dayika min digot: "Ez di buhara 1968-an de, li bajarê Akrê, li taxa Çustiya hatime dinê.

**Berbang:** Kek Mehemed xwendina te çi ye? Bi taybetî ji aliye hunerî de.

**Bersîv:** Bêguman min zor hewlda, da ku ez hunerê xwe pêş de bibim, di rêya hin maadê musîka de, lê mixabin min nikaribû ya, çunku rejîma biasê, di wê demê da, hîç rê nedidan lawên kurdan û li tu çihan qebûl nedikirin. Tevli min bekoloriya jî temam kiribû. Lê rabûn û rûniştina min tim û tim digel huner-mend û mamosteyên musikê bûn. Ez bûme xwedî fêriyek ne mezin lê belê karim barê xwe derbas bikim.

**Berbang:** Kek Mehemed tu dikarî destpêka xwe ya hunerî ji



Ji aliye çepê: Hunermend Mehemed Taha Akreyî û Hesen Şêxo bona me diyar bikî? Bi çî şewe bû? Weke evîn bû yan jî tesîra hin şexsan li ser te hebû?

**Bersîv:** Em hîn txwendekarbûn. Li Akrê me dixwend, her çendî şahidek jî va li vir e. Ew jî hunermend İdris Hacî ye. Dest-xweşê sazê ye, ez gelek supasiya wî dikim. Dema behsa huner û hunermanda dihat kîrin, wî saza xwe dişarand û yekemîn car bû ku wî ligel min kar kîri. Ez gelek kîfxwes bûm bi saza wi û sazgirtina wî û bi saz birin û anîna wî.

Di Akrê da bi rasti di wê demê da xelkê bi çavekê kêm berê xwe didan van tiştan. Di sala 1983-an de em xwendekar li mektebê, min stran digotin, dema ku em diçûne seyranê, çend heval hebûn, hez ji muzikê û dengê min dikirin û ji min re digotin: "Heta niha tu li ku bûyî? Gerek e tu berdewam bikî û em ê piştevaniya te bikin". Lê min nexwest strana bêjim. Van hevalan tesîra xwe li ser min berdewam kîrin. Di wê demê da ahangek li Akrê çê bû û ez tê da amadebûm. Di wê ahengê de, ez gelek tırsiyam, çimkî beisî tê de hebûn û dinya hemû dizanin ku beisî jî gelek zalim bûn. Heta mirov nikaribû bi zimanê kurdî qise bike. Çimkî li me bi hencet dabûn. Dîsa me berê xwe da kerwanê hunerî, di nav dil û canê me de û his û bîrê me

de destpêkir. Di sala 1987-an de, me li ser mirina M.Arifê Ci-zirî, dema çûye rehmetê, kasêtek amadekir. Ev qaset zor hate belavkirin, careke din ez ligel hin hunermenda, li Kurkûkê, bo radiyo Baxdayê hatim dawetkirin. Min çar stran li wir gotin, bûn sebeb ku bêtir bême naskirin. Di sala 1989-an de min qasetek din li Hewlîrê çêkir.

**Berbang:** Kek Mehemed te di karê xwe yê hunerî de, kî dît, weke mînak û mamost û rêber û tesîra xwe li te kir?

**Bersîv:** Bi rastî çawa min di nav rûbarê hunerî da melêvanî kîrin. Ew jî ew e ku her miletik, bi surûstê welatê xwe daxdar û muteesir e. Di doza welatê xwe daxdar û pêketî ye. Belê ez jî kurd im, bi tabiat û surîstê welatê xwe dibînim û ez pê daxda me. Ez hin çarde salî bûn. Min zor heval hebûn. Hevalên min tim yên ji min mezintir bûn. Ü pirraniya hevalên min kesen şoreşger bûm. Di nava rêxistinê hundurî de, kar dikirin. Ji wan hevalan Behcet Abdulla, wî dilê min, ruhê min xiste ser rêka hunerî. Ez bi gelek huner-menda daxdar bûn. Di dawî da ez bi hunermendê navdar Şivan Perwer daxdar bûn. Min di destpêka xwe de stranê wî gotin. Yen Mehmed Tayip û Mehemed Arif û yên folklorî.

Bi rastî seydayê nemir Tehsîn Taha nameyek gellek ciwan û berkeftî bo gelê xwe hêla. Seydayê Kemal Akreyî û hevalên min li Akrê gellek alîkariya min kirin. Eşqa min ya li ser hunerî geşter kirin. Yek ji wan hevalan, Behcet, İdrîs, Merdan, Mistefa Rihîmê rehmetî, Reqîb û bihtir ji xortêن Akrê bûn.

**Berbang:** Kek Mehemed asten-gân ketin rêya te da çi bûn? Di vê xebata te ya hunerî da, malbat yan jî jgundî û ciranê te, rê li te negirtin?

**Bersîv:** Birayê Hesen ez dixwazim bi şanezî ji te re bêjim. Helbet ez malbatake kurd im, ji Kurdistana Başûr, li bajare Akrê. Mezntirîn êrîş û asteng ji mala min dest pê kir. Gellek ca-ra min tembûr li gel hevalên xwe dianî, da ku xwe li ser fêr bikim. Piştî ku ez ji mal derdi-çûm, dema ku ez dihatim ku wa ye tembûra min bi destên dayika min perçe perçe bûye. Min digot: "Dayê te çîma weha kiri-ye? digotin ev tiştekî bê bereket e" Heta şes heft tembûran dayika min şkandiye. Çimkî peyva mitrip gelekî zor giran e li civata me. Ü bi çavekî gelekî xirab lê temaşe dikan. Lê roja îro rewş hatiye guherandin. Bi rastî min zor zehmatî di vê rikê da dîtiye. Di dema ku min dixwest bibim hunermend, asteng mişebûn, ji destkurtiyê, ji bê alîkariyê û ge-lek tiştên din. Bi rastî di civata kurdan de, pirr tête kirin.

**Berbang:** Kek Mehemed, nava-roka staranê te bêhtir çi ne?

**Bersîv:** Bêhtirê wan li ser berx-wedan û yekîtiya gel in. Ü evîna germ ya kurdewarî yê. Di gellek stranê kurdan de, yên kevn de, hertim kurr li ser keçê dinale. Ez hewl didim ku keç jî li ser kurrî binale. Gellekan ji min

xwestiya ku strana li ser şerên birakujiyê çêkim. Lî ez tucaran qebûl nakim, ku peyva birakuji yê bibe muzîk.

**Berbang:** Tu strana kurdî ya îro çawa dibînî? Gelo ev huner pêş ve dihere, an jî paş da dimîne?

**Bersîv:** Bi rastî hemû tiştên zer ne zér e. Eger tu bixwazî hune-rê xwe bi tevaya gelê Kurd bide qebûlkirin, divê tu xwe gorî bi-ke. Ez nabêjim weke ruh divê tû hemû armancêن xwe deyne rexekî, bo pêşketina vê hunerê. Piştî ku ez hatim Ewropa, me gellek kemasî dîtin, dengê de-holê ji dûr ve xweş e. Her hunermend jê têxwestîn ku mozîk-vanan li xwe kom bike. Ci li şeva, çi li konserتا û çi li qaseta. Ez hêvî dikim ku serhildaneke hunerî li Ewropa çê bibe.

**Berbang:** Baş e, dê çewan ku strana kurdî pêş keve û cihê xwe di nava stranê cihanê de bigrin, peydake?

**Bersîv:** Eger hin komele û hîn kurdêñ zengîn li Ewropa bi komkirina peran rabin û bers-pirsîyarên zîrek û jîr deynêñ û bi şeweylekî pirr zanîn tesarufê bikin. Ü têkilîyen xwe li gel vi-deo kilip girêbidin. Rojavayî an jî tîpêñ merkezî yên Swêdî. Em karê xwe yên hunerî destpêbi-kin û mamoste çêbin û bi çêtirin wêne û kamîran bêne girtin, belavkirin. Hingî strana kurdî jî mecbûre ku dengê xwe bide û cihê xwe di nava straranê ci-hanê de bike. Bi yekî tenê ev kar nabe divê serîhildaneke gistî çê bibe.

**Berbang:** Baş e, tê bîra te, star-na yekem ku te gotiye û kîjan salê?

**Bersîv:** Yekem stran di sala 1983-ê, 21-ê adarê de min got û ev jî Xezal Xezal bû.

**Berbang:** Tu şîrê kîjan hozanî dibêjî?

**Bersîv:** Yek ji wan kesan Abdurahman Hacî, Şaire û awazvan-e. Wî stran dane rehmetiyê Erdelan Zaxoyî, Yas û Şakil Ekreyî û dane zor hunermenda û ewêñ ku baweriya wi bi wan tê. Ü mamosta Sabri Botanî. Seyda Nemir Cegerxwîn, Seydayî Mu-eyyip Teyyip, Mustafa Selîm, İbrahim Resûl, rehmetî Rehîm, Hişyar Rêkanî, Şemal Ekrayî.

**Berbang:** Li gor bîr û baweriyan-te, baştırin hunermendê kurd kî ye?

**Bersîv:** Bi rastî yên ku berê min daye rêka hunerî, hunermend Şivan Perwer e. Ü berê geleka jî daye vê rêkê. Wekî din jî Hesen Cizîrî, M.Arif, Ezîz Şaroxî, Na-sir Rezazî bi dereca yekem Şivan e.

**Berbang:** Baş e, dema ku yekit-ya hunermenda çêbe, ne baştı e ji hinê ku hûn ji komele û federasyon û kesen maldar pera bixwazin. Tu li vir yê din li Fransa, yê sisiya li Elmania, dema yekîtiyek saz bibe ez bawerim çareseriyê ji gelek kemasîya re tîne.

**Bersîv:** Bi rastî jî ev xewna me hunermenda ya herî mezîn e. Dema hunermendê li herçar perçan bibin yek, hunerekî mezîn wê diyar be. Lê ez bawerim ku ev kar jî hunermendê ku ev çend salan li ewropa dijîn, tê xwestin. Kek Mehemed gotina te ya dayî ji xwendavanê Ber-bangê re çi ye?

**Bersîv:** Ez gelek supasiya karbi-destêñ kovara Berbangê dikim. Ü bi taybetî hêja Hesen Şêxo dikim. Ku zehmet kêşa û delîve da û hat li gel min rûnişt û ev çav-pêketin kir. Hêvîdarim serkevtî bin di karêñ xwe de û her şad û bextiwar bin. Ü êdî jiyan û xe-bat bo pêş ve.

## Qandê çiçî lejê xwîkişteni?

Osman Aytar

Kurdistanê Başûrî di roj bi roja nêmanena. Her roj hedîseyê newey benê û nê jî bi xwi ya munaqeşeya germ kenê.

Hewna munaqeşeyê bi alîkareya hukûmatê Bexdadî ya hêrîş berdena PDK (Partiya Demokrat a Kurdistanî) bi ser YNK (Yewbiyayena Niştimanî ya Kurdistanî) dewam kerdê û ameyê vateni ki eceba na pers a do bi awayêno aştiyane hel bibo yan nê, nofna YNK bi alîkareya Îranî ya dest bi hêrîşêno hera kerd û heyâ nezdiyê Hewlêr amê.

PDK fina kewt hereket û resê nezdiyê Silêmaniyyey. Tebî no nabeyn di traflîqê pêvînayena jî vêşî bî. Serekê PDK, Mesûd Berzanî di finî şî Tirkîye (Anqere û Silopî) û wuja di mesûlê Tirkîyey û Amerîkay dî. Heyetê PDK û YNK jî şî Amerîka. Wexto ki no nuşte ameyê nuşteni, qandê pêvînayenê bi mesûlanê Tirkîyey û Amerikaya, Sekreterê YNK Celal Telabanî jî Anqere di bi.

Qandê ki terefê lejî, çiya vera kişa xwi ancenê, belî niyo ki ewro yan jî meşti kam do, kotî di, kê bivîno û ci rê ci sozî bido, yan jî ci ra ci sozî bigîro.

Ne tenya rojname û kowaranê kurdan di, yê dewletanê mintiqâ û medyaya dînyay di jî nê çiyan ser o bol çî amey nuşteni û hewna jî munaqeşey dom kenê. Çunki hedîseyâ bi xwi ya tayn çiyê bînî jî ardî. Saddam ci verê qeraranê Neteweyê Yewbiyayî (NY) vijya û va; "Persa yewbiyayena erdê Îraqî hel biya."

Herçendi Amerîka tayn hêrîşê

teyaran berdî Îraqî ser û dima rejîmê Seddamî eşkere kerd ki, ê dê qeraranê NY biyarê ca jî, bol dewletê ki verî paştiya Amerîka gurotê, na fin ya bê veng mendî yan jî vatî ki "Ma hêrişâ qebûl nêkenê." Sebebanê tewranê nê dewletan ser o jî iddîayê ciya ciya estê.

Qandê ki destî bolî yê, zehmet o ki merdim bişo tayn çiya tam zelal kero; labirê noqteyêna zaf muhîm esta ki gereg merdim akerde vajo. Sebebê ki yenê müsnayen çiçî bê wa bibê, zeyê hedîsanê verînan, nê dimayina ra jî yê ki feyde vînenê eslê xwi di ne kurdî yê. Dewletê ki qet ci wext nêwaştê û nêwazenê ki kurdî tayn çiya di ser kewê, nê hedîseyanê dimayinan ra jî xwi rê netîcan vejenê û nînan qandê politîkayanê xwi yê şowenîst bi kar anê.

Qiseyê esta: Verg hewayê mijin ra hes keno. Çunkî verg ney heway di şeno seydê xwi weş bikero. Yê ma kurdan jî tayn winayin o. Wexta ma bi destê xwi hewayê welatê xwi ya bikerê mijin, ney ra heme babet "vergê di linginî" şenê feyde bivînê û mileta ma jî lingan ver o şiro.

Dinya alem zano ki nê tayn dewletê ki ge ge xwi zey dostê kurdan musnenê wahêrê armancê bîniyê. Înan rê ferq nêkeno, ha alîkareya PDK, ha yê YNK kерdo. Ewro paştiya yewî gênê, meşti ya binî gênê. Tecrûbeyê ney çî jî kemî niyê. Qandê ney jî zerarî ra merdim çend rew ageyro hendi rind o. Kişa bîn ra jî YNK û PDK wahêrê tecrûbeyanê ki waştena orte ra hewadena kiştê na persî hel nêbenê. Madem wina yo no lej qandê çiçîyo?

## Kurdanê Sûriyey ser o raporê

Gûrbêna heqê merdima, Human Rights Watch, raporêna xwi ya newe di behsê kurdê ki Sûriye di ze ki "bêdewlet"ê kerd. Rapor di ameyo nuşteni ki heqê nê kurda yenê înkarkerdeni, nê nêşenê erd bigîrê, şirket akerê û mîsalen bibê doktor. Kişa bîn ra nê kurdî nêşenê pasaport bigîrê û şirê teberê Sûriyey.

Human Rights Watch vêndana Amerîka û Yewbiyayena Ewrûpa ki bişê Sûriyey ser o tesîr bikerê ki halê nê kurdan bivirno.

## Kurdistanê Vakurî di feqîrey

Temamê Tirkîyey û Kurdistanê Vakurî di nezdiyê 20 milyon merdimî ze ki feqîr yenê hesabkerdeni estê. Bi ne ya Tirkîye bi Brezîlya, Îran û Panamaya eynî kategorî do.

Nê çî lêkolîna ki kişa Weqfa Etûdê Sosyal û Ekonomîk ê Tirkîyey (TÜSES) qandê raporêna Neteweyê Yewbiyayî ki nameyê ci "Human Development Report 1996" o, ameya viraşteni di yenê vaten.

Goreyê malûmatañ TÜSES'i feqîreya vêşî "Güney ve Doğu Anadolu" di, yanê Kurdistanê Vakurî di esta. Ameyo tespîkerdeni ki % 30'ê feqîreya Tirkîyey, (goreyê sînoranê dewleti) Kurdistanî da.

# Raşnuştena zazakî ser o Stockholm di kombiyayenê

Menga tebaxi (agustosi) di, Stockholm di, zazakî (kirmancık, dimilkî, kirdkî) ser o kombiyayenê virazyê. Kombiyayeni hîrê rojî (2-3-4ê tebaxi) ramit. Komeleya Nuştoxanê Kurdan-Swêd di (Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê) na kombiyayeni amade kerdbî. Goreyê dokumenta na kombiyayeni, nê pancês kesî kombiyayeni di amede biyê:

Sait Aydoğmuş (Pîran), Osman Aytar (Sêwregi), Mûnzûr Çem (Dêrsim), Memo Darrêz (Bongilan), Haydar Diljen (Sêwregi), Nîhat Elî (Sêwregi), J. Espar (Pîran), Cemil Gündoğan (Dêrsim), Lerzan Jandîl (Gimgim), Çeko Kocadağ (Gimgim), M. Malmisanij (Pîran), Selîm Mûrat (Palu), Kamer Söylemez (Dêrsim), Kazım Temürlenk (Dêrsim), Harun Turgut (Palu) Nê kesan na kombiyayeni di raşnuştena zazakî ser o meylê xwi tesbît kerdî. Na kombiyayeni di meselanê cêrînan ser o yew bi yew munaqeşey bîy. Goreyê dokumenta kombiyayeni, neticeyê cêrîn ki ze meyl tesbît bîyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan ifade kenê. Nê, ze tewsiye û teklîfi yê. Keso ki biwazo şeno zey nê meylan binusno. Goreyê dokumenta kombiyayeni, neticeyê kombiyayeni bi awayêno giştî ya nê yê (\*):

## Herfî

Herfî elfaba ewroyin a kurdkî nê 31 herfî yê:  
A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U  
Û V W X Y Z  
a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Tanî nuştoxî nuşteyanê xwi de herfanê zey "Ü" û "Ğ" nusenê yan zî herinda herfa eyn a erebkî de işaretê apostrofî (') ronanê. Madem ki elfaba kurdkî de çinî yê, ganî nê herfî û işaretî nêre nuştene.

## -an

Tanî cayan di, herinda "-an"î di "-ûn", "-on", "-û" yan zî "-o" vajiyêno. Herinda "-am"î di zi tanî cayan di "-ûm" yan zî "-om" vajiyêno. Labelê nuştene di ganî ebe formanê "-an" û "am"î binusyo. Meylê kombiyayeni: mangan, dewan, banan, zanayan

## -am

Meylê kombiyayeni: cam, dame, lamba, name, tam, temam, zama

## Tarîxî

Meylê kombiyayeni: 25ê aşma nîsani/25ê aşma nîsani,

1ê gulani, 17ê temmuzi

## Kilmnuştene (abréviation)

Meylê kombiyayeni: Kesê welatperwerî lejê YNK'î û PDK'î nîwazenê.

## NAME

- Nameyê rojan ebi herfa werdî (qice) dest pêkenê û wina nusiyênen: Şeme, yewşeme, dişeme, sêşeme, çarşeme, panşeme, îne
- Nameyê mewsîman wina nusiyênen: Wisar, hamnan, payîz, zimistan
- Nameyê qitayan ebi herfa girda dest pakenê û wina nusiyênen: Asya, Ewropa, Amerîka, Afrîka, Awîstralya, Antarktîka
- Ze prensîp, nameyê şaristananê Kurdistanî, zey vatişê şarê aw (ay) şaristanî nusiyênen.
- Nameyê ziwanan û lehçeyan ebi herfa werdî dest pakenê.
- Nameyê dînan û mezheban ebi herfa werdî dest pakenê.
- Nameyê mensûbanê milletan ebi herfa werdî dest pakenê. Sifet û zerfê ke nameyanê milletan û dewletan ra viraziyênen zî ebi herfa werdî dest pêkenê.
- Nameyê kesan ê mensûbanê şaristanan, mensûbanê dewletan û milletan ebi herfa werdî dest pakenê. Sifet û zerfê ke nameyanê şaristanan ra viraziyênen zî ebi herfa werdî dest pêkenê.
- Nameyê kesan ê xerîban ki orîjinalê xwi ebi elfabeya latînî nusiyênen -ma vajî nameyê ewropayîan û amerîkayîan-, zey orîjinalê nê nameyan nusiyênen, teleffuzê yînî parantezan miyan di nusiyênen.
- Nameyê kesan ê orisan, ereban, farisan... ki orîjinalê xwi ebi elfabeya krîlkî, erebkî/fariskî... nusiyênen, zey teleffuzê nê nameyan nusiyênen.
- Nameyê kesan ê misilmanan û şarê Rojhelatê Miyanînî (Ortadoğu) zey teleffuzbiyayena nê naman nusiyênen.
- Eger imkanê nuştene orîjinalê naman ê xerîban -hetê herfan ra- çinê bo, aw wext herfê nizdîyê nê herfanê xerîban tercîh benê.
- Her herfa verîn a her çekuyê kitaban yan zî nuşteyan (yaziyan) gird nusiyêna, labelê nê nameyan di herfa verîn a edatan û konjunksîyonan (conjunction, bağlaç) gird binusyo zî beno, werdî binusyo zî beno.

## FİL

Goreyê dokumenta kombiyayeni zazakî di yew fîl

esto ki temam niyo, zek erebkî di vajiyêno "fîlo naqis" o, yanî "fîlo nêmçet" o, tena demeyê nikayini (présent) di anciyêno. Nameyan, zemîran yan zî sifetan dim a yeno, menayêda newe dano yînî. Muqabilê nê fîlî frenskî di "être", îngilizkî di "to be" yo. Ganî nuştox xwi vîrî nêko ki fîlo corîn zemîran, sifetan û nameyan ra ciya nusiyêno.

Nimûne:

ez a, ti yî, ti ya, o yo, a ya, ma yê, şima yê, ê yê

**Menfiyê (negation) nê fîlî**  
ez nîya, ez nêbîya, ez nêbîbîya  
ti nîyi, ti nêbî, ti nêbîbî  
ti nîya, ti nêbîya, ti nêbîbîya  
o nîyo, o nêbî, o nêbîbî  
a nîya, a nêbî, a nêbîbî  
ma nîyê, ma nêbîyê, ma nêbîbîyê  
şima nîyê, şima nêbîyê, şima nêbîbîyê  
ê nîyê, ê nêbîyê, ê nêbîbîyê.

Goreyê netîcayanê kombiyayeni herçiqas ki no fîlo corîn fîlî "bîyeni/bîyayeni" maneno zî no "bîyeni"/"bîyayeni" niyo, yewna fîl o. Muqabilê fîlî "bîyeni"/"bîyayeni" frenskî di "devenir", îngilizkî di "to become" o û wina anciyêno:

bîyeni/bîyayeni/bîyayış  
ez bena/ez beno, ti benî/ti bena, o/yû beno, a/ya bena,  
ma benê, şima benê, ê/yê benê

## FÎLO PIYABESTE

Fîlo piyabeste (verbe composé, bileşik fiil) çend tewirî yo. Meylê kombiyayeni wina yo:

### Prefîkso yewheceyin + fîl

Gege yew prefîks (önek) û yew fîl piya yewna fîlî newî virazenê. Yanî prefîks + fîl = fîlo piyabeste. Çend prefîksê yewheceyinî: a-, ci-, de-, ra-, ro-, we-, pa-, pê-, po-, tê-, to-. Prefîkso yewheceyin û fîl, mesder (infinitif) de piya nusiyênenê.

### Prefîkso zafheceyin + fîl

Eke prefîks (önek) zafheceyin, yanî yew hece ra zafêr bo, prefîkso zafheceyin û fîl ciya nusiyênenê. Yanî prefîkso zaf heceyin ze yew çeku, fîl zî ze yew çeku nusiyênenê.

Çend prefîksê zafheceyinî:

bider-/bere-/bede-, cira-, tira-/dira-, pede-, pêra-, pêro-, pira-, piro-/pero-, tede-/tedi-, têra-, têro-, tiro-.

Her di tewiran de zî prefîks û fîl ciya nusiyênenê.

### Name/sifet + fîl

Gege name û yew fîl yan zî sifet û yew fîl fîlîdê newî (fîlî piyabestî) virazenê. Nê tewir fîlan di name û fîl zî sifet û fîl zî ciya nusiyênenê.

## Fîl + fîl

Nimûne: Amayîni kerdeni, amayîni vateni

### Fîlan de menfiyey (negation)

Fîlî ebe "nê-", "ni-" û "me-" menfi benê. Fîl û "nê-", "ni-", "me-" piya nusiyênenê.

Nimûne:

nê:- nêweno, nêzano

ni:- nişno/nişkeno/nêeşkeno, nizono

me:- meberi, meki

## EDATÎ (PREPOZİSYON Û POSTPOZİSYONÎ)

Edatî hîrê tewirî yê û çekuyanê bînan ra ciya nusiyênenê.

### 1-Prepozisyonî

be ... /ve ...

bi ... /ebi ... /ebe ... /eve ...

bê ...

pey ...

ver bi ...

### 2-Postpozisyonî

... de/...di/...der/...dir

.... ra/... a/... ya

... ro

.. ya

### 3-Prepozisyonî û postpozisyonî piya

a ... ra

beynatey ... di/beyntarê ... di

bi ... a/bi ... ya

bi ... bê/ebi ... bê

ede ... de/di ... de)

pey ... ra

ve ... ra/bi ... ra

## HÛMARÎ

Hûmaranê "yew" ra heta "des"î (1-10) ser o meylê kombiyayeni wina yo: yew, di, hîrê, çar, panc, şes, hewt, heşt, new, des.

Hûmaranê "yewendes"/"des û jû" ra heta vîstî (1-20) ser o di meylî bîy.

Meylê yewin wina bi: yewendes, diwêş/duyes, hîrêş, çarêş, pancêş, şiyêş, hewtêş, heştêş, newêş, vîst.

Meylê diyinî gore, na merheledi merdim şîno ebi nê her di formanê cêrînan binuso:

a) yewendes, diwêş/duyes, hîrêş, çarêş, pancêş, şiyêş, hewtêş, heştêş, newêş, vîst.

b) des û jû/des û jew, des û didi, des û hîrê, des û çar, des û panc, des û şes, des û hewt, des û heşt, des û new, vîst.

(\*) Ma tayn nimûney û izahatî cira vetî û netîcay bi kilmeya day.

## Ahmey Temî û doktor

**B**i çinêbi, merdimê bi, nomê yî Ahmey Temî bi. Ahmey Temî nêweş kono. Lacê yî Sal şino aqilmendê Xosorî, Mehê Pîrî ra qala nêweşîya bayê xu keno. Aqilmendê Xosorî, Mehê Pîrî, Salî ra îna vono: "Bayê xu biki her aspar û beri Licê, doktorî het." Sal xevera Mehê Pîrî keno û bayê xu keno her aspar û beno Licê, yî beno doktorî het. Wexto ki lacê yî yî beno doktorî het, Ahmey Temî destonê xu nono serê çimonê xu ser û xu serê erdi di keno derg û bermano. Doktor pers keno, Salî ra vono:

- Nêweşîya bayê to...?

Sal vono:

-Zerê bayê min dejeni.

Ahmey Temî xu serê erdi di keno derg. Doktor lacê yî ra pers keno û vono:

-Enî ci werdo?  
- Bayê min nono germin werdo.  
Doktor vono :  
-Teniya nono germin werdo?  
Sal vono:  
-Wille, teniya nono germin werdo.  
Feqet zef werdo.  
Doktor qerwaşa xu ra vono:  
-Şo dermonê çimo bîyarî.  
Ahmey Temî qêreno û vono:  
-Oy doktor! Şima bi min yarı kenê.  
Zerê min dejeno, zerê min dejeno.  
Doktor bi hêrs vono:  
-Ti destonê xu nonê çimonê xu ser;  
qey çimê to dejenê û ti hol nêvînenê.  
Semê ki roşinê çimonê to zêde biwo.

Arêkerdox: Marûf Yılmaz

## Luyi nêbena embaz

**B**ibi çinêbi pîrêka ocaxkori bivî, Ya'û şo tewer(teber) û xu rê bigêro ewladêki. Ya koti rayi ser, tê(tay, binêk) şîyi rastê heşêki amî. Heşî ya pers kerd û va:  
-Ti'û şêrê ça, pîrê?  
Pîri va:  
-Ez'û şêrê tewer, semê ki xu rê ewladê vinî û biyarî kîye.  
Heşî pîri ra pers kerd û va:  
-Ma ti nêwezena min bikê ewladê xu? Pîri tay venete û va:  
-E, ser û çimonê min sera, teniya ki ti qevul bikê.  
Heşê min û to zê(zey) gê(ga) ora û pencê xu dê verê bino ro.

Pîra min û to ti ra tersay û ra va:  
-Nê, ez to nêwezena û îna zî raye xu di şiyî.  
Tay şiyî rastê vergêki zî amî.  
Vergî ya ra pers kerd û va:  
-Ti'û şêrê ça, pîrê?  
Pîri va:

-Ez şina tewer di gêrena ewladêki.  
-Ez wazena biwî ewladê to. Ma ti eşkena min xu rê qevul bikê, pîrê?  
-Ez eşkena to qevul bikî. Çirî nêşkena?  
Teniya ki ti min qevul bikê.  
Vergê min û to zi zê heşî ora(zira). Pîri

yî ra zî tersay û va:  
-Nê, ez to nêwezena.  
Pîri tersê û koti raye ser. Tê şiyî rastê luyêki zi amî.  
Luyi pîri ra pers kerd û va:  
-Tî'û şêrê ça, pîrê? Pîri va:  
-Ez'û şêrê tewer semê ki xu rê ewladêki vinî.  
Luyi pîri ra va:  
-Ma ti bawer kena ki ez to rê bina, pîrê?  
Pîri va:  
-Ez bawer kena, ser û çimonê min ser a, ki ti min biwezê.  
Luya min û to destê xu dê werê bino ro, semê ki pîri ya qevul kerd.  
Rojo ewili luyi hema bizê ya werdê, rojo diyîne hema kergê ya werdê, rojo hîrine tatur û qormê ya werd.  
Şon di pîra min û to amî kîye û va:  
-Erê ho ça dewarê min, ho ça tatur û qormê min?  
Luyi va:

Postê ho serê boni di sere ho axor di vêre ho koxê kergon di.  
Seyi(senê) ki luyi îna va pîra min û to gina erd ro û bêhîş kotî.

Arêkerdox: Marûf Yılmaz

## Xelata Aştî ya Nobelî şî Timorê Rojheletî

**E**mser Xelata Aştî ya Nobelî deya merdimê ki civerê kişa Endonezya ra işgalkerdena Timorê Rojhelatî vijênê.

Komîteyê Nobelî yê Norwecî, 11'ê menga 10'in di îlankerd ki qandê xebata înan a bi raya aştiyane helkerdena persa, xelat deyaya Jose Ramos Horta û keşe Carlos Beloy.

Horta serekê mixalefet o û Awûstralya di maneno; Belo serekê kiliseyê katolikê Timorê Rojhelatî yo û welatê xwi di maneno.

Timorê Rojhelatî heta sera 1975'in girêdayê Portekizî bi. Hefteyê serbixwi mend û dima kişa Endonezya ra ame işgalkerden.

Endonezyay dayena xelatê protesto kerd.

## Medyaya kurdî ser o semînerê

**R**oja 5'ê menga 10'in di Stockholm di Medborgarplatseni di kişa Komeleya Nuştozanê Kurda ya bi nameyê "Çend persê teorîk ê tarîxê rojnamegerî û edebiyatê kurdî" semînerê ame viraşteni.

Semîner, kişa Emîr Hesenpûrî ra ame dayeni. Hesenpûr ehemiyetê teorî ser o vinderd û bi mîsalana behsê tayn persanê rojnamegerî û edebiyatê kurdî kerd.

Emîr Hesenpûr nika Kanada di Unîwersîtyê Toronto di kar keno.

## سالیک حکومه‌تی خودموختار له کوردستان

ناسراو به کۆماری مه‌هاباد ۱۹۴۷-۱۹۴۶

۴- فەرمانپه‌وايى سولتان سەلاھ‌دەينى ئېيوبى بەسەر جىهانى ئىسلام دا نەبرەكەنلى ناوبر او دىزى خاچ پەرستانى مەسيحي.  
۵- شەپو شۇپە خویناھىكەنلى نىوان ئىمپراتوريتى عوسمانى و ئىران له خاکى كوردىستان و داباش بۇونى كوردىستان له نىوان ئە دۇو هىزىدا.

۶- سەرھەلدنى خەباتى بىزگارى خوارى كوردىكان دىزى داگىر كەرانى عوسمانى و ئىران تا كوتايى سەدەتى نۆزدە.

۷- پىك هاتنى تاقم و پىتكخراوه سىاسييەكان له كوردىستان له كوتايى سەدەتى نۆزدە و پېيەندى نىوان كوردىكان، ئەرمەنەيەكان و ئاسورىيەكان.

۸- دامەزدانى پىتكخراوى ناسىيونالىستى تۈركە لاوەكان و كاربپيان نەخشى ئە و پىتكخراوه له سەر كوت كەنلى كەمايەتى ئائىنى و نەتەوھىيەكان(بەتابىپەت گەلانى كورد و ئەرمەن).

۹- هاتنه سەر حوكىمى دوو دىكتاتورى دىزى كورد له ئىران و تۈركىيا(پەذاخان و ئەتاتورك) دواى شەپى يەكمى جىهانى.

۱۰- بۇداوىي گەنگى مىژووېتى حکومه‌تى خودموختارى كوردىستان له مەهاباد و چۈنۈتى پىكھاتنى.

۱۱- لەقاودانى ھەندى بۇختانى نارهوا دىزى كۆمارى كوردىستان، وەك: گىرى دراوى بە بىنگانه و جىاخوازى، بەپالپشتى ئە و بەلگەنامانى ئارشىفي و وزارتى دەرھەوھ بالۋىزخانەكانى ئە و وۇلاتانەي كە سالانىكى زۇر بلېندى گۈئ ئە و تۆمەت و بۇختانان بۇون.

لە كۆتاپى كىتىپەكەدا سى باسى گىرينگ وەك پاشکۇ ھاتووه:

۱- لىكۆلىنەوەيەكى كورت سەبارەت بە بىرۇباوەر و فەلسەفە ئەھلى حق يان "علي الھى"

۲- ژيان نامەي دۇوناودار و پىتەرى نەتەوھى گەلى كورد"قازى مەحەمد و مىستەفا بارزانى"

۳- كىرۇنلۇقى مىژووېتى كورد.

شايانى باسە ئەم كىتىپ بق ئە و لىكۆلە رانەش كە بەزمانى ئىنگليزى شارەزان، دەتوانى بەكەلک بى. لەبەر ئەوھى تەواوى ئە و بەلگەنامە و دەكۆمەنتانەي كەكەللى لى وەرگىراوه. هەر بە زمانە لە كىتىپەكەدا ھاتووه.

بۇ وەدەست ھىنانى ئەم كىتىپ، دەتوانى بە نىشانى خوارەوھ پېيەندى بىكەن:

c/o Dr. G. Moradi. Postfach 10 41 44. 6903 1 Heidelberg,  
Germany, Tel/Fax 06221/ 24006

سالىك حکومه‌تى خودموختار له كوردىستان، ناوى كىتىپى ۴۰۰ لەپەرييە كە بە زمانى ئالمانى لەلاین بەپىز د. گولمراد مورادى يەوه نۇسراوه. ئەم كىتىپ گەلەنە كەنامە و دەكۆمەنتى تىدايە كە له و كتىپ و نۇسراوانەي وا لەماوهى ۴۵ سالى پابردودا له چاپ دراون، زۇر بەدەگەمن ئىشارەتىيان پىكراوه. گەرجى ناوى كىتىپەكە، تەنیا بەناوى بۇداۋىنىكى مىژووېتى سىياسى كوردىستانى ئىران له كوتايى شەپى جىهانى دووهم و سەرەتاي شەپى سارددەوھ ناودىز كراوه، بەلکو بەلام ناوهزەكەي تەنیا بەم بۇداۋە خۇى نە بەستەتەوھ، بەلکو ھەول دراوه لىكۆلىنەوەيەكى كورت و بەكەلک لەسەر جولانەوھ خویناھىكەنلى گەلى كورد له ھەزارەي رابردوو بق خوینەران بىدەستەوھ. لەراستى دا دەببۇ ناوى "چاوخشانىكى كورت بەسەر مىژووېتى جولانەوەكەنلى گەلى كورد له ھېرلىشى عەرەبەكان بەئىران تا حکومەنەتى خودموختارى كوردىستان" لەسەر دانابا. بەلام لەبەرئە وەي سەردەپى باس كراو ناوى دكتوراکە نووسەر بۇوه، هەر بۇيە كىتىپەكەش بەم ناوه چاپ و بلازو كراوهتەوھ.

### بەركوتىك لە ناوهزەكە كىتىپەكە

لە پىشەكى و پىش بارى كىتىپەكەدا، ئەم خالانە خراونەتە بەر باس: بېچى ناوى كىتىپەكە "سالىك حکومه‌تى خودموختار له كوردىستان" بارو دۇخى جوغرافىيە و سەرجەمە حەشيمەتى سەرسال لەمەوبىرى ھەرچوار پارچەكە كوردىستان.

مىژووېتى پەيدابۇنى ناوى "كوردىستان" و باسېك لە بارەيەوھ. لە بەشى مىژووېتى كىتىپەكەدا نووسەر بەپال پشتى نۇسراوهى مىژوونناسان و زاناييانى، عىلمى مىژوو، ئىشارە بە پىشەو رەچەلەكى كوردىكان دەكاو پاشان ئەم باسانە خوارەوھ شى دەكاتەوھ: ۱- مىژووېتى جولانەوە كۆمەلەتى سىياسى يەكانى نەتەوھى كورد لەسەرەتاي دەسەلاتى عەرەبەكان و ئىسلام بەسەر بقزەلەتى ناوهزەست دا.

۲- پىك هاتن و دامەزدانى مېرنىشىنە ناوجەيەكانى كورد. ۳- دەسەلاتى تۈركە سەلچوقىيەكان بەسەر ئىمپراتوريتى ئىران دا.

# تارای گیان

نیشتعان نه هالمه‌ی چمه،  
نه لوته‌ی یهای به‌غینه،  
نه یابنی قو نیپنه،  
نه درخت و چم و دشته،  
نه پادگانی دیپنه.

نیشتعان نه شامی نوستودی  
کوشی دشته،

نه دینی به‌مذکنی چیاوه،  
نه هزم و دوست و ناسیاوه،  
نه داینه و خوشل و براوه.  
نیشتعان نامی ئینسانه،  
دومونه، دوانه‌ی ویژدانه.

هه‌یه باخی حلی به‌مین،  
هه‌یه ناووه‌ی  
نیندانه،  
هه‌یه تیانی ئاووه‌دانه.

نیشتعان خودی صراغه،  
هه‌سته، نه‌سته، دله، تیانه.  
نیشتعان کوچیه‌ی ساوایه،  
حلی کردوین به جوزانه،

مه‌لیتی بیرونه کاسه‌ی سه‌می کردوبین به  
هیزانه.

نیشتعان ده‌لی ۲ اوچوه،  
له بازای روحان عان ئاچوه،  
نیشتعان پارپته شیوین،  
تام سه‌مای بن،  
به‌پیلووی چاو،  
به تامای تیان  
دای دیوشین.

جهمه سه‌عید جه‌سنهن

1996.09.03

کاترینه‌هولم

مندانان تومار کردوه. هر وک پیش بزانم  
ئه ده بیاتی زاروکی کوردی له بواره گرنگه  
دهست به تاله، ئوه باسی فیلمی سینه مایی  
هر مهکنهن، به لام هونه رمه ندیتکی داهینه ری  
شانقی مندالی کورد لدهره وهی  
وولات-فاریل جاف- له گهله برهه ره کانی  
له لایهن پولیسه حیزبیه چا و چنزوکه را پورت  
نو سه نه خوشکانه وه، له ئواهه دیدا چهندان  
شاکاری شانقی پر به سودو به پیزی  
پیشکه ش به زاروکان کردوه.  
سه رنج: ئه هو هه ولدانی من ته نیا به رکولی  
پیر قذه یه کی داهاتوی زیانه و بخوی ته نیا  
هه ولدانیتکی سه ره تاییه، بهو هیوایه  
له مهودوا بکارم وک تو زینه وهیک خه ریکی  
بیم ..

بهلئى هەلدانووهى لاپەرەكانى ئەدەبیاتى ساواى مندالانى كورد، زور كەله بەرى كەورە پىتوھ ديارە، بە تاييەت لە نەبۇنى كۆفارىيەكى پىك و پىك بق مندالان ج لە دەرەوە و ج لە ناوه ووهى كوردىستان - ئەگەر ھەولى دلسوززانە چەند پۇلە يەكى بە وەفای بەزمارە كەمى لىنەرچى كە بق نەمونە چەندان زمارەيان لە كۆفارى كۆچەر لە دەرەوە كوردىستان چاپكردۇه، ياخود ئەو كورپە بەجه رەكانى لە كوردىستانى خوارو بەبى پشتىوانى هيچ دامودەزگا يەكى كوردى، درېزە بە دەركىرنى كۆفارى (پەرمەسىلىكە) دەدەن - لە چاۋ ئەو ھەمو بۇزىنامە و كۆفارەي بق كەوران دەردەجى لە ئارادا نىيە. هەروەها لە مەيدانى دروستكىرنى فيلمى كارتۆنلى بق زارۇكان-مەگەر ھەلە تاك و تەراكانى بارزان شاسوارى لى دەرچى لە ووللاتى سۈىت چەند كارىيەكى بە كوردى بق

ژماره‌ی دووه‌می گوفاری نه‌ستیره، زماره‌ی سییه‌میان له چاپخانه خنکاندو لینه‌گه‌پان پوناکی زیاتر ببینی.  
چونکه به‌راستی گوفاره‌که به‌شیوه‌ی که بیوه قیله‌نیگای مندالان که به ته‌نیا زماره‌ی یه‌که‌م و دووه‌می چهند جاریک چاپکرانه‌وه، که‌چی هر به‌هه‌موخه‌لک نه‌که‌وت. به‌لام نه‌و نوسه‌روهونه‌رمه‌ندانه‌ی له بواری نئدبه‌بیاتی زاروکان هاتبونه دهست، له چالاکی خویان نه‌که‌وت، بگره له سالانی ۱۹۷۵-۱۹۸۰ دا دهیان کومه‌له چیزه‌ک بق مندالان، له سه‌ران سه‌ری ناوچه‌کانی کورستان بلاوبونه‌وه، لیره‌دا نابی خامه‌ی په‌نگینی هونه‌رمه‌ندانی وهک عه‌لی مه‌نده‌لاوی و لاله عه‌بده و قه‌رهنی جه‌میل و دارا مه‌مه‌دعه‌لی و کاکه‌عه‌به و دهیانی دیکه له بیر بکرین که هه‌تاکو نئستاکه‌ش دریزه به خزمه‌تی خویان دهدن.

بائیگہ وائزیک

من ماوهیکه تیکستی بلاوکراوه و نهکراوهی چیرزکی فولکلوری کوردهواری تایبەت به زارۆکان. له پینگای گۆفاری (بەریانگ) وە خوینەران، خەمخوارانی نەدھى فولکلوری کوردى و دلسوزانى جگەرگەشانى نەتەوەکەمان بانگ دەکەم بق يارمەتى دام و زەنگين کەردنى پېزىزە(له)هوارى چیرزکی فولکلوری کوردهوارى بق زارۆکان)، تاکو ئىئمە کورديش لەم بواهە گرنگەي نەدھىپات بق زارۆکان، نەزمۇنى کورد پىشكەش بەخونچە پېشكەتكان بکەين، بەتاييەت ئەگەر نەو نەزمۇنى لە ئەزمۇنى کۆکراوه و چاپکراوى نەتەوەكانى تر دەولەمندتر نەبىت، ئەو ديارە لەوان كەمتر نىيە، بەلام بەھلى پشت گۈچ خستن و كۆكىنەوهى ئەو سامانە بە شىۋەھەكى پىك و بەرچاڭ، كە تاکو ئىستاكەش ئەگەر سەيرى كەتىپخانەكانى وولاتەوروبىيەكان بکەين(بەشى مەندالان) تەنبا ئەزمۇنى چىرزکىي فولکلورى كەرىي، بە، حا، ناڭكەمىز،

من تاکو نیستا زم خیره یا کی باشم لهم بوارهدا لهزوریه پارچه کانی کوردستان کوزکردتنه، به لام دیسانه و هر کمه له زنگدا. ئەوجا بق نئوهی پرۆزه کە، جى پەنجەی کزمەکى هەمو دلسوزانى پىته ديار بىت، هىوانارم هەر لە رىنگای ئەم ئەدرييسيه خواره و دا، هەر تىكىستىكى نوسراو توماركراوتنان لا دەست دەکەوى بقمانى رەوان بىکەن، تەنبا لەسەرى بىتوسون (لەخەرمانى چىرقىكى فۇلڭىرى كوردهوارى بق مەنلاان) ...

کاکہ بس حسین  
Kakabas Hussain  
Brages V.5 Van 4  
145 69 NORSBORG

ئەدەبی مەندازانی کورد

زور گو و مرؤفی سه رفرازی کورد، له  
هه مهو زهمان و زه مینیکدا مندال و خواستی  
ئه ده بی زارؤ کانیان له بیر بووه، به تایبەت  
کەم شاعیری ناسراوی کورد هه یه هۆنراوەی  
بێ مندالان نه هۆنیبیتەوە. بەلام دیسانەوە  
ئه وەش هە تاکو هە نوکە هەر بە کونە کراوە ھی  
و لە بیر کراوی ما وەتەوە تا پاده یکی زور  
شاوا وەن.

دهرچونی گوشه‌رگی جوانه‌مه‌رگی  
گروگال‌ای مندانان له پرژه‌کانی کوماری  
خودمختاری له سالی ۱۹۶۱دا، خوی له  
خویدا نیشانه‌یه کی هینجگار گهشی باوهشی  
یه کیتک له سره روره بیه هه ره دلخوشکه‌هکانی  
نه ته وه ژیر دهسته که مانه. ئه و گوفاره ما یه‌ی  
ئه ده‌بی نوسراوه‌ی مندانانی کورده، که دیاره  
له سره دهسته، حه‌ند سره بیانکه، نه ناسراوه‌ی

ئه‌وئى پۇرىزى بۇون- به تايىبەت مەتلەل و شىعىرو كورتە چىرۇك. ناو ناوهش لە شارەكانى كوردىستانى خواروودا سىپارەو نامىلىكە چاپكراو بق مەنداان بە چاپ گىيىشتو، كەبېشى هەرە زۆرى ئە بىرەمانە لە زمانى عەرەبى وەرگۈرداراون.

لە رۇزگارى دواى سالى ۱۹۵۸ دا، نوسىن بەكوردى ئازادى زىاترى بەخۇوه دىتىو و فراوانتر لەلایەن رۇشنىبىرانە و بۇ لە نوسىن و ئەدەبیات كراوه و ئەدەبیاتى مەنداانىش بەرچاوتر هاتقۇتە پىشىو. لەم بوارەدا چەندان نوسەرى تايىبەت بە مەنداان پەيدابون كە دىيارەكانىيان ع. ع شەونم، عمر عبدالرحيم، فەرھيدون عەلى ئەمین و چەندانى تر وەك يەكەم كاروانى ئەدەبى مەنداان و دواترىش نوسەرانى وەك جەزا على ئەمین، دايىكى سقلاف، لەتىف ھەلمەت، كاكى فەلاح، عباس محمد حسین(نوسەرى ئەم وئارە) لەكەل سكفنان عبدالحكيم، رۇستەم باجەلان و دەيان نوسەرى دىكە بەرەمى بازاوهيان پىتشىكەش بە مەنداان كردۇ.

ھەروەها سەمكۇ ناكام -ى دراما نوس بق مەنداان و عەزىزى مەلاپەش-ى رقمان نوسى مەنداان جىڭكاي خۇيان دىيارە.

لە پال ئوانەشەو بەرنامة بە پىزەكانى رەزا شوان لەسەر كەنالى تەلەفزىيونى كەركوك بە كوردى، بە راستى جەماوەرينى فراوانى زارقۇكى بەجۇش خىستبۇ.

دەرچونى يەكەم گۇفارى پەسىمى بق مەنداانى كورد بە زمانى كوردى(ئەستىرە) لە سالى ۱۹۷۵ دا، لە لايەن دەزگاي رۇشنىبىرى كوردى سەر بە وەزارەتى راگەيىاندىي عىراقى، بە سەرىپەرشتى دكتور ئىحسان فۇئاد، بە چەلەپۇيە كەشكەرنى ئەدەبیاتى نوسراوهى زارقۇكى بۇوە. بەلام بىنگومان ئەوهندەي ئەدەبیاتى مەنداان و رۇزىنامەگەرى مەنداان بە زمانى كوردى ناوكى دۇزمەنە سەرسەختەكانى كوردى خستىو، ھىچ دىاردەيەكى دىكەي رۇشنىبىرى كوردى ھەترەشى نېبردون، ھەززۇو دواى بلاۋو بونە وە نېبونە وەي دانرابون. ئىتىر لە جۇرە زەمان و زەمينەدا ئەدەبى نوسراوه بق زارقۇكان بلاۋوبەتە وە- بەلام دىيارە لە رووى ناوهەرەكە وە بەرەمى

كەم وېئىنە وەبەرەم ھېتزاواه.

ئۇجا لە كوردىستانى خواروشدا بەھقى ئەپىارو دۇخە جىياوازى بقى ھەلكەوتە، كەبە حق لانكى ھەزاندەنە وەي ئەدەبیاتى نۇنى كوردى بۇوە. لەكەل كەنە وەي قوتابخانە خويىندن بە زمانى كوردى لە بەشى ھەرە زۆرى ئە و بەشەي كوردىستان، بىگە لە سەرەدەمى پادشاھىيە وە هەتا ئەمروكەش، دەتوانرى وەك سەرچاواھى كى زەمينە خوشكەر بق ھاتنە مەيدانى ئەدەبى نوسراوهى مەنداان ئاپرى لىپەرىتە وە. بەجۇرىك بەدگەن نوسەرە ئەدەبى كوردە، كەم وزۇر لەم بوارەوە بەشدارى نە كەربى. ھەر لە ئامادە كردن و نوسىنى تىپ و نامىلىكە جۇراوجۇر بق مەنداان بە زمانى كوردى، -ج وەك كەتىبى فېركەرنى نوسىن و خويىندە وە و چ وەك بەرەمى ئەدەبى نوسراو بق زارقۇكان - هەتا دەگاتە بلاۋ كەنە وەي ئەدەبیاتى مەنداان لە رۇزىنامە و گۇفارە كوردىيەكان و بەرناھەي رادىقىي و لەم دوايىيەش تەلەفزىقۇنى بق زارقۇكان. بىنگومان سەرەتاي ئە و كاروانە لە ناوجەكانى سليمانىيەوە، لەسەر دەستى چەند كەلەمەرقۇيىكى وەك نجم الدین مەلاو پېرەميردى شاعيرەرپا بۇوە، پاشان مامۇستايىكى وەك نورى بالدار كە هەتا ئىنسىتىكەش، ئەستىرەيەكى پىشىنگدارە بەسەر خەرمانى فېرىيون و نوسىنى كوردى بق مەنداان، وەك سېتىھەر بەسەر ئەدەبیاتى مەنداانى كورد دەرۋانى.

دېسانەوە نابىن دەورى ئە و مەلاو فەقى ولات پارىزانە لەبىر بکەين، كە ئەوانىش بە حق لە ئىتىر پەردى ئايىنە وە، كەم تا زۇر بقلى جوايتىرانەيان ھەبۇھەم لە كۆكىردىنە وە فۇلكلۇرۇ ھەمېش زۇر وەخت حوجره و ژۇورەكانى خۇيان كەردىتە بقلى گىزىرانە وەي چىرۇك و سەرپىرە بق ئە و مەنداانى لەلائى مەلا لەبەر خويىندن دانرابون. ئىتىر لە جۇرە زەمان و زەمينەدا ئەدەبى نوسراوه بق زارقۇكان بلاۋوبەتە وە- بەلام دىيارە لە رووى ناوهەرەكە وە بەرەمى

بارتهقای و هرگرتن و تیگهیشت و پیداویسته  
گیانی و مادیه کانی زیانی پیالیستی زاروک  
بن.

رهخنه گرو نوسه ری گهورهی رووسی  
بیلینسکی لهم بارهیوه گوتیوه تی: -دهشی  
ههمان ئه و ناوه روزکهی ئاراستهی گهوران  
دهکری، به زاروکانیش پیشکهش بکری، به لام  
تەنیا ئه و دهی دهی لەگەل ئاستی تیگهیشت و  
چونیه تی و هرگرتنی لەلایان مندالانه و لهبەر  
چاو بگیری و وەک دوم تای لاسەنگ  
نەکردنی بەرھەمەک بەقۇرتىتە وە.

ئهوجا سەبارەت بەمیزۇوی ئه و  
ئەدەبەشە وە، هەموو ئه و کەسانەی هەتاکو  
ھەنوكە لەسەریان نوسیو، تىكراپان لەسەر  
ئه و كۆك، كە حىكايەتى گۈنى ئاڭىدان،  
سەربەدە داپىرەو باپىرە بە سالاجوھەكان،  
پەندە ئامۇزگارىيە دەماودەمگىزدراوەكان،  
باس خواسى سەفەر دۇرۇدرېزەكان،  
كەلەپورى ئايىنى و مىلى، داستان  
وئەفسانەی كۆننە، هەر لە دىر زەمانە وە  
سەرچاوه کانیاوى ھەلقۇلاني ئه و میزۇوەن.  
حىكايەتەكانى بانگاتنtra بەرھەمى كە لە  
نیوان سالانى ۱۰۰۰-۵۰۰ اى پ.ز بە زمانى  
سانسکريتى كۆن بەناوچەكانى پەزھەلات  
پلاۋىنە تە وە، حىكايەتەكانى كليلە دىمنە،  
كۆمەلە چىرۇكە فابىلەكانى ئىزقۇي گرىكى و  
ھۇنراوه کانى لافۇنتىنى فەرنىسى، چىرۇكە  
ناوارەرەكە پۇينسۇن كرۇزقى ئىنگلىزى،  
چىرۇكى بەنەمالەي پۇينسۇنى سویسىرى،  
چىرۇكە كانى ئىغان كەيلقۇنى رووسى،  
چىرۇكە فۇلكلۇرەكانى برايانى گرىپى  
ئەلمانى، چىرۇكە نايابەكانى ئەندەرشۇنى  
دانىماركى، هەزارو يەك شەوهى عەرەبان،  
چىرۇك و بۇمانەكانى مارك توينى ئەمەرىكى  
چەندان و چەندانى دىكە نۇنە ئه و  
كاروانەن، وەک شاكارى ھەرەدىار بونەتە  
چەپكەننېرگىزى سەرەتاي تۆمار كەرنى  
میزۇوی ئەدەبیاتى زاروکان.

كەچى ئەمرۇكە ئه و ئەدەبەي مندالان  
بەھۇي مۇركى تايىبەتمەندىيە وە بە ئاشكرا لە  
ئەدەب و كەلتورى بەردەستى مەبەستى  
گەوران ترازاوه و زاراوهى ئەدەبى مندالانى  
بەبالادا ھەلتراوه.

بەلام لەرۇوی ھونەریبە وە هەر لە چوار  
چىتىھى ئەدەب خۇيدا بەسەر پىتىان كەوتو،  
لەسەر ھەمان كۆلەگەی ھونەری بەرپابو،  
بىرۇكەو كەسايەتى، فۇرمۇلەكىرىن و  
ھۇننە وە ھونەری ھەۋىنى ئەدەبى  
مندالانىشە، تەنیا دەبىن ھەر جۇرە بايەت  
ھەلبازارىنىك، پىتكەننانى كەسەكان، ئاقارى  
سازان و بەكارەتىنى شىۋاز، واژەو  
پەيەكانى زمانى ئه و ئەدەبە ھاوكۇفى  
ئاستى تواناوا تاقەت پىداشكانى سنورى  
نەشۇنمەكىرىنى مندال بىت.

ئەم جۇرە ئەدەبە سەربارى مۇركى سادەو  
ساڭارىيەكەي، دەبى ئاۋىنە يەكى  
پاستەقىنەي ھەست و نەستەكانى تەمەنی  
زیانى مندالى بىت، چونكە ئەوهى هەتاکو  
ئىستاكە لەبەرەدمە رەپۇتى ئەدەبىياتى مندالان  
ساغبۇھەتە وە، ئه و ئەدەبە دەبىن لە نوکو و بۇ  
زاروک و بېپىتى ئارەزۇر داخوارى و ھەل  
ومەرجەكانى ئاۋوچەرانى ئاستە جىاجىاكانى  
زاروکان لە دايىك بىت.

چونكە نوسىن بۆمندالان ھەروەك  
بەرپوکەش دىارە، ھەروا شتىكى سوک و  
سانانىيە، بەلكو لەسەرتاپاي میزۇوی  
ئەدەبدە، نوسىنى ئەدەبى بۇ مندالان بە  
يەكىكە لە ھونەرە ھەرە قورسەكان لەقەلەم  
درابە، كە گىرىنى ئەم قورسایيەش بەزەقى بۇ  
ئه و مۇركە تايىبەتمەندىيە دەگەرتىتە وە كە  
سادەترين ھونەری ئەدەبەو ھەمېشە  
سادەترين ھونەری ئەدەبى لای خوينەر،  
قورسەترين نوسىنىن لەلای نوسەرە ئەدەبەنە  
گرىپى دوھەميش ئه و نوسەرە ئەدەبەنە بۇ  
زاروکيان نوسىيە دەنۇسەن، چ وەك پېشەي  
نوسىن ياخود بە راڭىزاري، گەرەكىيان بىت و  
تەبىت، دەبىن پابەندى ئه و ھەل و مەرجانە  
بن، كە ئەوهى دەنۇسەن بەلانى كەم، لە  
بەرانبەر توخىمەك لە توپىزەكانى مندال

لەلایان دەسەلات دارانە وە لە قالب دراوه،  
وەك چقۇن فۇرمى كەلتورى مندالى توخمو  
تاقەم زەنگىنەكان لەگەل زاروکى  
بەلەنگازەكان لە يەك ناکاتە وە.

ھەرۋەھا لە بوارى پەيوەندى كەلتورى  
مندالان بە كەلتورى كۆمەلە وە، دەخوازىن  
بىزىن، مادەمەنیكى ئه و كولتورە وەك لقىكى  
ئه و دارە گەورەيە كەلتورى گەوران سەپىرى  
دەكىتىت، دەبىن وەك بەشىكى ئه و كەلتورە لە  
ئاكارو سوختە وە لە چوار چىنە گەشتىكە  
بىكەتە وە، بەلام نەوەك بە ماناپىيە كە كىتمەت  
وينەيەكى فۇتقۇقلىكى كراوو دوبارە بۇھە  
بىت، دەبى سەر داوهەكانى ئه و پەيوەندىيە  
خۇى لەم خالانەدا بىتىتە وە:  
- تراديشىق و سوختەكان، بەھاوا  
ئارەزۆھەكان، بۇ نۇمنە زۇر فۇرمى كەلتورى  
مندالان لەلای گەوران نىيە و ھەرۋەھا بە  
پىچەوانە وە.


- ۋوڭگە كۆمەل بەرانبەر بە زاروک و  
شىۋازەكانى گواستنە وە كەلتورى و  
چونىيەتى گەياندى بە مندالان.

- سرۇشت و سىستەمى كۆمەلە ئەتى و  
ئابورى كۆمەل سەبارەت بە چونىيەتى و  
چەندىيەتى دارشتى ئەندازى سىنورى  
كەلتورى و بادەي لە باوهەش گەرتى كەلتورى  
مندالان.

## ئەدەبى مندالان و كورتە مېزۇویەك

ئەدەبى مندالان وەك زاراوهەيەك بۇ ئەوه  
دەگەرتىتە وە، كە ئەم جۇرە ئەدەبە تايىبەتمەندە  
بە مندالو، بە لەبرچاۋەرگەرتى خواستەكانى  
مندالان و چونىيەتى تواناوا پادەي ملکەچى بۇ  
پىداگۆگ و شارەزاكانى ئه و بوارەدا وەك  
پىداگۆگ (بە تايىبەت لەسەر دەستى  
ليکراوهەتە وە) بە تايىبەت لەسەر دەستى  
پىداگۆگ و شارەزاكانى ئه و بوارەدا وەك  
سەرەتتا)

# سەرەتايەك لە گەل ئەدەبى مندالانا



کاکە باس

بە هەر يەكىن لە قۇناغانەوە. پۇنتىرىپىزىن، قۇناغى تەمەنى ساوايى منداڭ، قۇناغى پىشەوەي نەشۇنماكىرىنى نەمازە بە منداڭ، بەوەي كە خاوهنى سوخت و ئاكارو بەهاو پېوانەو شىۋازى جىهانى خۆيەتى، ھەر لە گەمەكىرىنەوە بىگە تادەگانە فۇرمەكانى گۈزارشت لە خۇكىرىن و تىتكىرىنى ئارەزەكەكانى مندالانى خۆى.

زارۇك جەماوەرىكى يەك پېزو گۈنجاو نىن، كەمرۇف بە يەك پېوانەي ھاوبىش سەريان بىكەت، چونكە ھەرگىز لە چىن و توخىمەكى دىيارى كۆمەل ناكەن، بەلكو بەپىتى جىاوازى مەداو ئاقارو پلەكانى نەشۇنماكىرىنىان لە يەكدى جىادەتتەوە.

ھەر بۇيەشە لە سەرچەمى رەسىمى ئەو لىكۆلىنەوە نوسىنائى لەم بارەوە تىقىرىكراون، ھەميشە لە چەندان ٻوانگەي چىا بە جىاواز سەرىرى كەلتۈرى مندالان كراوه، لەلايەك بابەتكانى ئەو كولتۇرە بەناو تىتكىرى زارۇكەكانى كۆمەلدا بىلۇكراونتەتەوە دەكىرىتەوە، بېبىنەيچى كۆنەنەنەك بە ئاقارى نىشىتمانى و نەتەوايەتى، ياخود ھەر جىاوازىيەكى ئەوتقى كۆمەلايەتى، دۆخى چىنایاتى كەس و كاريان، زمانى منداڭ و ھەندى شىۋازى گەمەكىرىن و شىۋەي دەربىن لەھەست و نەستى مندالان بە گىشتى. كەچى لەلايەكى دىكەوە ھەندى بابەتكى ترەن كە بەناو زارۇكاندا شۇرۇبۇنەتەوە دەبنەوە، گىشت منداڭانى كۆمەل تىدا بەشدار نىن، بەلكو ئەو بەرھەمانە دىسانەوە نەمازەن بە ھەندى توخىمى مەبەست دار. بۇ ئەوهش تايىبەت مەندى كەلتۈرى مندالان تا پادەيەكى زۇر

منداڭ و دىراسە كەندى لە ھەمۇو بوارىنەكەوە بە تايىبەت لە ھەوارى ئەدەبىياتى زارۇكاندا، بۇ دواي سەرەتەمى رىسانس لە ئەورۇپا دەگىرنەوە، واتە رۇزگارى سەدەي شازىدەمەنیان بە سەرەتاتى پېبازى لە باوهش گىتنى زانستىيەنەي منداڭ و ئەدەبىياتى مندالان تىمار كەرددووه.

دىيارە ئەو بایەخدان و بەتەنگەوە بونەي ئەدەبىياتى مندالان، بە پاشقاوى چەند سەدەيەك دەبىيت، نەوە بە نەوە لە ناو نەتەرە خاوهن شارستانىيەكان، وەك چەپكە گۆلى بۇنخۇش لە يەخەزى زارۇكان دراوه دەدرى. بەلام لە پال ئە پووه گەشەي ئەدەبى مندالان لەناو مىللەتە پېشکەوتەكەنانەوە، ھىشتا زۇر نەتەوەي دىنيا لەم جىزە ھەوارە پىزىغۇزازەي ئەدەبىياتى زارۇكان، نەوەك ھەر بەجى ماون و تەقەي سەرييان دىت، بىگە زۇرىشىلى بىن ئاڭان و لە پرخەزى خەۋى دواكەوتىدان، بەجۇرىك چەندان وولات و نەتەوەي دىكەش ھەن، ھەروا بەئاسانى لە باوهشى ئەم پېنناسە جىنگىيان نابىتتەوە.

بىنگومان دىراسە كەندى منداڭ، لە پېشى پېشەوە بەندە بە وردىبۇنەوە لە ژيانى منداڭ، تۆزۈنەوە لە سەرتاپاي كۆمەل و پىتىخراوه نمايندەكانى وەك، خىزان (دايىك و باوكى)، قوتاپخانە، مىدىيا-تەلەفيزىقىن و رۇزىنامە-كەلتۈرى منداڭ، دەرۈپەرو سەرسوشت، جۇرى گەمەو يارىيەكان..ھەن.

ئەوجا ئەوهى تا ھەنوكە لە بوارى دىراسە كەندى منداڭ ساغ بودتەوە، بىرىتىيە لە بایەخدان بە رېزبەندى قۇناغە يەك بەدواي يەكەكانى نەشۇنماكىرىنى زارۇك و دىيارىكىرىنى ئەو سوختەنانى كە تايىبەتەنەن دىشەكىرىن و بەر مەيدان بونى بایەخدان بە

پەيپەك ھەيە دەلى: - زارۇكە كانمان كوشىتى دەستى خۇمانى ! سەرچاۋى ئەم پەيپە بۇ ئەو دەگەپىتەوە كە خۇمان ؛ واتە گەورەكان بەپاستى و بەبىن لەچەككەنەي ھەر جۇرە پاساودانىك لە بەرەدم مامەلەكىرىن و ھەلسۆكەوتىكى بەر چاوتىرانە لە گەل منداڭانمان، تاباتىي دەستكىرەت و بىن فامىن و بىگە تا رادەيەكى زۇرىش دەستەوەستانىن . بەلكە ھەرە زەقىش بۇ ئەم رەھەندە تالا، ھەر پەنجه بۇ ئەو فەشەلە يەك لە دواي يەكانى بازىنەكانى خەباتى ئازادى و نىشىتمانى نەتاوە كەمان دەھىتىمەوە . ئىيمەيەك كە خۇمان بە مەزن و گەورە كۆمەل و نەتەوەكەمان دەزانىن ، لە كاتەتى كە لە ئائىتى خۇدى دۆزە جەوهەرىيەكانى ژيانى خۇمانەوە ھېچ جۇرە سەركەوتتىكمان بە دەستتەوە نەبىت ، دەبىن لە گەل منداڭانمان كە لەلاي خۇمانەوە تەنبا بە بچوک و بېتۇنانو ھېچ لەبارا نېبو سەرييان دەكەين ، تا چەند ھەنگاوهە كانمان بۇنى گولالە لىبىت و پەيپە كانمان لە بەرۇكى چەپكە گۆلى بۇنخۇشى بەھارى سەوزۇ تەپ وەرھاتىنى 1

پەۋەتىپەكان لە لاي خۇيانەوە، گەشەكىرىن و بەر مەيدان بونى بایەخدان بە



پاسته زیانی نافرہت سهخته به پیش نموده است که لاهیز رکانی که له سه رشانیه تی لاهیزاندا که دایکایتیه و برهه م هینانه به ها و کاری له گکل پیاوا. به لام لای من نه بوبه به خولگه کی ئیلهام و تابلوکانم تنهها باسی نافرہت و گیرو گرفته کانی ناکات. هر چهنده مافی نافرہت لای ئیمه پیشیل کراوهو، و خوش به ختانه ده لیم که ئیستا ههندی بهندو بناغه ههیه که گفراده و زیانی نافرہتی ئیمه ش لهناو کومه لدا نمود سرکه و تنانه به دهست ده هینیت که له و ولاتانی پیشکه و تودا نافرہتان ههیانه. به لام لای ئیمه له سه رخقو و ورده بقی ده روند و به لای منه و نه مه ش خراب نیه، تا کومه ل به هه مو پله کانیه و له م راستیانه تینده گکن. من له تابلوکانما زیاتر روونا کیم خستوته سار زیانی سه ختنی کورد به گشتی و نه و باره ناهه مواره هی به سه ر میله ته که ماندا هاتونو.

ههروها پیم خوش نیبه پهنجه راکیشم بق  
بئ هنیزی ئافرهت و هنیزی بئ هنیزیک که دژی  
ئافرهت ههیه که ئەمەش وەک باوه که  
پیباوه.چونکه ئافرهت بئ هنیز نیھو وەک  
پیاویک ئتوانیت زیانی خۆی پىك خات ج لە  
وولاتیکی پىشکە وتودا بژی يان بھ  
پىچەوانوھ. بەلام کاتى ئافرهت بئ هنیزیکى  
تیا بەدی دەکری ، چواردەورەکى و ئەنو  
سروشته تیایدا دەزی بەچاونیکى بئ  
بەزدیي و بق ھەلسو کھوتى لهگەلدا دەکەن.  
بەداخھوھ دەلتیم که ئەم دیاردىھ لە  
کۆمەلگای ئىئمه زیاتر ھەستى پى دەکری.  
ئتوانم بلىم لە تابلوکانمدا لاوازى بئ  
هنیزیک و هنیزی بئ هنیزیک دەرئەکەوئى،  
ئەمەش يەكتىكە لە بەندەكانى سروشىتى زیان  
بەسەر گشت كيانلەبەرىكدا پىچەوانە  
ئەپېتەوھ.

بهو هیوایم که له ئایندهدا  
بیتوانم پیشانگای باشت و  
گهورهتر بکەمەوه. هەرروها هەول  
ئەدەم خوتىندى لايەننېكى ترى  
ھونەرى كە بېشى (تصمىمىمى  
جل و بېرگ) تەواو بکەم،  
و بیتوانم پیشانگا لەم بارەيەوه  
بکەمەوه.

به لام ئەمەوئى بلىئىم كە لىرە  
ھەندى شتھەيە كە ھاندەر نىيە

بچہ کردنے والی  
تیشانگا  
ورہک  
نورسی  
بڑھ دست  
کھو توںی  
فولی  
تیشانگا و  
کاتینکی  
زوریشی

دهوی تا بیوت دهره خسینی.  
دبهی نه و هش بلینین که هونه رمه نند بؤئه و هی  
شتیکی وا بخاته پوو که جینگاکی په زراما هندی  
هموان بین، پیویستی به سه رمایه کی باش  
هه یه. نه مهش بق چوار چتیوهی چاک و نه و  
رهنگانه که به کار دین. هه رچه نده  
ببچوونی من نه مه شتیکی زور گرنگ نیه  
بوق نموونه من پیشانگاکی یه کمم زور یه  
تابلوزکا نم ره نگی ئاوی بیون چونکه که متر  
له سر من ده که و بی.  
به لام نه و هی هاستی پی ده کهم لم  
پیشانگا کایانه که له سوید ده کرینه و زیاتر  
بایا خ به چوار چتیوهی دیارو گران به ما  
ده دهن، و هک ده لین لایه نی پوو که شی زیاتر  
بیبر لی ده کنه و نه ک ناوه ره رکه که ای.

لله با بهت دهستگا هونه ریه کانی سویدی من  
ناتوانم پنهنجه بؤ هیچ شتیک را کشیم،  
چونکه تائیستاتیکه لاویان نه بیوم. به لام و هک  
بیزانم ئهوان پیز له هونه رو هونه رمه ندانی  
و ولا تانی دیکه دهگرن ووه هستم به هیچ  
جچوره جیاوازیه ک نه کردووه. به لکو به  
نیچه و انهو پیمان خوش شاره زای هونه ری  
و ولا تانی تر بین.

- ئایا زیانى سەختى ئافەرتى كورد بۇوه  
يە ئىلھام دەرۋە تەواوکەرى تابلىقكانت؟

له هموو قوتا بخانه کاندا کاریکه، به لام  
ئوهی لای من گرنگه ئوهی که له گل  
قوتا بخانه سوریالیدا نیم چونکه به  
جیهانیکی زور خیال اوی داده نیتم، دورور له  
واقع، و همن واهه سست ده کم زیاتر به لای  
واقعیه تدا ده پر قم هارچه ندە جاری پیازى  
تاییبه تی خۆمم نه گرتۇوه.

- دوور وولاتی به چ سیوهید کاری  
کردوتنه سهر رینیازو زیانی هونه ریت؟  
دوور وولاتی له هندنی لاینه وه کاری

سه ر کرد و  
 زیانی هونه ریم و  
 هندی جار له  
 پووی پیبا زوه  
 هندی بچوون  
 و بیرو رام  
 گواره و هک  
 گرانکاری  
 زیانی تایبه تی  
 خوم بهره و زیانی  
 خیزانی هه روها

ههست کردن بهو دوروی و نامؤبی و تنهایی  
و ساردي و جیاوازیههی که لیره هندی کات  
بهره و رووم دهیتتهوه. ئهتوانم بلیم که  
یارمهه تیشم ئهدا ت که زیاتر لهگال هونهدا  
بژیم، وه ئه و پهیوندیه گه رمانههی که ئیمه له  
وولاتی خومان لهسەری راھاتووین و لیره  
ناتوانین دروستى کهین من ئهتوانم لهگال  
هونهدا بېبېستم.

- ئەو چالاکیانەی کە له کوردستان و له  
ھەندەران پىنى ھەلساۋى؟  
له کوردستان بەشدارى پىشانگايى  
سالانەي پەيمانگاي ھونەرەجوانە كامن  
كىرىدۇوه. وەكتىن كە مامۆستا بۇوم له گەل  
پىشانگايى سالانەي قوتابياندا كارەكانى  
خۆم ئەخسىتە رۇو.

ئەمسال بۇ يەكەم جار لە ژیانما  
بېشانگایەکى خنچىلەنەتىپ تايىپەتىم كردەوە،  
كە بۇ ماوهى يەك مانگ لە شارى ھودىكىشمال  
بەرددەۋام بۇو. تابلىقكائىم زۇرى سروشىتى  
كۈردىستان و بارى دەررۇونى خۇمى  
دەرددەپىرى، كە تايىپەتن بەدۇوركەۋەنەۋەم لە  
خېزىان و كەس و كارم.

- ئەو پۇرۇزانى كە لەبەردەست دان چىن؟  
دەستىگا ھونتەرىيەكانى سوپىدى چۈن ھەلس و  
كەوت لەكەل ھونەرمەندانى بىانى دەكەن؟





ئاشن ئەحمدەد عەلی

بهلى تا راده<sup>ي</sup>هك توانيمه. كاتيك  
تابلوز<sup>ي</sup>هك ده<sup>ك</sup>شم و ده<sup>ك</sup>مه تاوبوونى،  
واهست ده<sup>ك</sup>م كه گيشتومهته پله<sup>ي</sup> كوتايى  
همو ئاواته<sup>ي</sup>كانم، و له همان كاتدا له<sup>ك</sup>هل  
دهست پيكردنى تابلوز<sup>ي</sup> داهاتودا چاوه<sup>ر</sup>پوانى  
همان كوتايى ده<sup>ك</sup>م، واتا زيانى من له<sup>ك</sup>هل  
دهست پيكردنى تابلوز<sup>ي</sup> كما دهست پينده<sup>ك</sup>ات  
وله<sup>ك</sup>هل كوتاييدا كوتايى دى. واتا هر  
تابلوز<sup>ي</sup>هك به زيانى خومى داده<sup>ن</sup>يتيم و له گه<sup>ل</sup>يدا  
ده<sup>ز</sup>يم، ئه<sup>م</sup>ه باسى ئه<sup>م</sup> و كاتانه ده<sup>ك</sup>م كه  
تابلوز<sup>ي</sup>هك ده<sup>ك</sup>م، دهنا زيانى ئاساينى  
رۇزانى خوم وەك هامو مرۇقىتىك دەبەمە  
سەر.

- تابلوکانت زیاتر له ژیر کاریگه‌ری چ  
پهنجیکن؟ بچی؟

ناتوانم بلیم که پنهانگیکی تایبہت کاری  
کردته تابلوکامن به لکو من و هک هونه رمه ندئ  
که نرخی گشت رهنگه کان لای من و هک یه ک  
وان و له یه ک پله دان، و به بچونی من  
نه و په یوه ندھ به کاتی دروستکرنی نئ و  
تابلویانه و هست و سوزی نئ و هونه رمه ندھ  
له چ باریکی ده رونی دایه، نئ مهش شتیکی  
دیاره که رهنگه هاوارکه ره کان یان گه رمه کان  
نئ اوینه هی ده رونینیکی ئالوزه و رهنگه  
له سره خوکان یان سارده کان نئ اوینه هی  
ده رونینیکی له بارو له سره خویه، و هئم شته له  
هینیشدآ دوباره ده بینته و ه. به لام و هک  
هله سنه نگاندنی رهنگی که تایبته به خومه و  
نه توانم بلیم کومه لهی پرته قالیه به تایبته و  
به پله یه کم، نه وجای کومه لهی رهنگه  
گه، مه کان.

- ئايا خوت به چ قوتا بخانه يەكى ھونەرى

تائیستا به ستروهندیم به هیچ قوتاخانه‌یک هونه، به و به لکه بتم خوشه

نه وکاته داهینانی گورهیان تیادا به‌دی

ئىمەش بېباشمان زانى كە چەند پېسيارىك دەربارەي ھونەر و ھونەرى وينەكىشان ئاراستى ھونزىمەند خۆى يىكەين.

- تابلوکانت چی دهدهخنه؟ ئایا شتىكى  
تاپىھەت كارى تىكىردىن؟

تابلوکامن شتیکی تایبەت کاری تى نەکردون، بەلام لە پیشانگاى دوورە وولاتدا دوورى ماوهۇ دوورى كۆمەلگاى گەرم و بە سۈزى خۇمان کارى تىكىرىم، بۆيە پىتم خۇشىبو لە پیشانگاى يەكەم لە دەرھەدى وولات تەنها لە بابەتى كوردى و كولتورو سروشىتى كوردەوارى بەدوئىم. لەم بارەيە وە لەگەل ئەو بقچونانەي خۆم، وەك كوردىكە هەرۋەها سووبىم لە چەند وينەيەكى فۇتۆگرافى ھەندى ناوجەي دىيارى كوردستان وەرگرتۇه. وەك بې بىر ھىتىنانەوەيەك بە تایبەتى لە شىوهى خانۇوى گالى لادى ى جاران، پىش رووخاندىن و وېرائىنەيان. هەرۋەها دەرىپىنە لە سروشىتىكى پاك و دوور لە مادەف و فەنيل.

- به بچوئی تو سخن هستی هونه رمه ند  
زیاتر به چیه وه به نده؟

ههستي هونه رمه نند به و پوداوانه و به بنه  
دكه له دهور پيشتي رووده دات.  
به برهه مه کانيشي بهنگ دانه و هي ئو  
ههستانه ن . و هك دهليين (هونه رمه نند خاوه نى  
ناسكترين ههست و سوزه ، چ رووداوي يكى  
كار يكى ره بفرزانه كه رووده دات زووتر كار ل  
هونه رمه نديك ده كات نهك له مرؤفي يكى  
ئاسايي )

- ئايا به هيلى ناسك و پەلەي رەنگاو  
، ھنگ، توانىتە يارى، دەدۇونى خۇوت دەد بىرى؟

من و خهون  
و  
تابلوکانم

ئامادەکردنی: ئاوات دلزار

ئاشنا ئەحمەد عەلی ھونەرمەندىتىكى كورده، لەسالى ١٩٦٩ لە شارى سلىمانى لە دايىك بۇوه. خويندنى سەرتايى و ناوهندى و پەيمانگاى ھونەر جوانەكانى، بەشى (شىۋەكارى) لە سالى ١٩٨٩ ھەر لەم شارە تەواو كىدووھوتا سالى ١٩٩٤ مامۆستاي ھونەر بۇھ لە قوتابخانەكانى چەند ناچىيەكى كىردستان، دوايى گۈزىرا وەتەوە ناو شارى سلىمانى. ئىستاش لەگەل ھاوسەرەكى، كاك شوان قادر لەشارى ھودىكسەفال يېنکە وە دەزبىن.

ئەم ھونەرمەندە دەللى: ئەو کاتەيى كە لە كوردىستان مامۆستايى ھونەر بۇوم، ھەستم دەكىرد كە بىيركىرىنەوهى مندالان زور كارىگەرە، ھەرچەندە ناتوانى ئەوهى خۇت ئەتەۋى، واتا بىتىازى خۇت بە سەرياندا بىسەپىتىنى، نابى لەكەليان بەستراوهى. بەلام من پىنم وايد كە جىهانىتىكى زور تايىھەت و سەرسۈرهىتىنەرە. بەراسىتى كاركىرىن لەكەل مندالان خۇشىيەكى خۇى تايىھەندىيەكى ھەيە، كاتى كە شارەزاي بىيركىرىنەوهىان دەبىت و سەربەستى تەواويان ئەدەيىتى،

ئیوه دهتانه ویت په رده پوشیان بکەن و بیانتاسین!... به لام ناتوانن... ئیوهش وەکو من له ئامیزیاندا دەژین و له ناخیاندا دەخون... ئیوه درودەکەن... ئیوه لەبرى ئەوهى ئیوه ناویز باسی خەمە کانتان بکەن. ئیوه لەبرى ئەوهى خەون بەو خەوانانەو ببین کە وجودیان نییە، دەچن شته هەبووەکان ئارایشت دەکەن و بەرگى بوکینى خەونە نەبووە جوانە کانیان لە بەردەکەن! داخ بق ئیوه کە هەرگىز ناتوانن خەونىکى پەسەنى حەقىقتە ببین!.

مالئاوايى لە جەعفتر دەکەم، به لام ئەو نايە ویت جىمبەيلەيت. وا ھەستدەکەم کە جەعفتر بەشىك بىت لە رۆحەم... ھەموومان جەعفترىن، جەعفترىكى سەقەت و ونبۇو کە لەھىلانە يەكى سەقەتەوە ھەلفرىپۇين!

دوينى [رۇمان] لە دايىك بۇو. لە گەل يەكە مىن زىركەي پەماندا، ھەموو خانە کانى جەستەم پېپۇون لە بالە فېنى شەپۈلە کانى رووبىارى گریان و خەندە و لە چاوانە وە تەنیا دوو تۈنۈك فرمىسک و ورىئەن سەرچەستەي وەك مىژۇوكە ھەللىزىيى فريشىتەيى ئەو و لە سەر پىستە پېرۇزە كەي تىكەل بە دلۋىيە خوتىنە ورده ھالاولىتە لساوەکان بۇون و چەند ھىلەتكەن شكاۋەيىان نەخشىرىد کە ھەر بە ھىلە ئەتكىراوە کانى سنورى نىشتمان دەچۈن! لە گەل يەكەم تروكەي چاواھە کانى رۇماندا، تەرمى خوتىناوىيى گەلا خەزىيە کانى پايىزى نىشتمانمان بە دەستە خوتىناویيە کانى خۇمان لە گۈپىنا!

رۇمان لە نىشتمانى غوربەتدا يان لە غوربەتى نىشتماندا يەكەم تۈنۈكى ژەكى مىزى؟! منىش نە دە توانم داستانى غوربەت بنووسىمەوە و نە لە رۇمانى نىشتمان و چىرقۇكى لە دايىك بۇونى رۇمانىش دەگەم!

# جەعفتر و مىن، دوو پاڭلەوانى رۇمانى ئاۋىنە سەرابىيە کانى نۇو سەر ھىۋا قادرن.

# رۇمانى كۈم لە ۱۹۹۶-۸-۳۱ دا لە دايىك بۇو.

خۇمدا نە دىتىووه، نامە ویت لە چاوانى سەوزى ئەودا شەوانە مەلە بکەم و لە زېر شەپقلى سەوزى بىسکە کانىدا بخەوم!

- جەعفتر!... ناگەرېيىتەوە نىشتمان؟!

- نا... ئىستا ھەموو گەرمادە کانى شار داتە بیون و دايىكىش لە گۆرسەتلىنى پايىزدا بەئارامىيلى تېپەكشاوه... ئىدى لە زېر عەبائى دրاوى كىتا بوخچەي ئاواتە کانى بە دەستەوە بىگرم و لە كامە حەمامى شاردە و ج دايىكى بە لفکە زېرىكەي بىمشوات.

- جەعفتر!... [شام شەكىرە، ولات شىرىيەتىرە!].

- دەزانم... به لام چىتر بە دەستىكەوە جامە دانىيم پېتىپەتىرىت و دوختىنى شەرۋاتىش پېتىابەستىرىت!

- جەعفتر!... ئەدى ئەي بوكە پەرۇينە کانى مينا... ها... ئەوان چىيان لېتە سەرهات؟!

جەعفتر دەگرى... جەعفتر وەكۇ شىتىان ھەلەپەرىت و پې بە گەرروى پايزى ئاوارەيى قاقا پېتىكەنەتى... [ھەموومان ھەر بوكە پەرۇينەين... چۈنۈن بۇي دروستمان دەكەن، ھەرچۈن پېتىان خۇشىبىت دەست و قاچمان كورت و درىز دەكەن... رووخسارمان بۇياخ دەكەن... سەمامان پېتىكەن... دەمانگىرىن... ئاخ!... برام ئەتق تىنەگەي... ھېچكەس تىنەگات... ئاخىر لېرەش ھەر بوكە پەرۇينەين، لېرەش ھەر گورىسى ئەستۇورە کانى ئەۋىمان بەقاچ و دەستەوە بەستراون... لېرەش ھەر لە وېرە قورپىش دەكىتىن... ھەر بە زۇرۇنَا کانى ئەۋى ھەلەپەرىن... ئاخ براى برااكەم!... ج كەسىك لە من ناگات...]

- جەعفتر!... ئەمىستاش شىعر دەنۇوسيت؟!

- شىعر!... بق نا... بە تەنیا بق خۇمى دەنۇوسم... تەنیا ھەر خۇم لە گەل ھەناسە شىعرە کانىدا دە تۈۋىمەوە و لە سەر پىتىمى مۇسىقىايان پەيکەری رۆح سەما دەكەت. من پايىزى نىشتمان، بەزىنى بەرزى خەمە کانى، چىرى زەردى ھىۋا کانى، ھەرھە مۇويانم لە بورجى خەيالى شىعرە کانىدا زىندا نىكىردوون!... پېتىوايە کە دەبىت ئازادىيانكەم؟!... بق؟!... كى ئاپریان لىدە داتەوە و نازى فرمىسکە کانىان ھەلە گەرىت؟!... دە گۈپبىگە دەي:-

بە گەریانەو يەكەم تروو سەكە زېنە رامووسى  
يەكەم زىركەم


زانى دايىكى كرده پېتكەنин

منىش بە حەرفى پەزاوى خوتىنى

يەكەم ھۆنراوەي گەریانم نۇوسى!

... گەریان، بىلەپىلى و پەشىپىنى لە گەل يەكەم ھەناسە مەدا...

رقدانی پاییز، پاییزی غوریهت و ناوارهیی هست بهچی دهکهیت؟!... چی دهبینی و گویچکهی ناخت ج دهژنهویت و میشکی کاست بهبنی چی کاستر و مهستتر دهبتیت؟!. سهماں گه لakanی پاییزی تاراوگه چون به لهنجهی دارژانی خهزانی نیشتمان دهچووتنی؟!. چهند سالانه بونی خاکی پاش نه رمه بارانی پاییزت نه کردودوه؟!... ئیستاکه تو بونی ئه و بونهت بهته اوی له بیرکردودوه. ئه و بونهی که له هیچ بونیکی دیکه ناچیت... بونی پرچی به بارانی پاییز ته پبووی خاکی نیشتمان!... لیره مشته خاکیک چنگ ناکوهیت تا ریژنه بارانیکی به سه ردا بپژیت. لیره تا چاو بپکات هه مووشتیک سهوز ده چیتەوە... لیره: دارستانه کان سهوزن، زرهیاچه کان سهوز، مرۆف و سهگ و پشیله کان سهوزن، هه بر بهته نیا خهونه کانی ئیمه رهنگی پاییزی نیشتمانیان گرتودوه. لیره له بسته لەک و شەختە بندانی زستانانی شدا پاییزیکی قژپنراو و شان و مل رووتدا چاوانم کردەوە... ئاوریشمی گه لا زرد و مهیلەو سوورە کانی دارچنارە پیرەکی حهوشە کمان بوبیه يەکەم بەرگم و بەشیله يەکی زەردی هنگوینی فرچکیان دام. من له يەکەم ساتە وە ئاشقی پاییز بوم. هۆگری كزهباي پاییزی رەنگاپەرنگ که جوانیي ئه و به هیچ چوانییه کی تر ناچیت. ئه و پاییزی نیشتمان بوم یان نیشتمانی فراوانی پاییز؟!. ئه و بولە رەنگالەی وینه کان بون کە ئیستا بونهتە سەراب.... ئه و خهونه پاییزییه کانی نیشتمان بون کە له سەر شەقامە دلرەقە کانی غوریه تدا هەللوهرين.



پیشکو نہ جمہ ددین

بایسیز و خوربیت و خهونه‌گان

من له پاییزه به یانیانی ئاواره بیدا و له نیو په ریزی زه ردی دا برا ندا، له روحی هه لفربیوی گه لا مردووه کانی نیشتمان ده گه پیم، دوینی به یانی به پیکه وت جه عفرم بینی...  
جه عفری دهستی راست له ئانیشکدا قرتیزراو، به ته نیا دهستیک شوسته شه قامیکی پاییزی دهمالی. جه عفره گه لا زه ردہ چاو مهست و بیهق شه کانی کوده کرده و له هه مبانی خونه توزلینی شتووه کانی نیشتمانی دهی ستاوتن...

- جه عهه ر گيان، کجه قژه هر دهکه ها و بیت چی  
لته سه رهات؟!

— به جیمهیشت!... پرچه کانی سه وزکردبوون و  
چاوه کانیشی هر سهوز بیوون. من که به هاریکم لهته مهمنی

یانه‌ی ژماره چل بز به هیزبونی یانه‌کهی دهستی کرد به کرین و پاکیشانی یه ک دوو یانه و جهند یاریکه ریک به جیا. یکنیک له وانه سهید حمهی خوله بو که ناسراو بو به سهید حمهی بن خر که به پاره و پولی باش باش پووی کرده یانه‌ی ژماره چل. وک باسم کرد خله‌کی دورگه‌که مان حمز له ماستاو چیهتی و پیندا هـ لـ گـوـتن و فـیـشـارـ دـهـکـن ئـوـهـبـوـ کـهـ سـهـیدـ حـمـهـیـ بـنـ خـرـ پـوـوـیـ کـرـدـهـ یـانـهـیـ ژـمـارـهـ چـلـ. جـهـمـاعـهـتـیـ دـقـلـ وـ زـورـنـاـ، خـواـ هـلـنـاـگـرـیـ لـهـ زـورـنـاـ لـیدـانـ درـتـغـیـانـ نـهـکـرـدـ، حـشـرـیـکـیـانـ بـوـ کـرـدـ هـرـ مـهـپـرسـنـ... وـهـکـ بـلـنـیـ هـرـ ئـوـ کـورـیـ مـهـیدـانـیـ تـوـیـتـنـیـ یـهـ وـ خـلـکـیـ تـرـ چـهـنـدـ سـالـهـ هـیـچـیـ نـهـکـرـدـوـوـ، ئـوـهـبـوـ کـاـکـهـ سـهـیدـ حـمـهـیـ بـنـ خـرـ لـهـ لـوـتـ بـلـنـدـیـ وـ وـهـ لـهـ خـوـ بـایـهـوـهـ نـهـیـتوـانـیـ پـهـیـانـهـکـهـ تـاسـهـرـ بـیـاتـ. لـهـ رـاـسـتـیـدـاـ پـیـیـ وـابـوـ باـشـتـرـینـ وـ بـهـ توـانـاتـرـینـ یـارـیـکـهـ دـورـگـهـ یـهـ، ئـوـ زـورـنـاـ لـیدـانـ وـ دـهـقـلـ هـاشـ وـ هـوـشـهـیـ جـهـمـاعـهـتـ کـارـیـ خـرـاـپـ کـرـدـبـوـوـ سـهـرـ هـهـسـتـ وـ بـیـرـ کـرـدـنـوـهـیـ سـهـیدـ حـمـهـ. ئـوـ نـیـدـهـزـانـیـ ئـوـ جـهـمـاعـهـتـ کـارـوـ نـانـیـانـ لـهـسـهـرـ زـورـنـاـ لـیدـانـهـ، زـورـنـاـ بـوـ هـمـوـوـکـهـسـ لـنـدـهـدـهـنـ تـهـنـانـهـتـ بـقـ ئـهـوـانـهـ دـرـیـ وـهـرـزـشـیـشـ. ئـوـهـبـوـ کـاـکـهـ سـهـیدـ حـمـهـ لـهـ یـارـیـکـهـ بـهـ ئـنـقـسـتـ گـوـلـیـکـیـ لـهـ خـوـیـانـ کـرـدـ وـ یـانـهـیـ ژـمـارـهـ چـلـ جـنـ هـیـشـتـ. ئـیـتـ ئـهـوـهـیـ ژـیـانـیـ دـوـرـگـهـ یـهـ گـهـمانـ... وـهـلـهـیـ بـرـادـهـرـینـهـ وـ پـیـشـهـکـهـمـانـ ئـاوـهـگـلـ بـوـ، زـلامـ لـهـ پـوـوـیـ نـایـنـ بـلـنـیـ منـ کـاتـیـکـ تـقـیـنـیـشـ کـرـدـوـوـ، وـوـرـدـهـ وـوـرـدـهـ وـایـ لـیدـیـ بـهـزـدـارـیـ کـرـدـنـ لـهـ تـقـیـنـیـ دـهـبـیـتـهـ عـهـبـیـکـیـ گـهـرـهـ، جـارـانـ چـهـنـدـ پـیـرـقـزـ بـوـ، هـرـ نـیـوـیـ تـقـیـنـیـ خـوـیـشـتـیـکـیـ پـرـ لـهـ بـایـخـ وـ گـرـانـ بـوـ، بـهـلـامـ بـهـدـاـخـهـوـهـ ئـیـمـرـقـکـهـ... ئـیـمـرـقـکـهـ بـهـرـهـ نـهـنـگـیـ دـهـرـوـاـ... تـوـخـواـ کـهـیـ لـهـشـ سـاـغـیـ وـ چـهـقـقـ کـیـشـیـ، کـهـیـ تـقـیـنـیـ وـ مـلـ هـوـرـیـ، کـهـیـ شـهـتـرـهـنـجـ وـ کـلـهـگـاـ بـهـیـکـتـرـ دـهـگـهـنـهـوـ. بـهـلـامـ لـهـبـهـرـ ئـهـوـهـیـ خـلـکـیـ دـورـگـهـ یـهـمـانـ هـیـنـدـهـ دـوـاـکـهـوـتـونـ وـ هـیـنـدـهـشـ حـزـ لـهـ مـرـفـقـیـ بـنـ پـرـینـسـیـپـ وـ دـهـرـوـنـ پـیـسـ دـهـکـنـ. لـهـهـرـزـشـیـشـ هـرـهـمـانـ خـلـکـ دـهـبـنـهـ یـارـیـکـهـ وـ کـاـپـیـتـانـ وـ رـاهـیـتـهـرـ. بـهـلـنـیـ وـهـخـتـیـ خـوـیـشـتـیـ کـهـیـ تـقـیـنـیـ بـوـ، ئـیـسـتـاـکـهـ وـازـمـ لـیـ هـیـنـاـوـهـ. بـرـوـانـاـکـنـ، شـهـوـانـیـشـ خـوـنـیـ پـیـوـهـ دـهـبـیـنـ. جـارـ نـاـ جـارـ بـهـخـفـتـ وـ هـهـنـیـسـکـهـوـ ئـهـلـیـمـ بـهـیـانـیـ ئـهـچـمـ وـ دـهـسـتـ دـهـدـهـمـهـ وـ بـیـشـهـکـهـ! تـقـیـنـیـ خـوـشـهـوـیـسـتـ، بـهـلـامـ رـفـزـیـ دـوـایـیـ، بـوـچـونـیـکـیـ تـرـ، دـیـسـانـهـوـهـ پـهـزـیـوـانـیـ! ئـاـخـرـ لـهـگـلـ کـنـیـ؟ تـفـ لـهـ تـقـیـنـیـهـ کـهـواـ زـهـلـیـ وـ پـیـسـ بـبـنـیـ، ئـهـمـ جـوـرـهـ وـ دـهـیـانـ وـ سـهـدـهـاـ جـوـرـیـ وـ یـارـیـ تـنـ بـکـنـ.

نهـمـ سـهـگـالـهـیـ کـهـ لـایـ ئـیـمـهـ وـهـزـیـرـوـ کـهـلـانـ  
بـیـنـهـ لـایـ تـقـ بـهـخـوـدـاـ نـایـکـهـیـ گـاـوانـ وـ شـوـانـ  
هـهـرـنـدـبـیـنـکـ بـوـوـهـ سـاخـوـاـ لـهـدـهـمـ نـاـوـهـ بـلـنـیـ:  
دـهـوـلـهـتـیـ دـاـوـهـ بـهـکـهـ، نـیـعـهـتـیـ دـاـوـهـ بـهـسـهـکـ

حاجی قادری کوئی

نهـبـیـ. هـهـرـچـهـنـدـ بـرـادـهـرـانـیـ پـشـتـگـیرـ لـهـمـ یـانـهـیـ، زـورـ دـزـ بـوـنـ بـهـمـ کـارـهـیـ کـاـپـیـتـانـ بـهـلـامـ کـاـپـیـتـانـ هـرـ بـوـخـوـیـ کـاـپـیـتـانـ بـوـ کـاـپـیـتـانـیـ چـیـ؟ کـهـلـهـ گـاـبـوـ! کـهـسـیـ بـهـپـیـاـوـ نـهـدـهـزـانـیـ! لـهـ یـارـیـ کـرـدـنـیـشـداـ هـرـ بـقـ خـوـیـ هـارـیـ دـهـکـرـدـ، قـهـتـ پـاسـیـ بـهـ کـهـسـ نـهـدـهـدـاـ، دـهـبـوـایـهـ هـرـ خـوـیـ گـوـلـیـ بـکـرـدـایـهـ. پـقـیـ لـهـهـمـوـ یـارـیـکـهـرـیـکـیـ چـاـکـ بـوـ بـهـ کـورـتـیـ مـوـعـجـیـزـهـیـکـیـ خـوـیـسـتـیـ بـنـ وـیـنـهـ بـوـوـ، هـهـرـچـهـنـدـ تـبـیـعـهـتـیـ کـاـپـیـتـانـ وـ کـاـپـیـتـانـیـتـیـ لـایـ ئـیـمـهـ دـهـتـوـانـ بـلـیـمـ زـوـرـیـهـیـ ئـهـوـهـایـهـ، هـهـمـوـوـیـانـ بـهـ چـهـشـنـیـ ئـاـغـایـهـتـیـ لـنـ دـهـخـوـرـنـ، لـیـیـانـ تـیـکـ دـهـچـیـ کـهـ ئـهـمـ ئـاـغـایـهـتـیـ نـیـهـ ئـهـمـ فـوـتـبـوـلـهـ وـ فـوـتـبـوـلـیـشـ یـارـیـکـیـ شـارـسـتـانـیـهـ، نـابـیـ وـاـهـلـسـوـ کـوـتـ بـکـنـ، بـهـلـامـ دـیـسـانـهـوـهـ.. لـهـبـیـرـمـ کـرـدـ، دـورـگـهـ یـهـ کـیـ سـهـیـرـوـ سـهـمـهـرـهـیـ دـورـ لـهـ هـهـمـوـ یـاـسـایـهـکـ، دـوـوـرـهـ لـهـ هـهـمـوـ لـوـگـیـکـیـ مـرـقـفـایـهـتـیـ، تـبـیـعـهـتـیـ مـهـیـمـونـ، مـاسـیـ، تـوتـیـ، گـورـگـ، کـهـمـتـیـارـمـانـ وـهـرـگـرـتـوـهـ، تـهـنـهاـ هـیـ مـرـقـفـ بـهـبـیـ. خـوـ نـاـحـقـیـشـ نـیـنـ خـوـ ئـیـمـهـ مـرـقـفـ نـابـیـنـینـ، تـهـنـیـاـ دـهـرـیـاـ، دـهـرـیـاـشـ ئـهـمـ دـهـرـیـاـیـهـ سـامـنـاـکـ کـهـهـیـجـ لـهـ یـانـیـ مـرـقـفـ وـ مـرـقـفـایـهـتـیـ نـاـکـاـتـ... ئـهـوـبـوـ ئـهـوـ بـرـادـهـرـهـ پـارـیـزـانـهـ وـ دـورـکـهـوـتـنـهـ، مـهـگـرـ خـودـاـ بـوـخـوـیـ بـزـانـیـ، ئـهـمـانـیـشـ لـهـ رـقـیـ کـاـپـیـتـانـ کـهـوـتـنـهـ دـزـایـهـتـیـ ئـهـمـ یـانـهـیـ، ئـهـمـ یـانـهـیـ کـهـ تـاـکـوـ دـوـیـنـنـیـ خـوـیـانـ ئـهـنـدـامـیـ بـوـ، هـهـرـچـیـ پـیـانـ کـرـاـ دـرـیـ یـانـهـیـ حـفـتـاـوـیـنـجـ بـهـکـارـیـانـ هـیـنـاـ، تـهـنـانـهـ کـاـپـیـتـانـیـانـ بـهـپـیـاـوـیـ دـهـرـیـاـ، رـاهـیـنـهـرـیـ بـهـپـیـاـوـیـ ئـهـقـیـانـوـسـ لـهـ قـهـلـمـ دـهـداـ.

بـهـلـامـ ئـیـمـرـوـکـهـ هـهـوـاـوـ کـهـشـیـ تـقـیـنـیـ وـ وـهـرـزـشـ بـهـ گـشـتـیـ گـوـراـوـهـ، یـانـهـیـ حـفـتـاـوـیـنـجـیـشـ وـهـکـ یـانـهـیـ ژـمـارـهـ چـلـ خـرـاـپـ دـهـوـلـهـمـهـنـدـ بـوـوـ، ئـهـوـهـیـ رـقـیـنـکـیـشـ کـاتـیـ خـوـیـ چـهـلـیـهـیـکـیـ بـوـ لـیدـابـنـ، ئـیـمـرـوـکـهـ خـوـیـ بـهـ نـزـیـکـتـرـینـ کـهـسـیـ ئـهـمـانـ دـهـزـانـیـ. ئـیـنـجاـ کـهـ نـهـخـوـاـسـتـاـ کـارـ بـکـاتـهـ سـهـرـ ئـهـمـ دـوـوـ بـرـادـهـرـهـیـ، سـهـرـدـارـ عـهـزـقـ وـ فـهـقـیـ حـهـکـیـمـ. بـهـلـیـ ئـیـمـرـوـکـهـ هـهـوـاـوـ کـهـشـیـ وـهـرـزـشـ گـوـراـوـهـ، خـرـاـپـیـشـ گـوـراـوـهـ! بـقـیـهـ ئـهـمـ دـوـوـ زـاتـهـ بـهـرـیـزـهـ یـارـیـزـانـهـ بـهـ(پـرـینـسـیـپـیـ) دـوـیـنـنـیـ کـهـ خـوـیـانـ بـهـ نـوـیـنـهـرـیـ یـارـیـ کـهـرـانـیـ بـهـشـ خـوـارـوـیـ دـورـگـهـ یـهـمـانـ دـهـزـانـیـ، مـلـیـانـ کـهـجـ کـرـدـوـهـ وـ گـهـرـاـونـهـتـوـهـ نـاـوـ یـانـهـیـ حـفـتـاـوـیـنـجـ، ئـهـوـهـیـ وـوـتـبـیـانـ گـهـرـانـدـیـانـهـوـ بـوـ نـیـوـ دـهـمـیـانـ. نـکـوـلـیـ لـهـ هـهـمـوـ ئـهـوـ شـتـانـهـیـ گـوـتـوـیـانـهـ دـهـیـکـنـ، بـهـلـامـ مـیـزـوـوـیـ وـهـرـزـشـ وـهـ بـهـ تـایـبـهـتـ تـقـیـنـیـ، تـهـحـمـولـیـ ئـهـمـ جـوـهـهـ هـهـلـسـوـ کـهـوـتـانـهـ نـاـکـاـتـ، چـونـکـهـ ژـلـامـ هـهـلـهـرـئـهـ وـهـنـدـهـ لـهـتـقـیـنـنـ سـوـکـ بـوـوـ یـانـ سـوـکـ کـرـاـ، ئـیـتـ تـازـهـ تـهـواـ. خـوـ مـارـاـدـوـنـاـشـ کـهـ ئـیـسـتـاـکـهـ لـهـ ئـیـتـا~یـاـ یـارـیـ دـهـکـاتـ بـهـهـمـانـ چـهـشـنـ سـوـکـ کـرـاـ یـانـ سـوـکـ بـوـ. گـوـایـاـ لـهـگـالـ مـاـفـیـاـیـ تـرـیـاـکـ وـ هـیـرـقـینـ دـهـسـتـیـ هـهـیـهـ تـازـهـ زـهـمـهـتـهـ مـارـاـدـوـنـاـ بـیـتـهـ وـهـمـارـاـدـوـنـاـیـ سـهـرـتـاـکـانـیـ هـهـشـتاـ، جـاـ ئـهـوـانـیـشـ وـ لـهـبـاـهـتـیـ ئـهـمـانـهـ قـهـتـ نـابـنـهـوـ یـارـیـکـهـ رـانـیـ جـارـانـ وـهـهـرـگـیـزـ ئـهـوـ حـسـیـبـهـیـانـ لـهـ هـیـجـ لـایـهـکـهـوـ بـقـ نـاـکـرـیـ. جـابـوـیـهـ وـهـرـزـشـ لـهـ رـاسـتـیـداـ وـهـکـ قـومـارـنـیـهـ، بـهـلـامـ نـمـوـنـهـیـ وـهـهـاـ وـایـ لـیـ دـهـکـانـ کـهـ وـایـ لـیـ بـیـ. کـوـرـهـ جـاـ خـوـزـگـهـ پـوـخـلـهـوـاتـیـ ئـهـمـ تـقـیـنـیـ یـهـ هـهـرـ ئـهـوـنـدـهـ بـوـایـهـ.

دهکرد، بهلام نیمرؤکه وازی لئی هیناون وەک شوان و  
مینگەلەکەی، خۆی بويته ياریکەرى يانەيەكى تر(يانەي  
حافتاويئىنچ) ئەوهى جاران پىنكەوھ پېشبركىيان دەركىدو  
ناخوشى گەورەيان لەنىواندا ھەبۇو. زور سەيرە كاكە ووسو  
جاران زور پقى لەم يانەيە بۇو. ھەممۇ جار خەلكى كەنارى  
دەريايى هاندەدا كە دىزى يانەي زمارە حەفتاتويئىنچ بجولىتەوه.  
شىۋاپازى زور سەيرە توئىدى دەگىرتە بەر بۇ لەوازىزكىرنىيان خەلكى  
كەنارى دەرياش درىغىيان نەدەركرد، چۈنكە كاكە ووسو خۆى  
وەدونىيا ھاتۇرۇ ئەم ناواچان يە ..

به هه رحال ئوه و اگيئري گوريه و، هه ر خوا كاري راست بكت.  
به لئن قهيران قهيرانى پرينسيپه، قهيرانى بيلو باوهرو و هفایي،  
قهيران قهيرانى مرؤفاييه...ئوه تا كاكه وهستا رەحمان جاران  
لهگەل يانه ئىزماره چل يارى دەكىد و سەر دەمایيئك ھەرئە وەتە  
نه بوبو كاپيتانى يانه كە، به لام له بەر ئوهى خقى زقد بە  
يارىكەرنىكى چاڭ و به توانا دەزانى يەكسەر لىنىداو دووبەرەكى  
خستە نېتو يانه كە يانه يەكى ترى دامەز زاند كە ناوى نا يانه ئى  
زماره حەفتاونق.

کوره نئو جا له وجا خوشتر له یانه‌ی ژماره حفتا پینچ دا فهقی  
حکمیتک یاری دهکرد، پزشکیان له واژیک، هیشرشیکی گهوره  
بقو سه ر گوله‌که یان کرا، فهقی حکمیتکه بیتر ته حمه مولوی نه ما  
و به راکه راکه خوی گهیانده لای ده روازه‌که یان بقو برگری  
کردن، لهم کاتیه دهنگ خوشکه که نئم یانه‌یه به زحمه‌ت توپی  
له یاریکه رهکه نه یاری ستاند و پاسی دایه فهقی حکمی  
ماندو شهکت، به لام فهقی له مشهودشیان و بیچاره‌یان  
به کسه، شوت، بی ناو گلائم خوبیان لندرا.

بهم گوله یه-ک سفر دوراندیان، قورباهه سه ر کاکی دهنگ خوش (سه ردار عزق) و فهقی حکیم. نیتر کاپیتانی یانه که کله کونه و هزی له دهم و چاوی ئئم جوره یاریکه رانه نه ده کرد، يه کس سه بیانووی بتو هله که وت که تینیان هله لات و لئ نه گه ری چیتر توهنی وا زیکردن بکهون، کاپیتان ئم زاتانه ی واسوک و چروک کرد که به راستی له هیچ فرهنه نگیکی و هرزشی شتی، وا به دی ناکری، ته نیا ئگه ره دوورگه که ئی ئئمه

هه میشه به هزاران خله ک به دلخوازی و به ناره زنوه خویانه وه  
ده هاتن و پشتگیریان لی ده کردين.  
ئهم دوو به ریزه روزنیکیان بر لهوهی پیش بروکیمان له کل  
تیپنیکی تر دهست پن بکا، به خویان و پیاوه کانیانه وه  
ته شریفی (ناموباره کیان) هاتن و ئهم گوره پانه جوانه يان لى  
تینکارین، ئوهی که وته بهر دهستیان وردیان کردو تقوه کانیان لى  
زه ووت کردين و بئ شه رمانه به چه قل له تیان کرد.


حمه که موق نئاغا له دووره وه سمیانی باده داو به شوفیری  
تراکتوره که دهگوت: لهم لاهه و هره بیکنله، لهم لاهه...، هم سال  
چومان زور ده بی..

بی شه رمانه جل و به رگی و هرزشیان لئ دراندین.  
ته ماشاکه رانیش که هاتبوون زقد ئازار دران و خراب بلاوهیان  
پئ کردن، هموو پیگایکیان گرتە بەر بق دژاھتی لهش ساغى  
و میشک ساغى. خودا دەزانى يەرامىھر بەم كردەوانەيان دز بە  
و هرزش كارانى راست و دروست چیان دەست دەكەوت... خودا  
دەزانىن.

به لئن ئىمېرۇكە حکومەتە كەمان بېپارى داوه كە ھەھۇودەبى  
وھەزىش بىكەن. جاران ئەۋەرى لە ژياني خقى پۇوى نەكىدبوھ ھىچ  
چۈرىتكى وھەزىشەوھ ئىمېرۇكە وا خەرىكە پېرىدە مېرىدى  
ھەفتاسالاش بە باسكتېتېۋەلەوھ خەرىكە، حەمە شاھقۇ  
ھەمەكەمۇش، ئەم دووبىاواھ بىن شەرمە دىز بە وھەزىشانە،  
بەخۇيان و پىاواھ كانىيانەوھ ھاتون بۇ يارى كىرىن و بەشدارى  
كىرىن لە تۈرىنى. تۈپىنى لاي ئىئىمە ئەۋەرى خۇشە كە، ياغى بۇوە  
لە ھەممۇ ياسايدىكى ئىتۇ دەھولتى وھەزىشى، ئەۋەرى حکومەت پىنى  
خۇش بىن ئەۋە دەبىن. بۇيە ژمارەتى يارى كەران جار نا جار  
شەش كەسە، ھەندى ئارىش دوازىزەكەس، زۇر جارىش سەد  
ئەۋەندە. وەك باسمان كرد ئەم دوو زەلامەش ھاتبۇون بۇ يارى  
كىرىن، ھەر يەكەيان لەگەل يانەيەكە. ھەرچەندە جاران كىشە و  
بىشەيان نېبۇو، زۇر دېست بۇون، چۈنكە خالى ھاوبەشىيان  
دۈزىيەتى كىرىنى وھەزىش بۇوەلەم ئىمېرۇكە بە پىچەوانە زۇر  
رېقىان لە يەك تەرە... سەيرە...

کاتی خوی و هرزش کردن و هک زیانی خاوهخیزانی، کومه‌لای پرینسیپی ههبوو. به لام نئمروکه به داخوه هیچ پرینسیپ و مرینسیپ له گفری دا نه ماوه، و هک قوماری لئی هاتوه، گرنگ ئه و هیه قومار بکه‌ی، له گله‌ل کی؟ هیچ مهراج نیه بیناسی، کوری باش بی، خراپ بی، یاری بزانی، نه زانی، دوزمنایه تیت له گله‌ل ههبووی، نهبووی، .. کوره نا! انا ته‌نیا قومار بق قومارچی گرنگه، ئه ووی، تر هه‌موموی، هنچه!

جاداخى گرانب ئەو خەلکانە وەرزشىشيان وەك قومارلى  
كىدووه، لەكۈي تىدابى، لەۋىن، ئەگىنانازانم وەرزش ج  
پەيوەندىيەكى بەوانەوە ھەيە! كورە لە بىرم كرد. خۇ حۆكمەت  
بېپارى داوه، حۆكمەت!  
كاكەوسوو كاتىك سەرەپەشتى، يانەي ژمارەي حەفاو ھەشتى،



# هەبۇنەبۇو، دۇمڭەيەل هەبۇو . . .

تولەمان لى بىنىيەتەوھ داپىرم لەدەمى پىشىنەكانى خۇيەوە بۇي گىزامەوە: جارىكىيان لە بىق و تورپەيى دەريا، ويستمان دورگەكەمان جى هەيلىن و شۇينىكى تىر لەم جىهانە بى سۇورە بىكىن بە ھەوارگە. دەريا ووتى: ئۇ كاتەى كە هاتن ئىزىنتان نەخواست؟ ئىستاكە چۈن دەھىلەم بېرقۇن؟ قەت نا! ھەركىز! تا من مابىم، تاوشىكم نەكىدووھ ئىزىنتان نادەم وەلىشتان ناگەرىم كە بە ئارامى زيان بىبەنەسەر، ئۇ وەتى خراپە لەگەلتان دەكەم، ئىۋەش فەرمۇون، ئەگەر پىنم دەۋەستەن ھەرچى لەدەستتەن دى بىكەن فەرمۇون.. ئىۋە قوربانى مەملەتىي من و خودان، من و خودا...، بەلای من وە، ئىۋە ھەمۇتان ھەرىيەن، چياوازىتەن نىيە، لاي من حالى ئىستا و حالى راپىدونىيە، گىرنگ ئۇ وەتى كە ئىۋەش ھەر نە وەتى ئەوانەتى پىشىن!!.

بەلنى وەك باسم كرد لەگەل ئەۋەشدا زيان و گوزەران ھەر لە پۇرىشتىن دابۇو.

حکومەتكەمان سەير بۇو، بایخى بە ھەندى شت دەدا كەلە راستىدا شايانى ئەۋە نەبۇون. حکومەتكەمان خۇى پىن گىرۇدە بىكىدايە .. خۇ خەلکەكەمان ئەگەر بە دەلىشيان نەبوايە تۇتى ئاسا دووبىارەيان دەكىدەوە و جى بەجى يان دەكىد. دىارە حکومەتكەمان پىر بە پىستى مىللەتكەمان بۇو. جارىكىيان بەریزانى حکومەتكەمان ياسايدىكىيان لە مەر وەرزىشەوە دەركىرد،

ئىتىم مۇدىلى مۇدىلى وەرزىش كىردىن بۇو، ھەمۇوى تىۋە گلان. بەندە كە لە كۆنەوە، ھەر لە مەندالىيەوە، خەزىكى وەرزىش بۇوم، شەرمەم بەخۇ بۇ ئىتىر وەرزىش بىكەم چۈنكە خەلکى وائى تى ئالا، كە ھىچ پەيوەندىيەكىيان بە وەرزىشەوە نەبۇوتەنانەت ھىندىكىيان كاتى خۇى لە وانەبۇون كە زەوي و گۇرپەپانى تۆپىنیان لى تىك ئەداین بۇ بەرژەندى تەسکى ئاغايىتى يان بەرژەندى تەسکى كاسايدىتىان. بۇ نەمونە كاڭە حەمە شاھقۇ حەمە كەمۇ ئاغا، دوو زەلامى جىاوا خەلکى دوو گەرەكى جىا. بەلام لەبەر ئۇ وەتى شارەوانى پېگاي ئۇ وەتى پى دابۇون كە جۇ لە گۇرپەپانەكەي ئىتمە بېچىن لە كۆئى ئىتمە فوتېلەمان دەكىرد، كە

وولاتەتكەمان دورگەيەكى جوان كە لە وسەرى تائە وسەرى بەچەند كاتىزىنەن ئەتبرى. وولاتىكى چۈكۈلەي قەشەنگ دەرورىيەرەكەي دەريايەكى بى سۇور گەمارقى دابۇ. ھەمېشە شەپقىلى حىلى ھەبۇ كە ناوجە(سۇورىيەكانى) كەنارى دەريا زورپەيى كاتى سال زيان و زەرەريان پى دەگەپىشت. قەت حەسانەتەپان نەبۇو. بەلام لەگەل ئەۋەشدا، لەناوهە، ئاسايى خەلک دەزىيا.

وولاتەتكەمان لەپاستىدا دەولەمەند بۇو. خاکىكى بەپىت و بەرەكەتى ھەبۇو. ھەمۇو شىتىكى ھەر لە خۇى بۇو. بېر بۇو لە زېر و ئەلماس.. بەلام خەلکەكەتى تەمبەل و بى بەرناમە بۇون، ھەرچەندە تەنها گۇناھى ئەوان نەبۇو، بەلکو بەشى حکومەتكەمان ئىشى تىدابۇو، كە حەزى لە خاوه ساندىن و مل بادان و قول فاشكردنەوە دەكىرد. ئىن كە حکومەتكەمان وابويا، ھىچ گومانى تىدا نەبۇو كە خەلکىش لە لايىك وا بەباردەھات وە لە لايىكى تىرىشەوە گۇناھى خەلک ئۇ وەبۇو كە نەيدەوەپىست حکومەتكەمان گۈرپىنى تى بىكەوى. خۇ لەوانەشە حق بونايە. چۈنكە وولاتەتكەمان ھەر دەم ھەرەشە ئەمانى لى دەكرا-ووتى: لە لايىن دەرياوە!. بەلنى لە لايىن ئۇ دەريا زەلەوە، ئاي كە زەل بۇو. ھىچ چارمان نەبۇو. قەت ئەمانى نەدەدا. دىاريپۇو نىشىتەجى بۇونى ئەۋە گەلە بە دلى ئەم دەريايە مل ھورە نەبۇو. ھەرچەندە مىزۇوى گەلى دورگەكەمان بەر لە زايىنە، بەلام ھەر لە وساتەوە كە لەو دورگەيەدا گىرساونەتەوە، يان بلىتىن ھەر لە وساتەى كە خۇدا لەۋى خەلقى كردىن بە دلى ئەم دەريايە نەبۇو، چۈنكە خۇى بە خاوهنى دورگەكە دەزانى، ئۇ دەرورىگەي كە ناسراوە بە دورگەي (ترس و مەرگ). دەرياكەمان خۇى بە گەورەتە دەبىنى لە خودا خەلک و خاک. دىارە دەبايە ئىزىنیان لى بخواستايم، خۇيَايە زيان و ھەلبىزادن و نىشىتەجى بۇنىش ھەر بە ئىزىنە. بەلام تاوانى ئىتمەتى تىدا نەبۇو كە بايپارانمان ئىزىنیان نەخواستووھ.. جى بکەين. خۇ ھەمۇمان بار ناكەين. جا ئەگەر بارىش بکەين.. بەلنى ئەگەر بارىش بکەين ھەمۇى بەيەكەوە.. خۇ لەوانەتى كە بېنگا دەريا غەرقمان بىكتا بۇئەتەتى بەم شىۋەتى

که سیتکه، به هدمو که موکوری به کانیبیوه، بهو شیوه‌یهی که ههیه و لبه‌ر دهستان دایه، نهز لهو بروایه‌دام، نهود که لینه گهوره‌یه له نامه‌خانه‌ی کوردیی و جوگرافیا کوردستادا پر دکاته‌وه، که تاکوو نهوره به بوشی مابووه. به دلنيا ییشه‌وه دیلیتم، هه تاکوو نهدم پهرتتوکه چاپ نهکری و بلاو نهکرته‌وه و پیشکدهش به خوبنده‌واران نهکری، نه لهمه باشترا دنهنوسری و نه هنگاواي دووه‌میش لم بواره‌دا دههاویژری، چونکه نهمه هنگاواي یه‌که‌مه و هنگاواي یه‌که‌میش، هرگیز له که موکوری بددهر نابی.

له کوتاییدا دمهوی، به گوئی خویندهوارانی هیژادا بچریتیم و بلتیم، ئەم بدرهه مه نوییه‌ی له دوو تویی ئەم بدرگه قەشنهنگددا، لەبدر دەستان دایه، بدرهه مه بیست و شەش سال خۇماندوکردن و شۇنخۇنیی و ھەولۇتەقدلای بیتۇچانى د. عەبدوللا غەفوره، كە نۇوسەر بەشىکى زۆرى چىانى تايىېتىي و زانستىي خۆى لەو پىتىناوهدا بەخت كردووه. دەتونام ئەم مافە بە خۆم بەدم و بلتیم، د. عەبدوللا بە تەواوبى خۆى ماندوکردووه و وەک خویندەوار و كادريکى ئەكادىيى، بەو پەرى دەسپاكىي و دلىزىبەدە، بە ئەركى نەتهوھىي و نىشىتمانىي خۆى ھەستاوه. بۆيە ئەگەر چوار سەدە لەمھویر، لە بوارى مىۋۇنۇسىنىدا، دەنگى لە قەلا بەرزە بەردىنەكەي بەدلیسى باکورى كوردىستانەو بەرز بۇويتىتەو، نۇوسەرتىكى بلىمەت ھەل كەوتىن، نوكى خامەكەي لىن تىيەز كەدبىتىتەو، خەمى مىۋۇوى دەتهوھەكەي خوارد بىن، لە فەوتان و بىرچۈونەوە و شاردنەوە و سېينەوە بىزگارى كرد بىن، مىۋۇوەكى سەرانسىرىي نەتهوھى كوردى، بۆنەوەكەنی دواي خۆى و ھەممۇ كۆمەلگەدە مروقاپايدەتىيىش نۇوسىيەتىتەو، لەو يۈزۈگارانددا و ھەتا تاقە كوردىكىش لەسەر زەھى مابىن، ئەو شەرفە گەورەيە، بەر مامۆستاي مىۋۇنۇسوغان و شاسوارى ئەو مەيدانە، ھەزاران جار بەھەشتى مىير(شەرەفخانى بەدلیسى) كەوتىن، ئەوا ھەر وەكۇ پېرىفيستور (مېخاپىل سېرىگىتىشچ لازەريف)، سەرەتكى بەشى كوردىلۈزىيا، لە ئىنسىتىتۇتى يۈزۈھەلاتناسىي مۆسکۆ و چەند زانايەكى دېكەش لەو بىرۋايدان، ئەورۇ لە شارەكەي قەلا و منارەوە، لە شارە ھۆلەكىز بەزىتە دېرىنەكەي پايتەختى فيىدرالى باشۇرى كوردىستانەوە، ئەو پايدە بەرزە لە ھېيىتەنەكەي جوگرافىيەي كوردىستاندا، بە نۇوسەرى ئەم بەرھەمە و براي نۇوسىنەوەي جوگرافىيەي براوە. پېر بە دل پېرىزىبايى لىن دەكەم و ھېتىدارم ھېيىتم د. عەبدوللا غەفور براوە. پېر بە دل پېرىزىبايى لىن دەكەم و سەرەتكەن توو بىن و خویندەوارانى كوردىش، كەللىكى لىن وەرگەن و نۇوسەرىش بە بەرھەمى نوتى دىكە، دلى ھەمۇر لايەكمان و نامەخانە چۈلە كەشمەن ئاواهدان بىكتادۇ.

زانستیی و جوگرافیی، به زمانه کانی کوردیی، عده‌ریبیی، فارسیی، تورکیی، پروسی و نینگلیزیی بدکار هیناوه، که پتر له نوخ و بهای زانستیی بهره‌مه‌کهی زیاد گردودوه.

نهز ترخانی تایبەتییم جوگرافیا نییە، بەلام هەندى باپەتم لەسەر جوگرافیا بە گشتیی و جوگرافیا کوردستان بە تایبەتیی خویندەتەوە. لیتەدا مەبەستم ئەو نییە، و دکوو هەندى نوسەر پیشەکی بۆ پەرتۆکیتیکی دیاریکراو دەنۇسۇن، بە شانیبازو و دەست و قەلەمی نوسەرەکیدا ھەل بەدم، بەلکوو ئەوهى دەیلیتیم و دەینۇسوم، تەنیا راستیبەکی رووتە و ھېچى دیكە. دەتوانم بىن دلەراوکە بلىتیم، نىخ و بەھا ئەم بەرھەمە، زیاتر لەوەدا دەردەکەوی، كە تاكوو ئىستا بەو شىۋىدە لەسەر جوگرافیا کوردستان نەنۇسراوە، كاتىيکىش خۇينەرى كورد ئەم پەرنوکە دەخوتىتىتەوە، خۇى لە ھەموو سوچ و قوشۇنىكى نىشىمانە لەتۈھىتكراوە داگىركەرەکەيدا دەبىنېتىتەوە، ئاشتاپەتىبەكى زۆر گەورە، لەگەل ناواي ھەموو شار و گوند و چىا و گىد و دۆل و تەختايى و چەم و رووبىارى كوردستانەكەيدا پەيدا دەكتات، ئەو كاتە دەزانىت و تىدەگات، داگىركەران بۆچى واز لەم خاکە ناھىيەن. دىيارە ھۆنەرى نىشىمانەپەرورى كوردىش، بەھەشتى (ئەحمدە موختار جاف)، سىيەكانى بە ھەواي سازگارى ئەم كوردستانە د. عبدوللاھ باسى دەكى، خاوىتىن كەردىتەوە، زارى بە ئاوى شىرىن و روونى قومى لە بەفراوى كانياۋەكانى تەپكىردووه، ماندووېتى گىانى شەكەتى لە سايەتى سېتىبەرى دار گۇزىر و بېرۇ و چنارەكانىدا دەركىردووه، شەۋى تارىكۇنوتەكى لەپەر تىشىكى زىبىنى مانگ و جرييەجىرىي ئەستىرەكانىدا رۆژ كەردىتەوە، لەبرى پىيالەمى مەى، سەرلى بە بۇنى گولە نىرىگىس و ھەلالە و شەۋىپۇ و بېبىون و ھەلەكۆك مەست كەردىووه، چاوهەكانى بە دىيەنى سروشتىي كارمازم و دارستانە چۈپىر و قەدپال و چىا رەنگىنەكانى رۆشىن بۇتەوە، گۆتكانى بە دەنگى پە لە سۆز و چىرىكەي مەلە خۆش تاوازىدەكان زىنگاۋەتەوە، بۆيە تاھەقى نەبۇوه و بەخىزىيەنەوارى نەكىردووه، كاتىي دەفرمۇسى:

به خواریان له دهستی به رمهدهن نهム خاکه مه جبوویه  
که تزوی وه که واھیر سورمه و کوھلی به سه رتانه  
به سه رخاک نهگهر نازیش بکەن حەقتانه کوردینه  
تەماشای سیبەری نەو شاخ و کیوە و لەسەرتانه  
بە بى قەدرى بەسەر دیا رامە بیورون حورمهتى بىگرن  
كۈلاڭ سوورەت نەم سەحرایە خوتتاوی حىگەرتانه!  
دەمیکە نەم ولاتە و ائەسپىرى پەنجەجى جەھلە  
لە سايەھى عىلەمەوە نەمۇ ئىتەر نۆبەھى زەقەرتانه  
زوبانى حاتى (نەحمدە) هەر نەلتى وريبا بن نەھى مىيلە  
بىزان يەردى نەم ساخانە نەلماس و گەوهەرتانه(1)

هه رچنهنده ئەم پەرتووکە له هەندى جىيگادا، له لايىكەوه زىاتر پىتىسيتىي  
بە روونكىرنەوە و له سەرنۇرسىن ھەيدى، له لايىكى دىكەشەوە، پىتىسيتىي  
بە بەكارهيتانى ھەندى زاراوهى جوگارانىي گۈجاۋاتر ھەيدى، بىلام لەگەن  
ئەوشدا، حۆنكە ئەم بەرتووکە بىرى، دېنج و ھەولەتقەللى، تەنسا

(۱) دیوانی نه محمد مختار جاف، ثامدکردن و به راوردکردن و لیکدانه و پیشنه کی بُو نووسینی بِرَفِیسُور دوکنور عیزه دین مستهفا ده سوون، چایخانه‌ی الادب، باغلار، ۱۹۸۶، (۱-۱۴۷)،

که موکورییه زور به زهقی، له بهره‌مه کهی د. عبدوللادا دهیزی.  
بهشی دوهمه باهه‌دهکه، له جوگرافیای دانیشتتوانی کورستان ده‌دوى.  
لهم بهشدا، نوسدر به دور و دریشی له سمر لاینه جزو اجوره کانی  
جوگرافیای دانیشتتوانی نوسسیوه، و هکو ژماره‌ی دانیشتتوان، پیکه‌هاته‌ی  
دانیشتتوان و توحه‌کانی، پیکه‌هاته‌ی نایینی، کوچ و په‌کردن و چری  
دانیشتتوان، هیزی کارگه‌ران، دانیشتتوانی شار و گونده‌کان، دیاریکردنی  
سنوری کورستان و یده که تیداریه کان. لیره‌دا نهودی پیویسته په‌نجه‌ی بتو  
را بکیشین، نهودیه، نه کاره‌ی نوسدر، له گهله نه کاره‌ی دیکه‌یدا، که  
پیشتر له ثیز ناوینیشانی (جوگرافیای دانیشتتوانی کورستان)، له سالی  
نهودی شایانی باس بین و پیویسته بازی بدسردا نه‌دهین، نهودیه، بتو  
یده‌که‌مین جاره‌هه میثروی کوردا. د. عبدوللادا بهو شیوه ورد و پر له  
سه‌لیقه‌یهود، بهو دور و دریشیه، له سنوری کورستانی کولیویه‌تموه،  
نه‌ممو سوچ و کون و قوش‌بینیکی نیشتمانه که‌مانی به‌سر کردتنه‌وه، سه‌ری  
له هه‌ممو تاشه بدر و توله ریتگا و نه‌شکوت و کیزه دیه‌ک داهه، و هک  
ساشه به دووی هه‌ممو جوچه و چم و پووباره‌کانی کورستاندا، هه‌ر له  
سه‌رجاوه‌کانیانده تا ریزگه‌کانیان کدوتروه، نه‌خشی سنوریکی  
خوپرسکیی و میثرویی کورستانی بتو کیشاوین، که هه‌ر له سه‌رده‌مه  
زوهه‌کانی داگیرکردنی کورستانه‌وه، هه‌میشه دوزمنان و داگیرکه‌ران  
ویسترویانه، به دهستی تانقدست، مقه‌ستی ریکوئینه خزیانی لی به‌کار  
بهیتن و پارچه‌پارچه‌ی بکدن و هه‌ر پارچه‌یه کیشی، به دهولته داتاشراو و  
ده‌سکرده‌کانی ئیمپریالیزمی ئاغایانه‌وه دادردون. بهو هیواهیه نه کاره‌ی  
نوسدر له دوا رۆژدا، زیاتر گرنگی بین بدری و هه‌ممو لاینه کانیشی پتر  
پرونون بکریتنه‌وه، و هکو ده‌کومینیتیکی میثروییش، بتو ساغکردنه‌وهی  
سنوری کورستان و جیاکردنه‌وهی نه سنوره، له سنوری سه‌زهوبی و  
ئاویی چوار دهولته‌که تماماً بکری و به‌کار بهیتندری، چونکه تاکوو  
ئیستا، ج نوسه‌رانی کورد و ج نوسه‌رانی بینگانه، ته‌نیا باسی سنوری  
نه دهولته‌تانه‌یان کردوه، که هه‌ر چوار دهوری کورستانیان، له رۆژه‌لات  
و رۆژشاوا و باکور و باشوره‌وه ته‌نیوه، هه‌رگیز دهستیان بتو هه‌ممو لاین  
و قولابی و دوورایی نه سنوره رانه‌کیشاوه و به کاریکی بقیان زانیوه،  
ته‌نانه‌ت هندی له نوسه‌رانی کورد و بینگانه‌ش، هه‌ندی له و نیوچه  
میثروییانه لیره‌دا نوسدر، به خاکی کورستان ناویان دهبا، نهوان به  
خاکی یدکن له چوار دهولته‌که‌یان داناوه.

بهشی سیتیه‌می په‌رتوکه‌که، باسی جوگرافیای ئابوری کورستان ده‌کا.  
لهم بهشدا نوسدر، زور به وردی و به شیوه‌یده کی ریکوئینک و به دریشی  
له سدر باری کشتوكال و گیروگرفته‌کانی، چاره‌سدرکردنی کیشی زه‌وی،  
چه‌شنده‌کانی تازه‌ل و گیروگرفته‌کانی و په‌روه‌دکردنی هه‌نگ،  
پیش‌سازی، سه‌رجاوه‌کانی وزه و کانزاکان، هه‌ممو جوچه ریتگه و بانه‌کانی  
زه‌مینی و ناسمانی و ئاویی و جولانه‌وهی باز رگانیبیه جوچه‌جوره‌کانی  
نوسسیوه.

شتبیکی دیکدی کورد، لای رۆلەکانی نه تهودی کورد و گەلانی جیهان، تەماویی و گوماناویی بکەن.

٤. تاکوو نیستا له کوردستاندا، پینوسیتکی یەکگرتتووی کوردیان نیبە. هەندى دەنگ له ناوە جوگرافییەکاندا ھەن، تەگەر به پیتى لاتینى نۇوسرابن، ئەوا به پیتى عەربى نانۇوسرىتەنەو، به پیتچوانەشەو ھەر راستە، چونکە جارى وا ھەيد، ناوى جىتگایەک ياخود كەسیتک، به زیاتر لە پینوسین نۇوسراؤه. بۆ نمۇونە، بدلیس، بدلیس، بیتليس. سلیمانى، سلەمیانى، سولەمیانى، سولیمانى، سلیمانى. ئادىبەمان، ئادىبەمان ... تاد. لېرەدا نۇوسمەر زۆر ھەولى داوه، كە يەك پینوسى یەکگرتتوو، بۆ نۇوسيئەنەوەي ھەممۇ ناوەکان پەپەو بکات.

٥. بۆ ئەوەي سەرچاوهیدەكى باوهەپیتکراو و رەسەن، دەست نۇوسران بکەۋى، هەندى جار كاتىتکى زۆرى دەۋى. وەکوو نۇوسمەرى ئەم پەرتۈوكەش بۇي باس كردم، بۆ ھەندى سەرچاوه و كەرسەمى ئامارىي جوگرافى، لەسەر دەولەتكانى تۈركىيا، ئېرەن، عىراق و سورىيا، جارى وا بىروه، ھەتاکوو دەستى كەرتۈوه، پېتىج سالى خاياندۇوه، كە ئەوانەشەنەندى جار ناتەواو بۇون.

لە كاتى نۇوسيئى ئەم پەرتۈوكە نوتىيەدا، نۇوسمەر ھەمان پېتازى جوگرافىزانەكانى لەبەرچاوه گرتۇوه، كە بۆ نۇوسيئى جوگرافىي و ولاتەكانى تۈركىيا، ئېرەن، عىراق و سورىيا پەپەوھىيان كەرددووه. ئەم پەرتۈوكە لە سىن بەشى گەورە پېتک ھاتۇوه، ھەر بەشىتکىشىيان بۆ بايەتىكى تايىھتىي و جىاواز، تەرخان كراوه.

بەشى يەكمى باسەكە، بۆ نۇوسيئى جوگرافىي سروشتىي کوردستان تەرخان كراوه. لەم بەشىدا، بە دورۇ و درېتىلى لەسەر شوتىنگەي جوگرافى، ستركتورى جىئۆلچىجا، بارى تىپىقىرەتلىكى كوردستان، ئاۋوهەوا، سەرچاوهەكاني ئاۋ، پۇشەكى پۇوهەكىي، ئاۋەلتى كېتىي و جۇرى گل لە كوردستاندا نۇوسراؤه. ئەندەدى نۇوسمەر توانىيەتى، نۇوسيئەنەي بە ناوى شارى گەورە و گچكە و شارقۇچكە جۆريە جىز و گوندە دلەپەنەكەنەكاني كوردستان و دۆلەتلى قول و شىوي مەنگ و بە زنجىرە چىاى بەرزى سەرکەش و گىرى خنجىلانە و دەشتايىي پانويەرين و دارستانى چېر و چىمەنلى سەۋىزى گىيا و چەپكە گولى رەنگاۋەنگ و رېحانەي بۇنىخوش و فەرشى سەۋىزى لەوەرگاكان و جوکە جەرىيەتى بالىنە و بارەپوباعەي ئاۋەل دىمەنلى جوانى كەفچىتنى تاشقە و قەلبىزى سەرچاوه و بىرسىكى زىختى نېتىو كانىيە رۇونەكانى کوردستان را زاندۇتەوە، بە درېتىلى باسى ئەو بابەتانەي كەرددووه و ھەولى داوه و تېنەيەكى راست و دروست، پېتىش چاوه خۇپىندەوارانى نەتەوە كەمان بىخات. بەلام بە داخەوە، لە لايدەكەوە لەبەر نىبۇونى سەرچاوهى تەواو و پېتىپەست، لە لايدەكى دىكەشەوە لەبەر ئەوەي مېتىتىدى جىاواز پەپەو كراوه، لە ھەندى شوتىندا، كارتىكى واي كەرددووه، كە ھەندى بابەت بە ناتەداویي بېتىتەوە، ياخود بە كەمۈكۈتى لەسەرى بىنۇوسى. بۆ نمۇونە باسى گل لە کوردستاندا، نۇوسمەر زۆر بە كورتى لېتى دواوه، لەبەر ئەوەي تاكوو ئەۋۇر لېتكۆلىنەوەيەكى زانستانەي گشتىي دەپەنە، لەسەر گللى نېتىچە جىاجىاكانى کوردستان، لەبەر دەستى يەکگرتتوو، لەسەر گللى نېتىچە جىاجىاكانى کوردستان، لەبەر دەستى خۇپىندەواران و نۇوسراندا نېبە، تا وەکوو پېتىپەست لە نۇوسيئەكانىدا، وەك سەرچاوهیدەكەللىكى لىن وەرگەن و دەستى بۆ راکىشەن، ئەم

ددين:

۱. تاکوو ئەورق، نەتەھەدی کورد خاوهنى دەولەتىكى ناسىپوتانالى يەكگەرتوو نىيە، كوردىستان وەكەو وولاتىن، سۇنۇرىتىكى دەستىشانكراو و چەسپاۋ و دانپىددار اوپىرى نىيە. بۇئەھە كاتىن نۇرسەرلى دەيدەونى، باسيك لەسىر جوگرافىيائى كوردىستان پېشىكەش بىكات، گەللى كەند و كۆسپى لەبەر دەمدە قۇروت دەپەتتەوە، هەر نۇرسەرەشى لە ناچارىدا بىن، يَا لەبەر بىرژەندىبى تايىەتىي خۆى و نەتمەدەكەدە بىن، لە پوانگەدە تايىەتىي بىرۈراكانى خۆيەدە، شىتەكان دەبىنەت و قۇرى بابا تەكان بىسىر يەكدىدا دەشىلىن و باسەكەدە خۆى دەنۇرسىن و تىزىدەكانى دادەپىشى، كە لە ئەنجامدا، چەندىن دىد و بىچۈونى جىياواز پەيدا دەپىت. دىيارە ھەمۇ ئەو گىرەوگرفتەنەش، لە دەركەدە نۇرسەرلى ئەم بەرھەمەشى داوه، بەلام لېتەدا نۇرسەرلى ئەم پەرتۈوكە، بۇ چارەسەر كەنلى ھەمۇ ئەو كەمۈكۈپى و ناتەواوبى و تەنگۈچەلەمانە، لەسىر جوگرافىيائى ئەو وولاتى نۇرسىيە، كە بە بىرۋاى خۆى بە خاكى كوردىستانى دادەنلى.

۲. سه رچاوه ره سنه کانی جوگرافیای کوردستان، هم موبیان به زمانه کانی تورکیی، فارسیی و عده بیی نوسراون. نه گر نووسه ریکی سه رکه و تورو بیهود، کاریکی زانستانه له سر کوردستان به نهنجام بگهیه زنی، پیوسته شاره زاییه کی تهواوی لهو سین زماندا هه بین. نووسه ری نهم په رتورو که، جگه له زمانی تورکیی، که ئاشنا یاه تبییه کی کەمی له ته کدا هه بیده، هه دردو زمانا کەدی دیکه به چاکی ده زانیت. له کاتی به کارهیتانا سه رچاوه تورکیی کانیشدایا، یه نای یو بر ورگی اوه رو و سیه کانیان بر دودوه.

۳- کۆزکەندنەو و وەرگىرن و بەكارھەتىانى كەھرەسەئ ئامارىي لە سەرچاواه رەسەنە كانياتەوە، جىگە لەوەي كاتىتكى زۇرى ھەر نۇو سەردى دەگرى، لە ھەمان كاتىشدا خۆى لە خۇيدا، بە كارىتكى ورد و گۈنك دادەنلىق و بە كېرىۋەرفىتىكى مەذن لە قەلەم دەدرى. بۇ غۇونە، ئەگەر لىتىكۆلەر بىبەوى، لەسەر كۆتى ديازەدەيەكى جوگرافىيى كوردىستان بىنۇسىن، وەككە ژمارەدى گشتىيى دانىشتووان، بەرھەمى سالانەي بەرۇپومىتىكى كشتوكالىيى دىيارىكراو، بەرھەمى سالانەي نەوت، بەرھەمى سالانەي يەكىن لە پېشەسازىيە جۇزا جۆزە كانى كوردىستان ... هەندى، ئەوا لەو كاتانەدا، دەبىن نۇو سەر زانىيارىي لەسەر (۳۰) سى پارىزىگايى كوردىستان، كۆ بىكانەدە و شىبيان بىكانەدە. پارىزىگايى واش ھەيد، ھەممۇ شارۆچكە كانى ناكونەن نېتى خاڭى كوردىستانەوە، يان بە پىتچەوانەوە، تا ژمارەي ئەو شارۆچكەنەش، لە گەل ژمارەي سەرچەمى پارىزىگا كاندا كۆ بىكانەدە، ياخود لېيى دەرىكا. ئەم كارەش ھەرگىز بۇ كەس سەرناڭىرى، لەبىر ئەمە ئەو جۆزە ئامارە پېتۈستىانە، لە لايدىن دەزگا كانى دەولەتە داگىر كەرە كانەدە، وەككۇ پېتۈست بىلاو ناكىنەوە و دەست ناكون، جىگە لەوەي ئەمەشى لەسەر پارچە كانى كوردىستان بە جىاجىا بىلاوى دەكەندنەوە، مەرج نىبىھ ھەممۇي راست بىن، بەللىكۇ ئەگەر زۆرىمەي زۆرىشى ھەلتە نەبىن، ئەوا لە ۵۰٪ ئى دروست كراوه، چونكە ھەر زۆر لە مىۋە، داگىركەرانى كوردىستان دەستيان بە پېرىسىسى تۈركاندىن و فارساندىن و عەرەباندىنى كوردىستان كەرددوو و دان بە خاڭىكىدا نائين، كە لە دەولەتە كانى خۇيان جىما بىن، بۇئە بە ھەممۇ تونانىانەوە ھەولى دەدەن و دەيانەۋى، پۇوي گەشى نەتمەۋىي نەخشەي خاڭىك، كە دەستان شىشتەن و حۇڭقىسا ، مىتە، وەككەش، وەككە ھەممۇ

دهبیت دان بهوهشدا بینین، که نووسین لەسەر جوگرافیای کوردستان، هەروا کاریتکی ئاسان نیبیه و له دەست ھەمۆ نووسەرئى نایدەت، بەلکوو ھەتا بلیتی کاریتکی سەخت و دژوار و پې ئالقۇزە. بقىيە ئەمە كەسى بىبەوى، لەسەر جوگرافیای کوردستان بنووسى، دەبىن زۆر بە ئارام و خۇزىاگىر بىن، زانیارىبىه کى تەواوبى لەسەر جوگرافیای کوردستان و ھەر چوار دەولەتە داگىرکەرە کە ھەبىن، ئەم خەسلەتەش، وەكىو ئاشكرايە لای ھەممۇان، ھەتاکوو ئىستا، نە لە جوگرافىزانە کانى كورد و نە لە جوگرافىزانە کانى گەلانى دىكەدا نەببود. چونكە کوردستان ئەم وولاپەتىدە، كە نزىكىدى پېتىج سەددەيدە داگىرکەرە کراوه، لەتۈپەت كراوه و ھەر كوتىكىشىيان بەسەر دەولەتىتىكى داگىرکەرە رى چاچۇنچىكدا بەخشىۋەتەدە. لە سالى (۱۹۶۴) دەولەتىتىكى داگىرکەرە زايىنى، خاكى کوردستان لە نىيەن ھەردۇو ھەتاکوو سالى (۱۹۲۵) ئىزايىنى، خاكى کوردستان لە نىيەن ھەردۇو ئىمپراتورييەتى عوسمانى و سەفەويىدا (كە دواتر بۇ بە ئىرمان) دوو كوت كراوه. لە چارەكى دووھەمى سەددە بىستەمىشە و ھەتاکوو ئىستا، لە لايەن ئىمپېرىالىزمى جىهانىبىه و، بەسەر دەولەتە داگىرکەرە کانى تۈركىيا و ئېرمان و عىتاق و سۈرۈپا دابىش كراوه. داگىرکەران ھەميشە ھەولىيان داوه، راستىي پېشىتىل بىكەن و مىئۇووی كورد بىشىۋېتىن و جوگرافياكەشى نەھىيەن. ئەم پۇوداوه گىنگە مىئۇووی يە، لەسەر نەتەوەي كورد زۆر كەتوو، ئەم بارە ناھەمۆارە لە دواي جەنگى يەكەمىي جىهانىبىه و، داگىرکەران بەزۆر بەسەر کوردستانىاندا سەپاندۇوە، كارىتکى وا لە ھەست و ھۆش و بېرىۋاھرپى نووسەران و شارەزايانى جوگرافىيائى لەبرى ئەمە لە نووسىنە جۆرىدەزەرە کانىاندا، باسى جوگرافىيائى سەرانسەربى کوردستان بىكەن، تەنبا لە پوانگە يەكى تەسکى ھەرتىمايەتىيەوە، لە جوگرافىيائى بەشىكى کوردستان ياخىلى كورد دواون و تاكوو ئەدورۇش ھەر پەپەھەن ئەم رېتىازە دەكەن. ئەم نووسەرانە بەم كەرده دەيدىان، زىيانىكى زۆر گەورەيان بە خۇيان و نىشتمانە كەيان گەياندۇوە و دەگىيەن. بەلام نووسەرى ئەم بەرھەمە، وەكىو ھەممۇو كارەكانى دىكەي پېشىسوی، شەقللى ئەم شىۋاژە نووسىنە شەكەن دۇوە و شۇن پېتى بەھەشتى (شەرفخانى بەدللىسى) ھەل گەرتۇو، ھەرۋە كەن ھەممۇو كەلە نووسەرى مىئۇووی كوردىمان " شەرفخان "، چوار سەدە لەمەوبىر ۱۹۹۶-۱۹۹۶ ( زايىنى، لە بوارى مىئۇونو نووسىندا، ئالاھەتلەڭرى ئەم رېتىازە بۇوە، پاشتىرىش مامۆستاي زانا و بلىمەقان، بەھەشتى " مەممەد ئەمەن زەكى " لە سالى ۱۹۳۱، لە نووسىنەوەي مىئۇووی كورد و كوردستانە كەيدا، بۆ يەكەم جار ئەم رېتىازە گەرتۇنە بەر و ھەر دووكىيان مىئۇوویەكى سەرانسەربى نەتەوەي كوردىيان، بۆ ئىتمە و نەوە كانى داھاتوو و دۆست و دۈزمنانىش تۆمار كەدووە.


# هەنگاوی بەکەم و سەرەتاي کارىكى مەزن

لە راستىدا، دەربارەي جوگرافىيى كوردىستان، گەلەن شت نۇوسراووه، بەلام بەشى هەرە زۆرى،  
لە چوارچىتەوە ئەم بىسانەدا دەخولىتەوە، كە لەسەر جوگرافىيى چوار دولەتە داگىركرەكە  
(تۈركىيا و ئىرماق و عىتران و سوورىيا) نۇوسراوون.

كوردىستان تەرخان كردوو، گەلەن ووتار و پەرتۇوكى لەسەر جوگرافىيى  
كوردىستان، بە زمانەكانى كوردىيى و تۈركىيى و پووسىيى نۇوسىيىوو، كە  
دەتوانم بە راشكاوبىي بلىم، زۆر دەستايانە و شاردزايانە، لەم مەيدانەدا  
ئەسپى خۆتى تاو داوه.

ئەوهندەي من ئاكادار بىم، تاكىو ئىستا، ج لە لاين نۇوسەرانى كورد و ج  
لە لاين نۇوسەرانى بىتگاندە، جىڭ لە چەند كەسيتىكى كەم نەبىن، كە  
ئەوانىش بە پەنجەي دەست دەزمىتىرىن، ھېچ كەسىن وا بە دۇر و درىشى  
و تىپوتەسەللىي و بە شىۋىز زانستانىيە، لەسەر جوگرافىيى كوردىستانى  
نەنۇوسىيە. ئەودى هەمانە، تەنبا چەند بەرەمەتىكى مامۆستا فۇراد حەمە  
خورشىدە، كە بە زمانى عەزىزى نۇوسىيەتى، ئەۋىش جىڭ لەدەسىن  
جوگرافىيى سەرانسەرىي كوردىستان نەداوه، بىلکوو لە ھەر سىن  
بەرەمەكەيدا، تەنبا باستىكى كورتى دەربارە كورد و دابەشبوونى  
زاراوه كانى كوردىيى و تىچىجە پىشىرەتلىكىش كردوو، ئىدى ھەرچى  
ئەم لېتكۈلىنەوانى دىكە ھەيدە، ناتوانىن ھېچ كامىكىيان بە  
لېتكۈلىنەۋەكى سەرانسەرىي و زانستانى دابىتىن، كە لەسەر جوگرافىيى  
كوردىستان نۇوسرا بىت.

لە راستىدا، دەربارەي جوگرافىيى كوردىستان، گەلەن شت نۇوسراووه، بەلام  
بەشى هەرە زۆرى، لە چوارچىتەوە ئەم بىسانەدا دەخولىتەوە، كە لەسەر  
جوگرافىيى چوار دولەتە داگىركرەكە (تۈركىيا، ئىرماق، عىتران و سوورىيا)  
نۇوسراوون، بەشىتىكى زۆر كەمىشى، لە جوگرافىيى ئەم بىسانەى  
كوردىستان دەدوى، كە بەسەر چوار دولەتە داگىركرەكەدا دابىش كراون.  
واتا هەتاڭو ئىستا، نۇوسەران و شارەزايان و جوگرافىزانان، باپەتىكى  
تايىەتىيى جوگرافىيى سەرىيەخۇيان، لەسەر كوردىستان وەكىو يەك وولات و  
يەك خاڭ نەنۇوسىيە. بۆزى دەتوانم بلىم، لەم پوووه ئەم پەرتۇوكە،  
لەوانىيە يەكەم ھەنگاوشىنى، كە د. عەبدوللا بۆ نۇوسىنىن جوگرافىيى  
كوردىستان ناوتىتى.



دەكتور ھۇسەن سەمەدە ئازىزى

ئاشنايەتىم لەگەل د.عەبدوللا غەفوردا، زىاتر لە رىتى بەرەمە كانىيەوە  
پەيدا كرد. سەرەتاي ئاشنايەتىيەكەمان، بە ھەردوو ووتارى ( دابەشبوونى  
ئىدارىي كوردىستان) و دواترىش (كوردىستانى سوور - پىتىكەتان و  
ھەلۆشانىدەنەوە) دەستى پىن كرد، كە ووتارى يەكەميان لە گۇشارى  
(پۇوناكىيەرى) و دووهەميشيان لە گۇشارى (راپۇون)دا دا بلاو كرالەوە،  
بە تايىەتى كاتىن لە سالى ۱۹۹۵ دا داواى لى كردم، لە پووى زمان و  
دارىشتەوە، چاۋى بە پەرتۇوكى (ئەتنىت - دېتەن - دېتەن - دېتەن)  
كەيدا بەخشىتىم، ئىدى بە تەواوىي دۆستايەتىيەكەمان گەرم بۇو، بە  
چاكييىش لە يەكدى شارەزا بۇوىن.

ئەگەر سەرنجىتىكى وردى سەرچەمە كەنەن نۇوسەر بىدەين، ئەوا زۆر  
بە رۇونى بۆمان دەرەدەكەوى، كە د. عەبدوللا ھەر لە سەرەتاي  
حەفتاكانەوە، ھەواى خوتىنەوە و نۇوسىن لە كەللەدى داوه، كاتىن لە  
گوندى (بارزان) مامۆستا بۇوە، ھەولى ئەندى زانىيارىي دەربارەي  
ھۆزى كەورە و ناودار و بە دەسەلاتى (بارزان) و گوندى (بارزان) كۆ  
بىكاتىدە، كە پاشتىر دواي بىست و دوو سال، لە زېر ناونىشانى (بارزان  
چۈن دىت)، لە كوتايى سالى ۱۹۹۵ دا، لە شارى سەتكەھەلەم بە چاپى  
گەياندۇوە. نۇوسەر بەشىتىكى زۆرى زيانى تايىەتىي خۆتى، بۆ خوتىنەوە و  
تۈپۈزىنەوە و لېتكۈلىنەوە و نۇوسىن و بىردىنەوە سەرىيەكى جوگرافىيى

- کورد و ئەرمن" بە پێنوسی ئەحمد سید علی بەرزنجی، ل: ٧.
- (١) کۆمەلە شیعری حاجی قادر کۆمی، بەغدا ١٩٢٥، ل: ٥١.
- (٢) ن. نا. خالفین، خەبات لە پى کوردستان، وەرگىزى لە رووسىيەوە: جەلال تەقى، سلیمانى ١٩٧١، ل: ١٦.
- (٣) میريللا گەلتىكى، كورد و كوردىستان لە نۇرساوهكانى ئىتالىدا لە سەددى سىزىدەم-نۇزىدەم، وەرگىزىرانى لە ئىتالى: جاسم توفيق، سىتكەلم ١٩٨٧، ل: ٤٢.
- (٤) كەتلۇڭى سويدى: كوردىستان، وىنە: ن. كاسريان، تىكىست: ز. ئارشى، ك. زېبىحى، سويد ١٩٩٠، ل: ١٥.
- (٥) مامۆستايى كورد، زماره ٦، بەهارى ١٩٨٨، گفتۈرىكى لەگەل كوردىناسى سۇقىيەتى بەناوبانگ م. س. لازارىف، ئەنور قادار محمد لە رووسىيەوە كردۇوييەتى بە كوردى، ل: ١٨.
- (٦) دراسات كردىي، المعهد الكردى-باريس، العدد ٢-١، السنـة الثانية، كانون الثانى ١٩٨٥، مقاله: "خيارات للسياسة السوفيتية تجاه المسالـة الكردى" بقلم: ن. يىنكىس، ص: ٧٥.
- (٧) م. ر. هاوار، شىخ مەممۇدوى قارەمان و دەولەتكەي خواروبى كوردىستان "بەرگى يەكمىم"، لەندەن ١٩٩٠، ل: ٢٠٩.
- (٨) كمال مەزھەر ئەحمدە، كوردىستان لە سالەكانى شەپى جىهانى يەكمەدا، چاپخانەي كەزى زانىارى كورد، بەغدا ١٩٨٥، ل: ٢٥.
- (٩) بېيىف زماره ٤ نيسانى ١٩٨٦، ل: ٥٩٨.
- (١٠) هەمان سەرچاوه، ل: ٦٦٠.
- (١١) هەمان سەرچاوه، ل: ٥٩٨.
- (١٢) كاسىتى رادىقى كوردى لە ئۇسترايا، ئۆكتۆبىرى ١٩٩٠.
- (١٣) بەربانگ، زماره ٦١، نوقىنېبرى ١٩٨٩ و تارى "پەرسىتەرىكا و بارى ئىانى كوردىكانى سۇقىيەت و داخوازىيەكانىان" بە پێنوسى: د. جەمشىد حەيدەرى، ل: ٤.
- (١٤) هەمان سەرچاوه، ل: ٤٤.
- (١٥) هەمان سەرچاوه، وەتى نادىرى نادرقۇ، ئەندامى ئەكاديمىي زانىارى لە بەردهم كەنفرانسى پاريس، ل: ٦١.
- (١٦) خالد خالد، السیاسە السوفیتیه تجاه القضیە الكردىي فی المیزان، سۇكەلم ١٩٩٠، ص: ٤٧-٤٦.
- (١٧) تومابوا، زيانى كوردەوارى، ئاواز زەنگەنە لە فەرەنسىيەوە كردۇوييەتى بە عەربى، حەممە سەعید حامە كەريم لە عەربىيەوە كردۇوييەتى بە كوردى، سلیمانى ١٩٨٠، ١٩٨.
- (١٨) بۇ زىيات ئاگادارى بروانە:
- گۇشارى پەرنەنگ، زماره ٥، سال ٤، مانگى يەكى ١٩٩١، و تارى: "سینەماي كوردى و كورد لە سینەمادا" نووسىنى: بۇرھان شاوى، وەرگىزانى لە عەربىيەوە: سەيدا، ل: ٢٤.
- (١٩) بېيىف، زماره ١، ئادارى ١٩٨٦، ل: ٨٢.
- (٢٠) دەنگىن كوردىستان "صوت كوردىستان"، هەزىمار ١٩٨٧/١٠/٢٠، ل: ٢١.
- (٢١) مسعود البارزانى، البارزانى والحرکە التحررىي الكردىي ١٩٤٥-١٩٥٨، كوردىستان ١٩٨٧، ص: ١٠٥.
- (٢٢) بېيىف، زماره ٤، نيسانى ١٩٨٧، ل: ٦٠٠ و ٦٠١.
- بەرخۇدان، ھەپىئەتىك بە عىسمەت شەريف ئاثانى بە، ١٩٩٠/١١/٣٠، بۇوېل: ٢١.
- (٢٣) بەربانگ، زماره ٦١، ل: ٦٣.
- (٢٤) بېيىف، زماره ٤، ل: ٦٠٦.
- (٢٥) بېيىف، زماره ٤، ل: ٦٠٦.
- و دەرەوهى ولاتىش. ھەلبەتە ئەمەش سەركەوتتىك بۇو بۇ كوردىكانى سۇقىيەت. لەم دوايىەشدا زقد كۆر و كۆمەلەي كولتورى كوردى لە سۇقىيەت دامەزراوه بۇ نموونە كۆمەلەي "پۇناھى" لە گورجىستانى سۇقىيەت. لە سەر ئەم بابەتە و سیاسەتى سۇقىيەت لە مەرسەلەي كورد ھەتا بلېتى قولۇ و لەم وتارەدا جىڭىز نابىتەوە. بىنچە لە مەش مەرسەلەي كورد لە سۇقىيەت بە تەواوەتى دەنگى نەداوەتەوە... بارى كوردىكان لە سۇقىيەتىش لە زور پۇوهە گەنەرداوە بە بارى گشتىتىيەوە." (٢٤)
- زقد پاست و پەوايە كە بىگىتى كوردىكانى سۇقىيەت، نەوەكانى يەكى لە ھەرە چەسۋاوهكانى كۆمەلگەي كورد، ئىستا سەركەتووتلىرىن و خۇنەدارلىرىن بەشى گەلى كوردىن پەرەسەندىنى كولتورى و ئابۇورى بە ھىچ شىۋىيەك نەبۇتە هۇي ئەوهى بىنە رووسى يا سىمای نەتەوەيى خۇيان ون بەكەن (٢٥).
- لە كوتايىدا ھىۋادارم تاونىيەتىم باسىكى سەرپىتى و گاشتىم دەربارەي كوردىكانى سۇقىيەتى جاران پىشىكەش كەردىبى، ھەلبەتە ئەم بابەتە لەوانەيە بى كەم و كەرىپىش نەبى، بەلام كورد گۆتنى: كەس لە پرى نەبۇوه بە كورپى!
- پەراوىز و سەرچاوهكان:**
- (١) محمد ئەمين زەكى، كورد و كوردىستان، چاپخانە دار السلام، بەغدا ١٩٢١، ل: ٨.
- (٢) ف. ف. مينورسکى، الکراد، ترجمە و تحقیق د. مەعروف خەندار، بەغداد ١٩٦٨، ص: ١٢.
- (٣) كەپس كەچىرا، مىژۇوى كورد لە سەددى ١٩-١٢٠-١٢١، وەرگىپ: محمد ريانى، چاپخانەي كاروان، بەهارى ١٣٦٩ تاران، ل: ٢٣.
- (٤) جەمال نەبەز، كوردىستان و شۇرىشەكى، كوردق لە ئەلمانىيەوە كردۇوييە بە كوردى، بىنكى چاپەمنى ئازاد، سويد ١٩٨٥، ل: ٣٦٤.
- (٥) ش. ب. ب. سۇرەكلى، ئەم و پرسا مە، وەشانىن جەلادەت بەردىخان، سەدىنى، ل: ٤٥.
- (٦) صەلاح بدرالدين، الکراد شعبا و قضىيە، رابطە كاوا للثقافە الكردىي، الطبعه الأولى، ١٩٨٧، بيروت-لبنان، ص: ٩٨.
- (٧) بېيىف زماره ٤، سال ١، نيسانى ١٩٨٦، و تارى: كورد لە يەكتى سۇقىيەتدا، نووسىن: كەندال نەزان، كەپىنى لە ئىنگلەزىيەوە: سەلام عبدوللا، ل: ١٠٥.
- (٨) بۇزۇنمەيى "الاستقلال" لە زماره ١٢٥٨/١ ١٩٣١/٢/١ تىايىدا ھەوالى بەستى كۈنگەرى ھاوېشى كورد و ئەرمەنلى لە پاريس بىلە كەنگەرىتەوە و دەلى: لە ئەرمەنلىيەكان ئەوانەي بەشدارىيەن كەپىن پاشاي ئەرمەنلى، واهان بابەزىان، هادىا بېگ و فەھۋانىياب بېگ، لە كوردىكانىش شەريف پاشا و د. شۇكىرى محمد بەگ... هەندى. هەروەها ئە كۈنگەرى بېيارى دانانى لېزىنەي كى بەدواجۇنون "مۇتابەعە" داوه و لە بېيرۇوت كۆدەيتىو و لە وىش دىسان بۇپىن پاشا ئامادە دەپىت.
- (٩) "تروشاڭ = ئالا" بۇزۇنمەيى كى ئەرمەنلى بۇوه، ئۇرگانى "تاشنەقىكىان" بۇوه، لە جىنۇو لە ئىتالىدا دەرەچۇو. تاشناق حىزىتىكى بۇرۇزازى نەتەوەيى ئەرمەنلىكان بۇوه و لە سالى ١٨٩٠ دامەزراوه.
- (١٠) كاروان زماره ٦٨ ئەيلوولى ١٩٨٨، و تارى: "سەرچاوهكانى نۇى دەربارەي

کوردیش له دهستووری بنه‌پهتی سوقیه‌تدا تومارکرا که میلله‌تانی سوقیه‌تی یه‌کن. له سالی ۱۹۲۳دا به هاواکاری لینین له ئازه‌ربایجاندا کوردستانی سوقیه‌ت دامه‌زینرا که پایته‌خته‌که‌ی شاری لاجین بوو.

**ئه‌وهمان بۆ ئاشکرا ده‌بیت که په‌یدابوونی**  
**کورده‌کان بەشیوه‌یه‌کی گشتی لە ڙووسیا**  
**دوای دوای بەستنی په‌یمان‌نامه‌ی**  
**گولستان"بووه**

قوتابخانه‌ی کوردی کرایه‌وه، کتیب به کوردی چاپ کران، نووسه‌رانی کورد به زمانی خویان دهیاننووسی، تیاترقی کوردی دروست بوو، ئه‌مانه هه‌موو بق کوردان شایی بون، به‌لام شاییه‌که‌مان زوری نه‌خایاند، له سالی ۱۹۲۹ کوردستانی سوقیه‌ت هه‌لوه‌شیندرا...” (۲۵)

“ئه‌ریستوشا” ده‌لیت: “کوردستانی ئازه‌ربایجان بريتی بوو له ناوچه‌کانی لاجین، گول بازار، گفتولین و زینگیلان. پاشان له سییه‌کاندا ئه‌م ناوچانه ناونران به هریمن کوردستان. ده‌توانی ده‌ست نیشانی ئه‌و بروسکه‌یه‌ی لینین بکری که بق سه‌رکوماری ئه‌و کاته‌ی ئازه‌ربایجان -ن. ن. هریمان‌نوف-ی ناردووه و له بېرگى ۴۵ لایه‌ر ۲۲ کاره‌کانی ته‌واوی لینیندا هاتووه: پیویستی یارمه‌تیدانی هه‌زارانی ڦولگوگراد و کوردستان به سه‌رجه‌مى ۴۰ ملیون روبل.” (۲۶)

ئه‌وی شایانی باسه “ حاجی جندی ” که له سالی ۱۹۰۶ له دایک بووه، “ئه‌مین عه‌بدال ” که له سالی ۱۹۱۰ له دایک بووه، هدووکیشیان ماموستابوونه و شیعره‌کانیان بابه‌تی قوتاچانه‌یان تیدابووه (۲۷)

کورد له سینه‌مای سوقیه‌تیشدا باسی کراوه، بق نمونه فلیمی “له ژیز ده‌سه‌لاتی کوردان ” که له سالی ۱۹۱۵دا ئاماذه‌کراوه و باسی پووداوه دلته‌زینه‌کانی ئه‌و کاته ده‌کات به تایبه‌تی پووداوه‌کانی سه‌ره‌تای جه‌نگی جیهانی یه‌کم (۲۸).

کورده‌کانی سوقیه‌ت هه‌میشه شانازییان به خه‌باتی نه‌پساوی گله‌که‌یانوه کردوه له پارچه جیاجیاکانی کوردستاندا و بېپیتی توانا و لیهاتووی خویان و ئه‌وهی له ده‌ستیان هاتبی ئه‌نجامیان داوه له پینتاوی خزمه‌ت کردنی فرهنگ و ئه‌دېبی کوردیدا و بېرهو پیشنه‌وه بردنی و راژه‌کردنی مه‌سله په‌واکه‌ی میلله‌ت‌که‌مان. ماموستای ره‌حمة‌تی قه‌ناتی کوردق فرمویه‌تی: “ئیمه‌ی کوردی سوقیه‌ت شانازی به خه‌باتی شورشگیزیانه کوردی عێراقه‌وه ده‌که‌ین” (۲۹) ئیزگه‌ی رادیوی کوردی له په‌ریفان به سئی بەش له بەرواری ۲۵-۲۶ ئاب و ۲۵ ئیلوولی ۱۹۸۷دا باسی باکووری کوردستان و چالاکیه‌کانی پیشمه‌رگه کورده‌کان و جه‌نگی پارتیزانی له کوردستانی باکوور کردبوو (۳۰). هه‌روهه کاتی خوی بارزانی توانيبووی: له سالی ۱۹۵۶ گه‌شتیک بکات بق کوماری ئه‌رمینیای سوقیه‌تی و

زور کم و کورتییان تیندا دهکری. هلهبت کاتی بین باسی ژماره‌ی کورده‌کان له کوماره‌کانی سوقیه‌تی پیشودا بکهین ئوا زیاتر تووشی مه‌سه‌له‌ی تر دهین. ژماره‌ی دانیشتوانی کورد "له سالی ۱۹۷۰" بهم جوهری خواره‌وه دیاری کراوه(۲۱):

ئەرمىنیا ۳۷۴۸۶ کەس.

ئازه‌ربایجان ۱۵۰۰۰ کەس "کەمتر بخەمیتنه".

جۆرجیا ۲۰۶۹۰ کەس.

کازاخستان ۱۲۳۱۳ کەس.

قەرقە ۷۹۴۷ کەس.

تورکمانستان ۵۰۰۰۰ کەس.

کۆ ۲۷۸۴۶۳ کەس.

بەپرسیاری رادیقى کوردى لە يەریفان بەپیز ئەحمدەدی گوگىن یوسفیان دەبیزیت: "لە ئەرمەنستان ۶۰۰۰ کورد دەزین." (۲۲) بىنگومان ئەم ژمارانە کە لە سەرەوه پیشان دران ئەوه نەگىيەن کە دەقاودەق پاستن. بە پىچەوانەوه لە وانەيە زور کەم و کورتییان لى بەدى بکرى، بەلام هەر چۈنىكى بى لە نەبوون باشتن، وە هەر ئەم ژمارانەشمان لە بەر دەستدابۇن.

بەگویرەي ياداشتى کورده‌کانى سوقیه‌ت خۆيان ئىستا کورد نەك لە سى يالە چوار يا پىنج كۆماردا، دەزین(۲۳)، بەلكو: "دابىش كراون بە سەر نۆ كۆمارى جىاواز." ئاشكرايە ئەوهش ھېنديە تر مەسىلەي ژمارەي کورده‌کان كەم بکەنەوه و ترس و تىرور بلاويكەنەوه لە نىو کورداندا. ئەم کارەش بە تايىھەتى لە ئازه‌ربایجاندا خۇى دەنۋىنەت. بۇ نەمونە شاڭرىقى مەنۇسىت: "بە پىتى ئامارى سەرژەنلىرى سالى ۱۹۲۱ ژمارەي کورد لە ئازه‌ربایجاندا ۲۷۷۸۰ کەس بۇوه و لە سالى ۱۹۲۶ ژمارەيەن گەيشتۇتە ۴۱۰۰ واتا لە ماوهى پىنج سالدا لە ئازه‌ربایجان كورد تەنبا چوار هەزارى زىياد كەدووه. لە سالى ۱۹۲۹ ژمارەي کورد لە ئازه‌ربایجان گەيشتتە ۶۰۰۰ کەس، واتا ۳۵۰۰ کەس كەمتر بۇوه لە سالى ۱۹۲۶." (۲۴)

دواى بەرپابونى شۇرىشى ئۆكتۈپەر لە سالى ۱۹۱۷ دا گۇرانىكى بنچىنەيى لە كۆملەكاي سوقیه‌تىدا پۇويدا. ھەروهها بۇۋانەوهى كولتوري و فەرەنگى گشت گەلانى سوقیه‌تى گىرتەو، بەلام بەداخوه زۇرى نەبرد دىسان پۇلەكانى گەلەكەمان دووجارى ئاوارەبۇون و دەربىدرى و زقدارى بۇونەوه:

"ئەگەر من بە كورتى باسی كوردى سوقیه‌ت بکەم، دەبى بىزىم كە پىنگاي ئەوان بەرده‌وام دەشت نەبووه، بەلكو چال ھەبووه، قورت ھەبووه، شايى ھەبووه، شىن ھەبووه. پاش ئۆكتۈپەر گشت مىللەتانى يەكتى سوقیه‌ت گەيشتتە ئازادى خۆيان،

بەرده‌وام و زقدارى داگىرکەرانى عوسمانى لە مىللەتى كورد، پەنگە وائى لە گەلىن لە پۇلەكەمان گەلەكەمان كردبى كە سەرە خۆيان ھەلبىرن و كۆچ بکەن بۇ جىڭا و شۇينى تر بە مەبەستى ئاسايش و ئارامى. بىنگومان جەنگەكانى پووسىا و توركيا "ئەبوبەلەم كارەدا. چوارەم/ كورده‌انى توركمانستانى سوقیه‌ت نەوهى ئەو ھۆزە كوردانەن كە لە سەدەي شانزەھەمدا دەسەلاتدارانى فارس بە زور لە ناوچەي "خوراسان" يان نىشتەجى كىرىبۇون بۇ ئەوهى پاسەوانى سەنورى بۇزەلاتى ئىمپراتوريتى ئىران بکەن. كۆلۈننە كورده‌كانى "ئەفغانستان" يش هەر ئەو بەنەپەتىان ھەيە و ژمارەشىيان دە ھەزارىك دەبىت. گەيشتتى كورده‌كان بۇ كازاخستان و قەرغىز تازەتر و لەم دوايىدا پەرى سەند. تەنبا لە سالى ۱۹۳۸-۱۹۳۷" دابۇو كە كورده‌كانى قەفقاس بە ئازاوهچى و تىكىدەرى سەنور تاوابىنار كراون و چەند ھەزارىكىيان بۇ ئەم كۆمارە دەورانە ئاسىيا راگۇزىراون(۲۰).

جا ئىستا با بىزانىن ژمارەي کورده‌كانى سوقیه‌تى جاران چەند؟ هلهبتە كاتى مەرف بېھۇيت باسی ژمارەي کورده‌كانى سوقیه‌ت بکات تووشى زەرقە بېرۇپاى جودا جودا دەبىت سەبارەت بە ژمارەي دانىشتوانى كورد پىشان دەدەن لە سوقیه‌تى كۆندا:

(۱) ۱۲۵۰۰ کەس، لە سالى ۱۹۱۰ "تەنبا كورده‌كانى يەریفان و قارس" لە كەتىبى "مېنۇسىكى، الکراد، بەغداد، ۱۹۶۸."

(۲) ۳۰۰۰۰ کەس، ۱۹۴۵ "لە نەخشىيەكى كورستان كە پىشىكەش كراوه بە كۆنگەرى سان فەرانسيسکى ۱۹۴۵."

(۳) ۲۵۰۰۰ کەس، ۱۹۵۶ "لە كەتىبى "B. Nikitine, Les Kurdes ۱۹۵۶ کەس، ۱۹۶۵ "A. Qasemlou, Kurdistan" ۱۹۶۵ کەس، ۱۹۷۰ "L. C. Vanli, Le Kurdistan Irakien" ۱۹۷۰ کەس، ۱۹۷۶ "R. Lamborn, Världens politiska" ۱۹۷۶ کەس، ۱۹۸۰ "dagsfrågor, nr 5

C. J. Edmonds, Kurdish Nationalism, In "Journal Cont, Hist vi:1 ۸۰۰۰" کەس ۱۹۷۹ "بەپىتى قىسى -نەزىزىف- كە


۱۰۰۰۰ کەس، ۱۹۷۹ "بە گۇنگەرە ئامارە پەسمىيەكان."

P. John Stone, WEC Intern, Re- " ۱۹۸۲ ۳۰۰۰" (۱۰) .search office UK.

(۱۱) ۲۲۵۰۰ کەس، ۱۹۹۰ "بەپىتى قىسى -نەزىزىف- كە سەرۇكى كۆنگەرە كورد بۇوه لە مۇسکۇ ۱۹۹۰/۷/۲۶

وەك لە سەرەوه بۇمان بۇون دەبىتتەوه تا ئىستا ژمارەيەكى پىك و پىك لە مەر دانىشتوانى كورد لە سوقیه‌ت لە بەر دەستدا نىيە. ھەروهها زەرقە جىاوازى لە نىوان ژمارەكاندا دەبىنرى و

# باستیکی گشتی دهربارەی کورد لە سۆقیەتى جاراندا



مەھابدال کوردى

کوردهکان بە شىوه‌يەكى گشتى لە پووسىيادا مۇركراوه و بە پىنى ئەم پەيماننامەش ھەندى لە ناوجە كوردييەكان بۇونە پارچەيەك لە رووسيا. كوردهكانيش لە ويلايەتى "ئەلزىابتى پۇول" دا دەزىيان، پاشان ھەندى لە كوردهكان كەوتىنە ويلايەتى "يريفان"، ئەمەش بە پىنى پىكە وتتەنامى "توركمانچاي" سالى ۱۸۲۹ بۇو. لە كۇتايشدا كوردهكانى ھەريتىمى "فارس" و "ئەردهان" كەوتىنە زېرى دەسەلاتى پووسىاوه. دواى بەريا بۇونى شۇرسى سۆشىاليستى ئۆكتوبەرى مەزن، وە بە گویرەپەيمانىك كە لە نىوان تۈركىيە كەمالىست و پووسىيائى سۆقیەتىدا بەسترا ۱۹۲۱ ئىدارى "ناوجەكانى قارچ وئەردهان دوبارە كەوتىنە زېرى يان لە كۆمارى ئەرمەنسەنستانى سۆقیەتىدا مانەوە و بە تايىەت لە ناوجەكانى "تالى" و "ئەلەگەز". لېرەدا گەلىنى ھۇنى مىژۇويى ھەن كە پەيدا بۇوە دەركەوتىنە كورد لە سۆقیەتى جاران بەيان دەكەن: يەكەم/ هەر لە نىوهى يەكەمى سەدەي ھەزىدەھەمەوە ھەندى لە ھۆزە كوردهكان ورددە وردە كەوتىنە جوولە و پاوانى ئازەلەكانيان فراوان كرد، لە بىشىدا مليان بەرە دەشتى يەریقان نا، بۇ ناوهەوە و بەرە و ئازەربايجان بەرى كەوتىن و پىنى "بەكۆ" يان گرتە بەر. لە ماوهى ئەم بىلەپەنە و شىنەنەدا، دىتى كورديان لىرە و لەۋى دروست كرد، دىارە تارادەھەك دەسەلاتدارانى قەيسەرلى پىشوارى ئەو دەست بە سەرەگىتنەي كوردهكانيان كردووه (۱۹). ھەلبەتە وەك لە پىشەوە باسمان كرد كە دەسەلاتدارە قەيسەرەيەكان دەيانویست سوود لە نەبەردى و ئازايەتى ھۆزە كوردهكان وەربىرن لە كاتى جەنگەكانياندا لە دىرى دەولەتى عوسمانى. دووەم/ ھۇنى ئايىننى تا پادەھەك پۇلى خۇى بىنیوھ لە كۆچكىرىنى كوردهكانى باكۈرى كوردىستان بۇ ناوخۇي پووسيا. هەر بۇ نۇونە كورده يەزىدىيەكان زۇر جار لە لايەن سەرکرده مۇسلمانەكانى ئىمپراتورىيەتى عوسمانى و كوردهكانيش چەوسيزراونەتەوە، چونكە ئowan پەيرەوى ئايىننى تايىەتى خۇيان "زەردهشتى" يان كردووه. سىيەم/ بۇونى شەر و شۇرى

"بە گویرەي ئەو سەرچاوانەي كە لە بەر دەست دان، دەتوانرى گۈيىمانى ئەو بەكەن كە بۇ يەكەم جار پەيوەندىيەكانى رووسىيائى تىزاري لەگەل سەرۆك ھۆزە كوردهكان بە شىوه‌يەكى مىژۇويى دەگەرتىتەوە بۇ سەرەتاكانى سەدەي نۇزىدەھەم. لە لايەنە رامىيارىشەوە ئارەزووی تىزارەكان ئەو بۇوە كە هيىز و تاوانانى جەنگى ھۆزە كوردهكان لە چوارچىوھى ستراتىزىيەتى سەربازى خۇيان لە دىرى عوسمانىيەكان بەكارىتىن." (۱۶) قۇنسۇلى چەپلىكىن بۇوە لە ورمى لە يەكىن كە بەلگەنامە نەينىيەكانىدا بە ئاشكرا دانى بەوهدا ناوهەكە: "پووسەكانبە پادەي يەكەم لە گۆشەي دامەزراندىنى ئەرمىنیاى سەربەخۇوە سەيرى كىشەي كورد و دواپقۇزى كوردىيان ئەكرد كە بەوه پووس دووسىياسەتى جىاوازى ھەبۇوە بەرامبەر بە كورد و بەرامبەر بە ئەرمەن." (۱۷) لېرەدا ئەوەمان بۇ چەپلىكىن بە دەبىتەوە كە دەولەتە گەورەكان بە هەر شىوه‌يەك بىن لە زۇر كات و سەرەدەمدا ويستيانە مەسەلەي كورد بچەپلىكىن بە پىتىنەي بەرەنەنەنەي سىياسى و سەربازى و ئابورىيە تايىەتىيەكانى خۇياندا. بىنگومان پووسىياش يەكىك بۇوە لە زەلەزەنەي كە هەر بۇ ھەمان مەبەست زۇر بە گورج و گۆلىيەوە ھاتۇتە مەيدان. پەيماننامە "سايكس پىكۆ" سالى ۱۹۱۶ بەلگەيەكى ئاشكراي ئەم وتهىي. وەك دىيامان رووسيا ھەولى ئەوهى دەدا كە كورد بىكا بە قۆچى قوربانى مەسەلەي ئەرمەن و بە بەرىتكىش دوو چۈلەكە بىقۇزىت. دەبىن ئەو دەست نىشان بەكەن كە سىياسەتىي پووسىيا بەرامبەر كىشەي كورد و خاکى كوردىستان سىياسەتىكى نەڭىز نەبۇوە، بەلكو بەپىنى كات و شوين گۆراوه: "بەم جۇرە وەك دەبىتىن پووسىيا لەگەل ئەوەشدا كە وەك زۇرەي دەولەتە گەورەكانى تر چاوى بېرىبۇوە خاکى كوردىستان و سامانەكانى، بەلام خەتىكى سىياسى دىيار و دووربىنى بەرامبەر بە كوردىستان نەبۇوە، وە زۇر جار ئەم سىياسەتى بە پىنى كات و شوين گۆراوا." (۱۸)

بە گىرەي زۇرەي زۇرى سەرچاوه ھەمچۈرەكان ئەوەمان بۇ ئاشكرا دەبىت كە پەيدابۇونى كوردهكان بەشىوه‌يەكى گشتى لە رووسيا دواى بەستى پەيماننامە "گۈلستان" بۇوە، كە لە

ده توانن يه کجار زور چالاک بن و تا را ده يه ک گرفتی ژنانی کورد هر نهین له سوید چاره سر بکهن، به لام نهوانه له کوین و چ ده کهن و خوبان به چ شتیکی دیکه و خمریک کردوه، پرسیاریکی که دهین له خوبان بکری.

يه کن له گیروگرفته گدوره کانی تر، که ورده ورده خوی خزاندوته ناو ریکخراو و کومه لانی کورده و، نه خوشی خودور خستنه و یه، که به بیانووی جیاوازی ره گه زه... یه ک به بیانوی زازا بوون، نه اوی تر به بیانوی عدلوه و بوون و کومه لیکیش به بیانووی فهیلی بوون، خوبان و دهسته که بیان له گمل جیا کرد تمهود، تدنسیا به هوی جیاوازی ئایین یان مه زهد و زاراوه یکی نه هینده جیا له کوردي، بدم شیوه یه خوبان له کومه لی کوردي هه لداوتین. پیوسته نه و دش بزانین، که ئم کومه لاندش له ناو خوباندا هیج چه شنه پیوهندیکیان نییه و خوشیان له یه کتر به جیا ده زان! بیتگومان ئم پرس و گیروگرفتنه له مدبست و خواستی فدراسیون به دوره. به باوهري من فدراسیون ده بی نه خش و پولی خوی لهم باروه ززر به باشی و به وردي بهريوه بهري و بتوانن لهم باره یه و هنگاوی به که لک و میزه و بی باوی.

فیدراسیونی کومه له کوردستانیه کان له سوید، نهوا پانزه سال له تدهمه نی خوی پر ده کاته وه و ئیتمرۆ خاوه نی ۴ کومه لی نهندامه له سدرانسری و لاتی سویدا. له ناو ئه مانه دا کومه لی نوسه ران، کومه لی ما فزانان، یه کیتی لوانی کورد و یه کیتی ژنانی کورد دینه به رچاو، که کدم و زور چالاکی خوبان ده نویتن. بوونی نهوانه پیروزه و شتیکی گه لتی به که لک و پیروزه، به لام هر یه ک له مانه چمنده کار ده کهن، یا به چیبیوه خمریکن: کار، خدمبات، یا چالاکی نهوانه چیبیه و فیدراسیونیش له ناوهدا به چ شیوه یه ئه رکی خوی بهريوه ده بات و و لام دری کام گرفت یان پرسیاری ئه مانه بوون، کومه له پرسیاریکن کدم تا کورت له ناو کومه لی کورده واریدا ده بیسدرین. به لام پیش هه موو شتى، دهین ئیمه ش که موكوری خومان باش بکهین و به دل فروانیه وه و به مدبست و خواستی باش باسیان له سدر بکهین. بوق ئم مدبسته پیوسته ئیمه کور و کوبونه وه پیک بیتین و ولیکولینه وه بکهین. هه رو ها پی بدری به ئم که سانه که بوق باشتربونی ئه رکی فیدراسیون، باش و خواست و پیشنياره کانی خوبان له گوشاره که دا بدرکتینین و بهم شیوه جگه لمه که گوشاری فیدراسیونی به پیتر ده کهن، کومه لیکیش پیشنيار و رای تازه دینه ئاراوه، که ده توانری که لکی پیوستی لئی و هرگیری. دیاره ئه مه شتیکی ئاسان و ساکار نییه و پیوستی به کات و هیمنی و بەرنامه یه کی داریزراو و گملی کادری تیگه یشتوو لیزان هه یه که بتوانن ئه رکه کانی خوبان بهو په ری لیهاتوویی به کار بیتین.

شوینه واری راسته و خوشی هه یه له سهر خهبات و چالاکیه کانیان له هه موو بواره کاندا. کاتن ئهوان خوبان به گیروگرفتی کومه لایه تیبه و خمریک ناکهن، کاتن له میزهو و جوگرافیا ولاته که بیان شتیک نازانن و به زمانی زگماکی خوبان ناتوانن بدويین، ئه مانه له پووی کور دبوونه و، چ به رهه میکیان بو گله که بیان به دیاري پیتیه؟ له بواری خویندن و فیبریونی زانستیشدا، به داخوه هنگاویکی ئه توپیان هله نه گرته و را دهی خویند کارانی کورد له زانستگا کاندا، له چا ئم حشیمه ته کورده هی که له سوید ده زین زور کدهم، به لام له لایه کی تروه را دهی که سانه که توشی خهتا و توانکاری ناشایسته بوون، گملی زوره و بهره زیاد بوونیش ده چن، (به پیوانهی لیسته سوپیال) که گملی جیتی شه رمه زاری و ما یهی شوره بیه!

به لی ئه و که سانه که لام ده رفته له باره که لک و هر ناگرن و نایقوزنه و، ته نانه ت به پیچه وانه ش ره فتار ده کهن و خوبان توشی دهیان گیروگرفتی کومه لایه تی تر ده که، ورده ورده له کومه لگای کوردایه تی دوور ده کونه وه. ره خنه من ته نیا ئه وه نییه، که هیما بو یه ک دوو که س یا تاقمی بکهم، مه بستی من ته واوی ئم کومه له کوردانه ده گریته وه که له سوید ده زین. جا له کومه لی بچوک وه ک بنه ماله تا کومه لی گهوره تر وه ک فیدراسیون و ته واوی ئه ندامه کانی به گشتی، که ما یه سیکی زور گهوره و له بدرچاو.

له ۴ کومه لی فیدراسیون به لک و پوپیشیانه وه (ساکسیون)، ئیتمرۆ جگه له یه ک دوو کومه لی ئه ندام، کومه له کانی تر و لک و پیتیه کانیان کوپیکی کولتوري یان شانوگه ریبه کی ئه توپیان نییه. چاکه، بوق وینه باسی ته نگوچه لمه کی ژنان بکهین، به شتیکی زوری ژنانی کورد له سوید گیروگرفتی سدره کیان هه یه، به لام کتی خوی به گیروگرفتی ئه وانه ده کدووه؟ کاروباری کومه لی ژنانی کور دیش، به داخوه وای لئی هاتووه که ته نانه ت کونگه هی سالانه شی به چه رمه سدری بوق ده گیری... (له ناو کومیتی کارگیریان ته نیا دوو که سیان ماون و که سی سیتیم به دوو یان سی مانگ جاری وه دیار ده که وی). له بواری ئابوریشه وه و هز عیان لهو په ری خرابی دایه، به لام هه رگیز له هه ولی چاره سری یه کجاري ئم گرفته نه هاتوون و خوبان پین ماندوو نه کردوه ئمه له حالیک دایه که زور شوین له ناو دام و ده زگا کانی سویدی هن که به پیوهندی گرتن بهم دام و ده سگایانه ده توانن یارمه تی زور باش بوق ریکخراوه که بیان و هرگرن و چالاکیه کانیان پی و هگر بخهن. من لهو باوه ره دام، که له سوید گه لتی ژنی کوردي تیگه یشتوو و لیهاتوو هن، که


کۆمەل و هەلسوکەوتى، دەرۇونى مروڻ دەگۈرى، ھېتىنى دەرۇن و ھېتىنى دىتىن.

ئىيمەي كوردىش كە لە سويد دەزىن و بەشى لە كۆمەلى سويد پېتىك دەھېتىن. ھەر ئالىڭىزىك كە لە سويد دېتە پېتىش، كارى تايىەتىي خۇرى لە سەر ئىيمەي كوردىش ھەيە، ھېتىنى گۇران ھەن كە لە ھەموو بوارەوە كاندا، ج لە رۇوى باشى و ج لە رۇوى خرابىيەوە، پەيوەندىيەكى راستە و خۇرى لە گەل زىيانى مروقايەتىدا ھەيە. كورت و براوه بلىم، كە ئەم كوردەي ئەورق جياوازىيەكى تەواوپى لە گەل كوردى ۲۰ سال لە مەوبەر ھەيە، لە ھەموو بوارەكاندا ھەر بەم ھۆبەش رەوشتى كۆمەلانى كوردىش ئالىڭىزى بەسەردا ھاتوھ. رەوشتى ئابورىي، كۆمەلايدەتىي و ۋامىيارىي ولاٽىن، كە ئىيمەتىدا دەزىن، راستە و خۇرى كارى خۇرى لە ئىيمە دەكت. بەلام ئىيمە تا ج رادەيەك ئامادەي ئەم ئالىڭىزانە بۇوين؟ وەك تاكە كەس يَا وەك و دايىك و باوك، وەك ژن يَا پىاوا، ياخۇد وەك پىتكەخراوەتىكى دېمۇركاتىك. بە وەبىرھېتىنە وەي ئەم ئالىڭىزانە، داخوا ئىيمە چەننە دەرۋانىنە دوا رۆزى خۆمان؟

مەبەستى من لە نوسىنى ئەم وتارە ئەنۋە نېيە، كە بىكەمە ناو ھۆبەكانى پېتكەھاتنى ئەم پرسىيارانە، بەلام بە پېتىسى دەزانم، لە سەر ھېتىنى پرسى كۆمەلايدەتى كوردانى دانىشتوى سويد باسيتىك بىكەمەوە. ئىتمەر گەلى كورد لە ھەموو كاتى زىاتر پېتىسى بە ھاواكارىي ھەيە. ئەو ووتەيە دىياردەيەكى نۇئى نېيە و كۆنېش نېيە. تا كورد لە ناو خۆيدا يەكتىتىي و ھاواكارىيەكى باش دانەمەززىتنى، ئەو پرسىيارە ھەرۋا لە ناو كۆمەلى كوردا خالى يەكەمە. ھەر بە چاوا خشاندىنى بە ناو كۆمەلانى كوردى دانىشتوى سويددا، ئەم دىياردەيە خۇرى دەنۋىتنى. با لە خۆمان بېرسىن، چەننە ھاواكار و ھاودەردى يەكتىن؟ تا ج رادەيە بە پرس و گىرۇگرفتى يەك ماندووين و چەننە خاوهن را و خاوهن كولتۇر و زىغانىن؟

بە لاى منۋە لەو بارەيەوە كەمايەسى ئىيمەي كوردان زۆرە. لە بارى كولتۇريشەوە راستە گەلتىن گۇفار و پۆزىنامەي كوردى لە سويد چاپ دەبن، من ئەو كارە بە چوڭ نابىيىن، بەلام نايما كارىيەكى ئەنۋۆتى لە كۆمەلە كەمان كردووە؟

بەشىتىكى زۆر لە گەورەكان، كاتىن پېتكەوە دەدۋىن، لە ووشى سويدى كەلکىتىكى زۆر وەردەگىرن، زۆرىيە منالە كامان كاتىن بەيە كەوەن، بە زمانى سويدى دەدۋىن، بەم حالەش دەكۈنە ناو جەرگەي پىتكەخراوە كوردىيەكانەوە و لە ناو كۆپۈنە وەكائىاندا بە زمانى سويدى دەدۋىن. راستە بە سويدى قىسە كردن مروڻ لە پەگەزى خۇرى ناشواندۇوە، منبىش ئەنۋە وەك پېيانەيەك بۇ كوردايەتى نابىيىن. بەلام بە كەمېشى ناگرم و پېتىمايە



كۆتان سامىھدى

# گۆرانىكارى نەھەر

پېۋىستە،

بەكwoo

مەرجىشە

12 سال لەمەوبەر ھاقە سويد، لەم ماوەيەدا تاكوو ئىستا گەلتىن جياوازى دەبىتىم. دونيا ئالىڭىزى بەسەردا ھاتوھ. سويدىش لە مەر رەپورەوە مېزۇو گۇرانى بە سەردا ھاتوھ.


ZAKHO - KURDISTAN

زاخو - کوردستان



BAYAR - KURDISTAN

بیار - کوردستان



# ناوه روک

## به ربانگ

شۆرگانى فىدراسىونى كۆمەقە كوردىستانىيە كانە لە سويد  
خاون ئىمتىيان: شازاد شەممەد

سەرنووسەر: خەلیل دوهۇكى  
دەستەي نۇوسەران:  
ئازام گەرناس  
ئاوات دلزار  
ئىبراھىم گووجچۇو  
نیاز لاجانى  
ھەسەن شېرىۋەت  
شەفيك كایا

تەكىنچى كاران:  
ئاوات دلزار - بۇوبىت شەسىر

ئابۇونەي سالانە: ۱۰۰ كىرونى سويدىيە  
بۇ دەزگاڭكان: ۲۰۰ كىرونى سويدىيە

### ناونىشان:

Berbang  
Box 490 90 Stockholm  
Tel: 08- 652 85 85  
Fax: 08- 650 21 20  
پۆستگىرۇ: -80 38 64

دەستەي نۇوسەران لە نۇوسىن و وئارەكانى فىدراسىون و ئەم  
نووسىنامەي بە واژەي خاوهە كانىيان بىلاۋە كىرىتىمەد، بەرپرسىار نىيە

- فىدراسىونى كۆمەقە كوردىستانىيە كانە لە سويد لە ۱۹۸۱/۶/۶ دامەزراود.
- ڇارەدى يەكمەمى بەرىانگ لە مانگى ۱۹۸۲/۷/۱۵ بىلاۋە كىرىتىمەد

ڇارە ۱۰۲ سالى (۱۴) ۱۹۹۶

### كورمانجى سەرروو

- گۇرانكارى نەك هەر پىويىستە، بەلكو مەرجىشە... كۆغان ئامەدى
- باسىنگى گشتى دەربارە كوردى لە سۆقۇيەتى ... مەھاباد كوردى
- ھەنگاوى يەكەم و سەرەتايى كارىنگى مەزن د، حوسىئەن مەھەمد عەزىز
- ھەبۇو نەبۇو، دوورگە يەك ھەبۇو..... نياز لاجانى
- پايزىز غۇربەت و خەونەكانم..... پىشكۇنە جەمەدىن
- من و خەون تابلۇكانم..... ئاماڭە كەرىدىنى: ئاوات دلزار
- سەرتايىكە لەگەل ئەدەبىي مەندالاندا..... كاكە باس
- تاراي گىيان - شىعەر ..... ھەمە سەعيد حەسەن
- سالىنگى حكومەتى خۇدمۇختارى لە كوردىستان..... سەرزلى قادىر

### زازاڭى (ەملى)

- قاندىچى لە ڑى خۇھەكىشتەنى..... ئۆسمان ئايتابار
- كوردىانى سووېيەي
- كوردىستانى ۋاكۇرى
- راشنۇشتە نا زازاڭى
- خەلاتا ئاشتى يَا نۇيەلى
- ئايىمەتەمى و دۆكتور..... مارۇوف يەلماز

### كورمانجى خواروو

- نەسويدىي و نەزى كوردىين ل سويدىي ... شەرمىن بۆزئارىسلان
- نۇوچەين كوردىستانى..... ئىبراھىم گووجچۇو
- چالاکىن فەدراسىونى
- ژۇق ھانىكىپاپىن كورد
- داخىيانى
- رەوشە كۆمەلا ئۆپسالا..... لەزگىن ئالپەرگىن
- كۆمەلە يَا نفيىسكارىن كورد
- زارۇك و زمانى زارۇكان..... شەفيق كایا
- ئاخىن و ئالىنین تەخا بىندەست..... خەلیل دوهۇكى
- گۇھارتىن نە پىويىستە، بەلكو شەرتە..... كۆغان ئامەدى
- سەمفونىيا لە شەكى رىيس-ھەلبەست..... بلند مەھەمەد
- هاتن - ھەلبەست..... شىلان ھەمق
- ھەوار- ھەلبەست..... ئارام، د
- دقاۇون و حقوقىن جەن دە، پەرسا ژنان..... ئىبراھىم گووجچۇو
- من ژىچ ئافات حەزكىر..... ئارام گەرناس
- شۇوزۇن..... دكتور جوان باتتوو
- مرادى كىن..... بەشىر بېتاتانى
- وەلاتپارىزى و ئالا..... سەلام جىزىرى
- ھەۋپەيقىن ب (مەھەمەد تاها ئاڭكەھىي رە)..... حەسەن شېىخۇ

# بەربانگ

گۆفاری فیدراسیونی کۆمەنە کوردستانییە کانه له سوید  
زماره ١٠٢ سال ١٩٩٦

B



KOC-KAK  
BRANDENBURGSEPLEN 193  
6834 13 E  
ARNHEM  
HOLLAND

